



Arşevê Oskan

Turkbûna Kurdên Almaniyayê, Ne Gunehê Turkan e.



Ev hersê gelên dadker, yên ku em xistinê bin destê xwe, qet guman tune ku bi şev û roj kar û pîlanên wendabûna me datînin, geh bi hev re û geh her yek ji cem xwe ve. Windabûnek seranserî welêt û ji hemû aliyên jiyane ve. Yek ji wan aliyên windakirinê ziman e, xwanê dike ku ew jî li ser vî aliyê giring, têra xwe bi giranî diçin ser, ji ber ku ziman alaveke giring e, ji alavên têkilî û ragihandina di navbera mirovan de ye.

Bi dehan şoreş li ser axa Kurdistanê, ya dadkirî rabûne, da ku hebûna xwe bidin ragihandin, ev hebûn ne tenê diruşm û sirûdên netewî ne. Lê belê, wek hebûna çil milyon mirov, li ser axa bav û kalên xwe dijîn. Welat bi ax û ava xwe, hêlîn û stara vî gelî ye, lewra heyânî jê bê wê hêlîna xwe biparêze. Ev mafê parastinê, ne tenê li sînorê însanan disekine, lê belê xwezayê ev maf daye lawer û heywanan jî, û di xwîna wan de çandîye. Bi gotinek din, ku xwedan ev mafê xweparastinê di giyan de, bicî kiriye û ev çek pîroz û bi rûmet kiriye.

Dema em tîn û dibêjin Kurdistan çar perçe ye, di cî de tê bîra mirov, ku perçeyê herî mezin bakurê Kurdistan e, mixabin ku dijminê herî mezin jî, bi siyaseteke ku hiştiye kurdên me ji ber zimanê xwe fedî bikin û serê xwe bi şêrînbûna zimanê wan mezin û bilind bikin. Ev pirs li çî çareseriyê digere?. Li vir em dikarin destê xwe deynin ser birînê!

Dema ku em dibêjin şoreşên kurdî, ku bi giranî di tevna dîrokê de hatiye ristin, bi vê gotinê re, tê bîr û hişê mirov, ku ji giringtirîn û şaristanîtirîn erkê wê, parastina ax û dîrok û ziman e. Naxwe ziman yek ji hîmên herî giring e, di vê dabaşê de. Ji bo stranekê, yan gotinên piştî stranê, li ser şanoyê, Turk dunyayê bi ser serê wan hunermendan tînin xwarê, ma em nafikirin û ji xwe napirsîn: çima vana wisa ji zimanê me teng dibin?. Naxwe roleke mezin ji vî zimanî re heye, di pêvajoya hebûna me, wek gel. Bawer dikim, çîroka Ahmed Kaya û vê dawiyê jî, digbêja ciwan Rojîn, ya ku di CD iya xwe de, stranek kurdî yek turkî tomar kiribû, da ku Turk stranên li wê qedexa nekin. Lê dîsa jî, nihat pejirandin û bi dehan nemûneyên ji vî rengî

hene. ku bi mêvanî beşdarî bernameya bi navê "Yildizlerin Altında" yan jî bi kurdî "Binê Stêrkan" di Tv a Star de, bi hunermenda ku bi eslê xwe kurd Yıldiz Tilbe, wezîrê kulturê yê Turkiyê bi telefonê beşdar bûbû û ji wan re wisa gotibû: çima tu kurdayetiyê derdixê pêş, turkayetiyê tim derxînin pêş û pir bînin ziman. Ji sedema ku Yeldiz gotibû: ez kurd keça kurda me û heger hûn biratiyê dixwazin min kurd bipejirînin. Yanî berovajî Tatlısis gotibû, ew ji bernamê avêtin û navê wê bernamê guhertin.

Li vir, wek miriyên ku serê wan li dîwarê gorê bikeve û ji nû ve, xwe nas bike, ku ew li kû ne, ji nişkêve dikin qarewar, lê tiştek ji ber wî/ê naçe, ji ber ku berya wê hingê, ti sermîyan ji xwe re neçandibû, zevîyan xwe beyar hiştibû. Divê em zanibin û li xwe hayê bibin, ku ev rê li pêşiya hemîyan e, çî hunermend yan nivîskar, yên bi binyada xwe kurd in h.w.d. Li vir ez dixwazim li ser hinek hunermendên xwedan pîransîb û yên ku bi êşa gelê xwe re, hatin stran û heta radeyekê hîna jî, li ser lingê xwe sekinîne, bawer dikim heyânî ku di çavên dijminan de jî, mezin û bilindin, ji wana şivan Perwer, Nizamedîn Ariç û hinekî din.

Doza ziman yek ji doz û armanca siyaseta gelêriye, û barê herî giran û giring, dikeve ser milê tevgera siyasî, ya ku xwe wek bav ji vî gelî re dibîne, ji mafê vî gelî ye jî, ku hesabên dîrokî bi vî bavê re bibîne, jê re bibêje: tu berê min dide kû?. heger ku bi erkê bav ranebe. Di riya wan tevger û partiyan re, sazî û dezgehê rewşenbîrî jî, dikarin bi hêsanî ava bibin, ji ber ku pere û abûriya partiyan, ji bêrika vî gelî ye û nivîskar û zimanzan û hunermend... ji vî gelî re dixebitin û şaristaniya wî bi xelkê ve didin naskirin.

Li welêt çî dibe çî nabe, ew mijarine berfireh û dûdirêj in. Ez pir di vî aliyê de, kûr û dûr naçim, ew mijareke dine. Ez dixwazim. werim û li ser xaleke giring rawestim. Ew xal jî, Kurdên me yên dervî welêt in. Wekî diyar e, heyânî ji van dewletên Ewropî hat alîkariya me kirin û ji me re gotin: hûn li welatê xwe ji zimanê xwe û mafê xweyî netewî bê par mane, de keremkin û bi zimanê xwe bixwînin. Lê siyasatmedarên me, bi piraniya xwe bi çavê ticaret û partîtiyê li pîrsa ziman xwedî derketin û hevalên xwe zane û rûpel (25)

Boniye Cegerxwîn



JINÊ

Tu kaniya jiyane yî
Her tu rewşa cîhanê yî
Tim tu gula li baxê yî
Temtêlî, nîvê civatê yî

Tu xuşkî, hem tu dayikî
Tu hevjinî yan keçikî
Tu hevalî pir nazikî
Ger tu çî bî pir xweşikî

Sitûna malê her tu yî
Sermiyana malbatê tu yî
Bingeha torê her tu yî
Çiqas bêjim pir hindike

Ger tu bijî bi serfirazî
Wê tev bijîn bi dilxwazî
Ji mafê xwer bike gazî
Civîn û şoreşan bike

Heyder Omer

Cegerxwîn, kelepûr û



helbesta hevber

Dergeh:

Gava metirsî û belayên mezin gef û guran didin miletan û hebûna wan dixin ber dava dagîrkirin û pişaftinê, û gava zordariya polîtîkî û civakî hêzdar dibe, û hemî awayên azadiya gel dorpêç dike, û xwediyên peyva azad, çî helbestvan bin, û çî jî nivîsevan û ramanbîr bin, bi kotekî neçareyî bédengiyê dike, wê hingê ew miletan ji xwe berê û yekser vedigerin rehên xwe yên netewî, bi her du destan û bi hestên germ pê digirin, da hebûna xwe li hember wan metirsîyan biparêzin û giyanê berxwedana xwe gur bikin. Rûpel (8)

Quncika "Tiravêjan" Can Kurd Pêşdatirîn pêdiviyên



tevgera me çî ne?

Dibêjin ku hezretî Isa bi şagirdên xwe re, ber bi bajêrê Qudsê an Bêtlehim ve diçû. Di rê de şagird birçî bûn. Hezretî Isa tiştekî wilo gote wan: "Bila her yek ji we rahêje kevirêkî." Ji Pêtrus pê ve, ku kevirêkî piçûk ji ber xwe rakir, hemîyan kevirin mezin rakirin. Hezretî Isa bo wan keviran got: "Bibin nan." Ewana di cîh de bûn nan û her kesekî ji nanê xwe têr xwar, tenha Pêtrus birçî ma. Li Rêya vegeerê dîsa wilo bû, Pêtrus kevirêkî ji yê gişan mestir û girantir rakir. Hezretî Isa gotineke wilo kir: "Ez ê li ser kevirê Pêtrus dêra pêşîn avabikim." Pêtrus gote hezretî Isa: "Heyran, tu niha kevirê min bike nan, da ez têr nan bixum, bila dêr niha bimîne." Rûpel (12)

Metelokên kurdî



1. Aqilê Sivik barê giran.
2. kesî qala gurî nedikir rabû di devê kaniyê de gû kir..!
3. Rovî ne çû qulê, hejek bi teriya xwe vekir.
4. Xwelî li wî serî ku heftê serî jê ne êşin
5. Kurmê darê ne ji darê be dar kurmî nabe
6. Xeta xwer ji gayê pîre
7. Tas hat û çengirî çî tije û çî vala
8. Serê ne êşe dismalê lê girê mede.
9. Şêr şêre çî jin çî mêre.
10. Ez zanim û tu zane!!..... Rûpel (16)

Bêwar Barî Teyfûrî

bewar@inbox.ru

SEROKÊ NEMIR


MISTEFA BERZANÎ



GÊNÊRAL BERZANÎ

di dîroka Kurdistanêda navderekî zindî û bê hempaye.

Mustefa Berzanî navekî evra,
Mêrxasek dîrokî zindîye lewra.
Ronahîya kurdan û KURDISTANÊ
Sembola azaya tim niştimanê.
Bi wî hat naskirin kurd li cîhanê,
Navê wî nasnama kurd, Kurdistanê.



Ji xew rakir millet ji xewa kûr,
Rewşa gel guherî da îşiq û nûr.
Serokê serokan navdar, qehreman,
Ji xew rakir millet ji xewa kûr,
Rewşa gel guherî da îşiq û nûr.
Serokê serokan navdar, qehreman,
Navê wî yê bijî bi dem, dewranan.
Serok bêhempaye ji bona kurda.
Kurd bi giştî wîra dikin rêz, secda
Wî ji mera hîmê azayê danî,
Ji bo gelê berdest bawerî anî.
Wî bersîv da dijî neyarê kedxar,
Bû raperîna gel alvan altindar..
Bi ramanên wîva millet dilşad bû,
Bi mêrxasîya wîva millet rizgar bû.
Ew bû binelîyê dilê milyona,
Lê bû tîrêj û derd bo cerdevana..

Gelê bê qehreman kole, hejare,
Bindest û bê hêze hêsîr, bê ware.

hewildana destpêka şerê ramiyarî û cekdarîye a hemberî zebtkarên, nexastîyên, neyarên netewa kurd û Kurdistanêye. Navê wî ji bo her kesê kurd ên bi şeref wek nasnama netewî evra û zîyarete, di dîroka mirovahîyêda serbilindî û sîyaneta gel ê kurde, senbola azadîya gelê kurd û KURDISTANÊYE, xîlaskar û alvanê gel ê kurde ê ku bibû koleyê hezar salan, li bin bandoranda dihat rencandin, di nav sînoranda dihat înkâr û îmha kirin, bi jîyanêke bê şeref ra rû bi rû mabû. Mêrxasî û cesareta wî bû fîdana zindîbûna heyîn û hebûna netewî. Ji bo jîyanek bi şeref, bi sîyanet û azad miletek, weletek careke din vejerande jîyanê. Di nav cîhanek hov, bê dad, dagirker û bê bawer, tarîda bû ronikdarê dîroka miletekî dîrokî û kevnar, bû zamîne jîyana gelê xwe, bû wesîla dostanîya gelan, di dîrok û cîhana durî û xwînarda bû rênîşa Azadîya Kurdistanê Azad a hemdemî.

Berzanîyê Nemir jo bo gelê kurd SEROK, mêrxas, ramiyar, mijara salname dîroka azadîya gelê kurde, şerefa niştimanêye, tacê serê kurdaye, di dîroka Kurdistanêde serokekî altindar, nemir û zindîye. Gelê kurd ji stûxariyê, ji sîtemkar û talankarên dîrokê, ji hovên mirovahîyê xilas kir, gelê bindest, paşdamayî gîhande jîyanek bi rûmet, gîhande serbestîyê, cesaretê, ji bo rizgarbûna welat, ji bo azadîya netew kurd dijî dagirkeran seferber kir. Kurdistanê Azad berhem û pêşkêşa şoreşa Berzanîyê mezin ê nemire.

Berxwedan û serhildana bi navê Berzanîyê Nemir va girêday rizgarbûn û damezirandina Kurdistanê Azad va hate dawî.

Kurdistanê Azad ji şaristanîke kevnar, klasîk berbi şaristanîke modern dimeşe.

Miletê kurd li ser parastina nixirên mirovahîyê biryar girtîye, bi vî avayî jîye û jîyanêke bi şeref îro dîrokêda didomîne. Li ser şaristanîke klasîk, li ser çandêke kevnar modêrbûneke pêşketî hemdemî ava dike.

Bê şik Gêneral Berzanî qehremanekî nemir û navdare. Belê KURDISTANA AZAD BERHEMA CESARETA WÎYE, ji gelê kurd ra XELATA JÎYANÊYE TEWREBİLİNDE.

Iro gelê kurd û Kurdistan di dijî kevneşopîyê û cudatîyê bûye sînor, bûye alvanê wekhevîyê, bûye altindarê azaya gelan ên HERÊMA KURDISTANÊ. Gelê kurd li hemberî talankar û sextekarên dîrokê bûye mertal.



ŞIVAN PERWAR ŞEREF A KURDISTANÊYE



Stranbêj, dengbêj, hunermend

xemla wêje, çand, huner û bi tomerî

dîroka gelanda kesayetên balkêşin. Şivan Perwar jîna meda ne ku tenê wek dengbêj û stranbêjekî baldar tê naskirin. Ew wisa jî bi efrandarîya xweva, dengê xweva bangdêrekî meydana serhildanêye, hunermendekî şoreşgere, ruhê xweva ronakbîr û mîltanekî azayêye hêjaye.

Dengê wî, avaza wî kurd di ruhekî şoreşgerîda, ruhekî gelêrîda perwerda kir, raperîna kurdada roleke mezin leyîst û dileyze, ji bo têngîhandinê hêlana dide gel. Kurda Şivan Perwar bihîstî-bihîstî bûne welatparêz. Bi giştî gelê kurd îro perestîşkarê Şivanê Perwere.

Belê Şivan P. ji bo gelê kurd di warê welatparêzîyêda perwerdegîrekî bêhempaye.

Hunermend ên mezin ji bo gel dibistana menewî- neteweyîne. Mirovên bi talant ên têngîhîstî ji bo gelan serveta netewin. Şivan Perwar ji bo gelê kurd dewlemendîke gelêrîye-menewîye.

Ên ku dîrok, wêje, çanda gelê xwe nizanin nikarin bibin welatparêz. Şivan P. berî her tiştî hunermendekî welatparêz û pêşengê hunera kurda a hemdemîye. Dengê wî, avaza wî gelê kurd rakir berbi serhildanê defda, hêlana dide milyona.

Şivan P. hem jî pira dostanîya mirovan û gelane, hunermendekî bêynelmîlele.

Ruhê hunera wîda felsefa jîyana kurd heye, di hêla menewîda teyaxa gelê kurde, hertim moralê dide gel. Ji dengê wî, axaftina wî, avaza wî, merîfeta wî têr nabin. Şivan Perwar temam bi hunera xweva xezna gelê kurde.

Gel ewladê xwe digîhîne ku bi nave wîva were naskirinê, gel lawên xwe hêja vedijîne derbazî dîrokê dike. Ş. P. rûpelekî dîroka çand û hunera kurde, bang û hêlana serhildana KURDISTANÊYE. Dengê wî hewara azadîya mîlyonaye, dengê tembûra wî nîşana cesareta serkeftinêye, hewildana raperîna gelê kurde. Navê Şivanê Perwar nasnama salnama hunera kurd a welatparêzîya saxleme, hunera wî şerefa dîroka şoreşa hunera Kurdistanêye...

17. 01. 2013.

15.01.2007.



Feqî Kurdan (Dr. Ehmed Xelîl)

dralkhalil@hotmail.com

Deh tembî ji bo ramyarên kurd

Tembiya (10) - (Beşê 1)

Rêbaza Revderbûnê Bidin Sikinandin!

Gelê revderbûyî, ne ewê ku biyaniyan erdnîgariya wî dagîr kiriye, an ew bindest kiriye, an dîrok û kultûrê wî rûxandiye, nexêr! Gelê revderbûyî ewe ê ku giyana wî revder bûye, û xwe radestî kultûr û rehberiya dagîrkeran kiriye.

Erê, ne tiştekî susrete ku neteweyek were rûxandin di nav pençên dagîrkeran de, lê a susret ewe ku careke din ranebe ser pêyan, kesayetiya xwe, bîrewerî û hizra xwe venejîne, rehberiya xwe ya resen ji nûve ava neke.

A niha jî werin em bipirsin:

Gelo, ma rewşa neteweya me di eva warî de çewaye?

Kurd û Ehrîmanî:

Berî her tiştî, pêwîste em vebirînin ku neteweya me ji 25 sedsalan de di rewşa revderbûyê de ye, raste, di her qonaxekê de pêşengên bi qîret û jêhat hebûn, nihadên (wijdanên) xwe bi tava Ehûremezda şuştibûn, vînen xwe wek tepelên çiyayên kurdistanê bilind bûn, agirê şûreş û têkoşînê gurr dikirin, bi pozbilindî rûmeta kurdewariyê di bin darê dardakirî de diparastin, lê mixabin giyana revderbûnê, di kurdên nezanan, sixur û xiniz de, ew pêşengên gewre- berî dijminan- dirûxand.

Bi rastî, em di rewşa revderbûyê de ne, ma ku ne weha be, gelo wate çiyê ku faris- ên ku dûvelangên me bûn- niha rojhilata welatê me dagîr kirine? Wate çiyê ku ereb- ên ku pêşiyên me bi navê (Tazî) dinansandin- niha welatê me li başûr û rojava dagîr kirine? Wate çiyê ku tirk- ên ku ji navenda Asyayê, berî hezar salî, derbasî roiavaya Asyayê bûn- nivê welatê me dagîr kirine?

Wate çiyê ku ermen- tevî jimara wan a hindike- bûn xwedî dewlet, û em- tevî pîrbûna me- wek sêwîyan di nav pençên dernexûn û setemkaran de bin? Me dixin zêndan, me di qûmê biyabanê de cûmdikin, kîmawî bi ser me de beradidin, gelo, ku eva ne revderbûn be ma ê çî be?! Ma rewşeke Ehrîmanî ji evê metirsîtir heye?!

Tiştê herî balkêş li ba dagîrkeran ewe, ku welatê me di destên wan de bimîne, jib bo pişaftina me bi serî bikin, û dahatiyên me ji bo piroiyên xwe bi kar bînin, û em her û her li ber destên wan bin, solên wan damalin, li ber deriyên wan dîdevan bin, di cengên wan de cangor bin, kultûra wan dewlemend bikin, hin caran jî bertîlan pêşkêşî me dikin, rê didin ku em bibin şalyar û serokkomar, da ku hizra me ya neteweyî pûç bikin, me ji pîrsgirêka me ya serekî biderxînin.

Belê, xwasteka dagîrkeran ewe ku em dest ji (Neteweya Kurd) û (Kurdistanê) berdin, ew li dijî hebûna me ya neteweyî ne, ew dizanin avakirina Dewleta Kurdistanê ê dewletên wan lawaz bike, dizanin dewleta me ya pêşerojî ê bibe xwedî hêzeke gewre di her warî de (zanistî, abûrî, leşkerî û şaristanî), gelên cîhanê ê bizanibin ku em gelekî xwedî kok û binyadin, ne diz û keleşin.

Dagîrkerên faris, tirk û ereb, li dijî hebûna me ne, li dijî hebûna dewleta me ne, di eva çarçewê de cenga me li dijî wan didome, lewre pêwîste ramyarên me pirojeyên xwe li gorî ewa rasteqîne damezirînin, û gelê me di her warî de hişyar bikin. Rêbazek dibêje: „**Heş ewe ê ku dibe hebûn**“, العقل ما يؤدى, ango: karê te diyardeya heşê bipirsin: Gelo, te ye, werin em li ber

ronahiya eva rêbazê ji xwe bipirsin: Gelo, me di asteya neteweyî de çî pêk aniye?

Pêkanînen MeÊ n Neteweyî:

Mixabin, pêkanînen me yên neteweyî gelek hindikin, jarin, qet ne di asteya têkoşîna me de ne, gelek partiyên me duruşmeya “**rêzgariya Kurdistan**”ê rakirin, lê di pê re xwastek bû “**rêvebirîya xweser**”; ango destladarî di destên dagîrkeran de be, erê, wateya (rêvebiriyê xweser) ewe, ku em qirika neteweya xwe di pençên dagîrkeran de bihêlin.

Li Başûr: bi kêrî hevdiştiya Sunna û Şî'a, me fîdralî bi dest xwe xist, lê zûka em pê hay bûn ku ew fîdralî li ser erdhejekê ye, hema hema başûr bi xwe bereve parçebûnê di navbera Hewlêr û Silêmanî yê de dere.

Li Rojava: jî- bi kêrî hevdiştiya Sunna û Elewîya- hinekî bêhna me fireh bû, lê em li wir jî parçe parçe bûn, hinek ji me bûn hevalê opozisyona çekdar, hinek bûn havalê opozisyona neçekdar, hinek bûn hevalê rêcîma Sûrî, û hinek jî bi serê xwe man.

De werin em rewşa xwe li Bakur û Rojhilatê bipelînin.

Li Bakur: em li ser erdeheja parçebûna (Sunnî- Elewî) û (Kurmanc- Zaza) dijîn, berê jî- di şûreşên sedsala bîstan de- me gelek êş bi sedema eva parçebûnaê dît.

Li Rojava: jî em li ser erdeheja parçebûna (Sunnî- Şî'î) û (Kurmanc- Goran- Lurr) dijîn.

Bi serde jî metirsiya mezin ewe ku gelê me- hêdî hêdî- bikeve ber dawa hevdiştiya pirojeyên faris, tirk û ereban, û em belawela bibin, eger ku em têwerî eva bîra vebînî bin emê sedsala bîst û yekan jî di bin destên setemkaran de derbasin.

Ji bilî vê jî, ma tiştekî normale ku di her qonaxekê de, dor deh hezar kurd çekan rakin, li dijî dagîrkeran agirê şûreşê gurr bikin, û di pê re şûreş were rûxandin? Gelo ma ta gingê pirê gelê me ê li dervayî têkoşînê bin? Ka çend ji rewşenbîrên me, bi awayekî dilsoz, xwe xistin çarçeweya şûreşê? Ta kîjan asteyê em aborî û medya xwe di penava têkoşînê de bi kar tînin? Ne deh ji sedî! Gelo ma çewa amê karibin, bi eva xebata lawaz, welatê xwe ji dest setemkaran rêzgar bikin?

Ji evê û pê ve, diyardeyeke din dihêl ku mirov xemgîn û dilmayî be; wa binêrin çewa gelên Rojhilata Rojhilata Navîn- jin û mêr- li dijî destlatharên xwe serî hildane, xwîna xwe dirjînin, ne ji bo ku ew bindestin an welatê wan hatiye dagîrkin, nexêr! tenê ji bo ku destlatharên wan ew xistine bin darê setemkariyê, gelo ma kî pêwîstiyê serhildanê ye?! Ew gelan an gelê me yî ku welat û rûmeta xwe bin pê bû ye?

Gelo, ji bo çî vîna şûreş û cangoriya giştî û bêhempa li ba wan gelan heye, û em jî her car hinek ciwanên xwe dajon çiyar, da ku şûreşeke durpêçayî bi rêve bibin? Ma eva bi xwe ne diyardeyeke balkêş û xemgîne?! Ma ev diyardeya ne behaneyekê ku em di rewşeke Ehrîmanî de ne?! Ma ne pêwîste ku em giyana revderbûnê bidin sikinandin?!

Çî dibe jî, pêwîste Kurdistan were rêzgarkirin!

Ev gotara bi zimanê erebî jî hatibû weşandin.

pirtûkên nû

Berhema nû ya nivîskar Receb Dildar

Li Dû Xezalekê, berhema nû ya nivîskar Receb Dildar “Li Dû Xezalekê” berî pêşangeha pirtûkan a Stenbolê ya 2012yan ji weşanên AVA derket!

Nivîsên Receb Dildarê ku wek helbestkar û nivîskar hatiye nas kirin di gelek kovar û malperan de belav bûne. Li ser ziman û edebiyata Kurdî xwediyê xwe û kedek e giran e.

Receb Dildar heta niha di pêşbazîya çîrokên zarokan ya Şaredariya Sûrê ya Amedê de xelata yekemînî wergirtiye. Disa di pêşbazîya çîrokên Kovara Nûbiharê ya hejmara 100. de xelata yekemînî wergirtiye.

Receb Dildar di sala 1958-an de li Amedê hatiye dinyayê.. Ji bilî çar salên dibistana mamostetiye ya Kirşehîrê hema bibêje hemû jiyana wî li Amedê derbas bûye. Piştî darbeya Îlonê ya 1980-yan çar salan di zîndana Amedê de dimîne û heta dawîya emrê wî karên dewletê (kamû) lê tê qedexekirin. Zewicandî û bavê çar zarokan e. Berhemên wî yên heta niha hatine çapkirin ev in:

- 1- Kewê Canê, helbest, 2003
- 2- Dewran (Seyîd Alp) Werger 2005
- 3- Şikefta Xwekuştinê, çîrok, 2008
- 4- Li dû xezalekê çîrok 2012

Berhema "Li Dû Xezalekê" ji pênuşek bi hêz, bi zimanekî şêrîn qor bi qor hatiye lêkirin, ji donzdeh çîrokên nûjen û ji nod û şeş rûpelan pêk tê. Mijara çîrokên bi giştî li ser evîn, têkiliyên mirovan û pîrsgirêkên jiyane ne. Çîrokên di berhema "Li Dû Xezalekê" de ew ê tamedê bê hempa di dil û majiyê we de bihêle.

Weşanxaneyê Ava

Li Dû Xezalekê
Receb Dildar



Kemal Tolan

Gava ku kevneşopên bingeha olekê neyêne jiyandin, zarok û ciwanên civakê jî nikarin sedûhedên wê olê biparêzin!



Belê birêzan, gelek ji we dizanin ku min beriya gelek salan gotiye, " ne raste ku em timî dîrokas, ilimdar, oldar, dê û bavên xwe seba kêmasiyên ketine nav dîroka me sudar bikin. Bi dîtina min, îro ji me jî gelek tişt tene xwastin û divê em ji her demê bêtir alîkariyê bi rêxistin û tifaqên di nava civak û netewa xwe de bikin. Tiştê di vî warî de bikeve ser milên min, ezê jî weke gelek nivîskar û lêkolîvanên Êzdiyan li gorî Êzdî nasîn, nêrîn, zanîn û îmkanên xwe timî li ser wê derya bîr û bawerên (kevneşopên) me Êzdiyan û li ser kevniyaya dîrok, ziman û wêjeya Kurdî binivînim.....(*1)"

Ez îro jî dîsa dêjim, gava merivên temen mezin ava bîra xwe şêlûbikin, dûre jî ew wê avê bi zarokan bidine vexwarin û zarok pê nexweşbikevin, ji vexwarina hemû ava bîran bitirsîn û bi gotina mezinên xwe nekin, hingê bila mezin jî zarokan gunehbar nekin.....

Vêca, ji ber ku gelek Kurd-Êzdî girîngiyê nadine van nixandînan min, ez niha dixwazim hinek nixandînan **psikoanalîtîkî** xerîban, yê mîna „Sigmund Freud, ku **bijîşk**, pisporê **derûnînasiya kûr** û navdarê **psikoanalîtîka** sedsala 20emîn e“, pêşkêşî we hêjayan bikim û hêvîdarim ku hûn bala xwe bidine vî **psikoanalîtîkî**, ka wî çî li ser pîrgirêkan „**derûnînasiya kûr** „, gotiye?

Belê Sigmund Freud e dêje, „- zarok di binbîra xwe de pak û zelale. Qirêc û gemarî û başî ji mezinên xwe hîn dibe. Kes û cihan eger dostane bin, hevne nekesî ne mumkun e. Kes bi mêjoyê xwe û aqlê xwe û bîr a xwe dewlemend e. Eger kes mêjo yê xwe re îxanê neke, ew him ji bo xwe, him jî ji bo gelê xwe nîmetek mezin e. Her zarok di mêjo yê xwe de cihanek mezin e. Jiyana koledarî de zarok di nav kesên bêkes de zelalî û mezintî ya xwe wenda dikan.

Her bav û dê dixwazin zarokên xwe di malbata xwe û dibîstanan de baş perwerde bikin, lê çawa?

Malbat bi hezar salan demek dirêj bindestên îdeolojiya olan û îdeolojî ya fermî a devletan de bi rewşa kewneperestî de helak bûn. Çawa zarokan perwerde dikan? Her dem bi hem demî dîrok li ser sîstema koledarî

dimeşe û jiyana bi ol û edetên wan her dem carî dike. Sîstema koledarî, doh û îro li ser çerx a qedera bindestan dilîhze. Ew şervanên koledarên xwene. Mirovên di jiyana de cîh digire, bi wî şeklê dije. Hemu malbatan de dijîn û zarokên wan hene. Pêwîste ki ew hemû zarokên xwe perwerde bikin. Zarok di mal de bingeha jiyana a xwe ava dike. Binbîra xwe jî bi vî ava çê dibe.

Ege mirov hêsiere binbîrê xwe be karê wî û azadî ya xwe rast na meşe. Dema yekemîn de mirov ger binbîra xwe pakij bike û bigihîşe cax û demsala xwe.

Mirov çawa ji xwe û ji kewneperestî ya xwe azad dibe?

-Azadî, xewn, xeyal nayê standin, nayê kirandin û firotin, lê mirov dikare xewn, xeyal û azadî bije. Jiyana azad bi kesî ya azad mumkun e. Mirov dikare xwe azad bike, lê nikare kesî azad bike.

Mirov ên azad li kesî tade nakin. Zilamên azad tade

li jin û hevalên xwe nakin. Tade yê di malbatan de dibe tadeyên zilamên bindest in. Zordest li zilam ên bindest dikan, zilam ên bindest jî di malbata xwe de tade li jinên bindest dikan. Tade, kar ê kewneperestan e.

Jin ên kewneperest kar û barên wan jiyana a kewneperestî ye. Ol û sîstem ên kewn û kewneperest li xwe bar dikan û bi vî rewşê de zorokên xwe perwerde dikan. Bo kewneperesti perwerde dikan. Zarok ên xwe ên keç bo bindestî amade dikan û zarok ên law bo tadekar ên mêr amade dikan.....(*2)"

Her wisa Friedrich Hegel jî dêje: „.....**xweza** û hemû hémanên zanyariyê berhemên bîra bémerc in, ev jî, ji derveyî sîndorên bîra merivan e.....(*3)"

Min li ser vê bingehê jî û di *1,rûpel:82 de gotiye: Di Êzdiyatîyê de xwanê dibe derenca(qedre) her Xwedan, Milyaket, Cin, Perî, Qenc, Xas û Qelenderên Xwedê ji hev cûdeye û wusa jî cîh, qedir û qîmetên wan ji hevûdinê mestir û bilintirin. Êzdî li gorî baweriya xwe hêj gelekî qedir û qîmetê didine hemî cîh (gir, newal, dar, çiya, çem, zinar, gelî, şikeft, çol, xanî, mal û whd.ê) û deverên ku Milyaket, Xwedan, Cin, Perî û Qelenderên

Xwedê sur û keremetên xwe şanî Qenc, Xas û Qelenderên Xwedê kirine û qencên Xwedê lê runiştine îbadeta xwe kirine anjî lê kiras guhartine pîroz dibînin. Hemû cîhên Silavgeh, Ziyaret, Qub, Parêzgeh, Zêw, Mal, Gor, Mezel û whd. li ba me Êzdiyan gelekî pîrozbun. Me Êzdiyan ji ber baweriya xwe, hemû tiştên **xweza** (ax, av, dar, kevir, agir û whd.) li wan cîhên pîroz hebu diparast û disediqand.,,

Ez îro dîsan dêjim, eger ku dê û bavên zarokan van kevneşopên bingeha ol û çanda civaka xwe, yê ku ji bo jiyana bihevûdinê gelekî girîngin, bi zarokan re jiyana nekin, zarok û ciwan nikarin jiber xwe ve sedûhedên civakê û olê, yê ku girîngin nasbikin û biparêzin.

Bi dîtina min gava ku, em Êzdiyan temen mezin pişgiriye nedine rizgarîxwazên Kurdistanê, mal-komelên Êzdiyan, bi zimanê bav-kalan xeber nedîn, van kevneşopên cejin û rojiyên xwe yê ji bo maznaya ya Xwedê, pîroziya Milyaket, Xas, Qelander û hemû kevneşopên ola xwe(yên mîna : Êzî, Şêşims, Xwedanê malê, Şerfedîn, Çilê Zivistan û Havînê, Xidir Elyas û Xidir Nebî, Qurbanê, Çarşema Sor, Ziyaret, Cemayî, dawetnebî û whd.) tevî zarokan zindînekin û em wan nedine nasandin, mafê me tûne ku em daxwaza pêşvebirin û parastina wan ji zarok û ciwanan jî bikin!

Ez dixwazim vê nixandina ku li ser "Derûnnasiya komî" hatiye gotin, "Kes çawa nê bike rêvabirî ya malbat a wî bi gorî wî awayî dimeşe. Azadi ya civak jî gorî nê a xwe tê holê. Ger her kes xwe bi xwe azad bike ki civak azad be.(*2), bînimê bîra me tevan û li ser vê bingehê dêjim, ez zahf xemgînim ku gelek dezgeh, rojname, kovar, mal, komel û malperên me Êzdî(Kurd)an, îsal(2013) jî di çalakî û di ragihandinên xwe de zêde girîngî ne dane aghdariyên pîroziya kevneşopiya cejna Xidir Nebî -Xidir Elyas jî.

http://ku.wikipedia.org/wiki/Sigmund_Freud

http://ku.wikipedia.org/wiki/Der%C3%BBn%C3%AEnasiya_kom%C3%AE

http://ku.wikipedia.org/wiki/Georg_Wilhelm_Friedrich_Hegel



Feqî Huseyn SAGNIÇ

DEVOK, ZARAV û SALNAMA KURDÎ



Pêşî vê yekê bibejin: Zimanê Kurdî gelek dewlemend e. Wisa dewlemend e, wêjedar (edebî), rêzdar û bi rêk û pêk e ku Ereban, Osmanîyan, Farîsan, Tirkîyan û hwd. bi tevî hêzên xwe şer kirine, nikanibûne ji himatê rakin. Di van şerên giran de zimên bi serê xwe û tenî, erxwedana xwe domandiye. Ew serê qirêj hêj didome û zimanê me jî berxwedana xwe dike.

Dewlemendiya zimanê Kurdî him ji xezîna peyvan û him jî, ji teknîka zimên tê. Heke zimanê Kurdî, bê kêmasiya qeydên rêzimanî ye bibêjim ne qubqubandine. Rêzimanê Kurdî yê ji alê min ve hatiye nivîsandin, libek jî be, qeydên wî ji alê min ve ne hatine çekirin. Ev qeyde hemî, min ji binyada zimên derxistine.

Xwezayî rêzimanîvîsên zimanê Kurdî, hemîyan jî wilo pêk anîne. Çawa ku tu qeydên rêzimanê Kurdî çêkirî tune ne, wisa qeydek be jî, ji zimanên biyanî ne hatîye. Nexwe qeydên rêzimanî hemî xwemale ne. Malê zimanê me bi xwe ne. Xezîna peyvan wekî teknîka ziman xwerû, xweser û xwemale nîne.

Di xezîna peyvan de, peywîstiya hemî zimanên dinyayê bi hevdu hene; peyvan didin hev û ji hev distînin. Ew zimanên ji malbatekê bin gelek peyvên wan ên wekî hevdu henin û hêsantir jî dikanin bi hev re dan û standin peyvan bikin. Zimanê Kurdî jî bi zimanên cihanê re ketiye van dan û standinan. Lê çawa hinek bextreşên nezanên zimanan, bi dijminî dabaşa wezayî, xizanî û berhevkirina zimanê Kurdî dikin, ew ne rast e. (Çawa me li jor jî hêma kiribû zimanê Kurdî jî ketiye dan û standina peyvan.

Ev gotin rast e. Lê bi qasî zimanên cîranên xwe, peyv ji biyaniyan ne standiye. Nexwe, zêdehiya zengîniya xezîna peyvan jî, ji binyada zimên û tekûziya peyvan tê. Di binyada zimanê Kurdî de, binyadeke kevnara wêjeyî heye. Ew binyad digihîje şehreza ezopotamyaya pêşîn... Ji wir dest bi pêşveçûn û tekûziyê kiriye û heya roja me hatiye. Heçî tekûziya peyvan e, ji hemî aliyan ve xwiyaye. Li vir ez dê mijareke piçûk hildim destê xwe û biborim:

1- Gelek peyvên Kurdî yên hevedudanî hene.

Wekok: serdar, serder, tenîjder, bergeh, bargeh, asêgeh, çaydang, xwelîdang, xwêdang, sertas, sîmteraş û hwd.

2- Gelek peyvên dengên xwezayê hene.

wekok: şrên, xwirên, tiqîn, qîjîn, hîrîn, borîn, zingîn, barîn, zûrîn fiqîn xwisîn û hwd.

Peyvên hevedudanî, her yek li gor têgih û peywira xwe derketine himatê. Heçî deng in, yên xwezayî bi xwe ne. Ango ev deng ji lebat (livîn) a xwezayî bi xwe derdikevin. Her yek ji van cûrên peyvan, di zimanê, Kurdî de bi hezaran in. Heke keysa me lê bê, em dê di nivîsarên xwe yên pêşerojê de bi firehî li ser van rawestin.

Niha em dê bînin ser devok û zaravên Kurdî ku mebest ji vê nivîsarê ew e: Gava Kurd û Kurdistan digel vî zimanê xwe yê zengîne wêjeyî û binyadî kete bin destê biyaniyan ew zaravên nêzikî hevdu ji hev dûr ketin û ji zaravekî de jî gelek devok afirîn. Ji ber bê çaretiya damezrandina bazara netewî û navendî nekirina zimanê gelêrî, çiqas dem pêş ve diçe navbera zarav û devokan ewqas zêdetir vedibe.

Heke demek zûtîrîn pêşî lê ne yê girtin, dê bikeve girdavek wisa ku, êdî çara filitandina wan tune be.

Ji xwe di vê yekê de em gelek dereng mane. Derengtir mayîn, tenê kêrî çavnebar û kîndarên Kurd û Kurdistanê tê. Ji xwe va ye çend sal in, wan xerezkarên dest bi

xebata xwe ya kirêt kirine û dabaşa Kurdî nebûna hinek zaravên Kurdî dikin. Ew qasik ji hev dûrketina zaravên Kurdî hiltînin destên xwe, wekî zimanên cûda didin nîşan û pêşkêşî gelê me dikin. Ev celeb rengmirov, xwe mîna zana û zanyaran didin diyarkirin û vê çewtiya kifşe bi gelek mirovên xêşim didin bawer kirin. Gereke berê her karî pêşî li vê bê girtin. Pêşîgirtina vî karî ya tam, bi damezirandina bazara netewî û navendîkirina zimanê netewî pêk tê. Îro ev yek bi destê me nakeve. Ev daxwazek bilind e. Têkilnebûn û betal rawestan jî ne dirist e. Nexwe, divê em çî bikin? Ya ji me tê û îro em dikanin bikin ev e:

Divê em peyvên devokên herêmî hildin destê xwe, rastnivîsa wan tesbît bikin û bi herêmên din bidin aşîna kirin. Ew peyvên ji alê herêmekê ve, gundekî ve û mirovekî ve bînin xebitandin, gereke bînin gelemperî kirin ku herêmên Kurdîstanê bikanibin bi hevdu re biaxivin û ji nivîsandina hevdu fam bikin. Tenê ew peyvên çewt ên derveyî rêzik û teknîka zimanê Kurdî, divê ji zimên bînin derxistin. Yek jî, ji bilî wan peyvên navnetewî, ew peyvên biyaniyên di zimên de hene, heke Kurdiya wan hebe, divê ji zimên bînin dûr kirin, heke Kurdiya wan tune be, bila li cihên xwe rawestin, heya Kurdiya wan bê dîtî. Ji vê şîrovekirinê daxwaza min ev e: Gereke, em dest bi çêkirina peyvan ne kin. Bi çarên weha pirsgirêka devokan tê bişkavtin. Di zanîna min de, bi kedek nîvçe, em dê bikanibin ji bin barên devokên zimên derkevin.

Tenê, ji devokên hemî herêman re birêzkarî pêwîst e. Lê pirsgirêka zaravan ne ewqas hesan e. Xebateke ji dil û dûvedirêj dixwaze. Di zanîna min de, pirsgirêka zaravên Kurdî, bi zor bi vî awayê jêrîn çara bişkavtina wê dibe:

Dive zarav hemî, her yek di binika xwe de, dest bi xebata xwe ya zaravî bike. Rêzimanên xwe binivîsin. Teknîka zaravên xwe bê kêmasî derxin. Peyvên xwe hemîyan berhev bikin. Ferhengên xwe yên zanistî sererast bikin. Li ser devokên xwe xebateke qenc pêkbînin. Ji wê pirsgirêkê re çarekê bibînin û bê kêmasî bazara netewî jî damezîrin. Paşê dabaşa bişkavtina pirsgirêka zaravan tê kirin. Lewra, heya ev karên jorîn ên dabaş jê hatiye kirin pêkneyên, zana û zanyarên zimên nikanin xebateke qenc li ser zaravan bikin û bigihînin hevdu. Baş e! Ma îro ji bo zaravan tu karên bînin kirin nîn in? Ma qey em dê weha betal rawestin? Na, gelî hevalno, na! Ji me re, betalî dest nade. Gereke, îro em dest bi xebatê bikin û ji bo nêzikî hevdu kirina zaravan, bi vî awayê jêrîn bikiçvîjin:

1- Gava di zaravekî de peyvek tune be, gereke ji zaravekî din bistînin.

2- Heke di zaravekî de peyvek dirûv an jî, têgih ne xweş hebe, dîsa ji zaravekî din rakirin dixwaze.

3- Heke di zaravan de peyvên biyanî hebin, gereke, ew peyv bînin derxistin û di cihên wan, peyvên netewî (ji zaravên din) bînin girtin.

4- Heke yek ji van mercên jorîn, li himatê ne xwiyên, tenê ji bo nêzik kirina zaravan jî be, dîsa dan û standina peyvan çêtir e. peyvan çêtir e.

Lê gava ji zaravekî peyvek hat hilandin, gereke ya zaravê xwe jî, ji bîr ne kin. Ango, cih bi cih herduyan jî, bikarbînin. Bêjin, ji zaravekî bêjeyek hat hilandin û ya zaravê xwe ne xebitand û hat ji bîr kirin; di vê tevgerê de çî havil dixwiye? Na hevalno, ew karên wec û havil tê de tune bin, gereke ne yên kirin. Gaya ji zaravekî peyv bînin hilandin û peyvên zaravên din bînin winda



winda kirin, wec nade zengîniya zimên. Dixwazim qasekê li ser vê mijarê rawestim:

Ew peyva bi Erebi jê re "mewzû" tê gotin, Kurmanciya wê "mijar" e, û Soraniya wê "babet" e. Nivîskarên me peyva babet di hemî cihan de bikartînin. Lê peyva mijar betal hiştine. Halbûkî peyva babet, di zaravê Kurmancî de bê guher têgih "Layiq" a Erebi û "yaraşir" a Tirkî ye, gelek hozanan bi vê têgihê bikaranîne û di hemî herêmên Kurmancan de jî bi vê têgihê tenê tê xebitandin. Ew peyva bi Erebi jê re "ma'na" û bi Tirkî "ardam" tê gotin, Kurmanciya wê "têgih" û Soraniya wê bi peyva "wate" tê bikaranîn. Nexwe, "wate" me ji zaravê Soranî anîye û dixebitînin. Ev karekî rast û dirist e. Ji xwe maf e jî, wisa nin. Lê gereke peyva "têgih" jî ne yê winda kirin û divê ew jî bê bikaranîn. Lewra her peyvek, ji bo zimên kozikek e.

Mafê tu kesî tune ku kozikên zimên biherifîne an jî winda bike... Ew peyva bi Erebi jê re "kelîme" tê gotin, bi Kurmancî "peyv, bêje" û bi Soranî "wûşe" tê gotin. Peyva "wûşe" ji zaravê Soranî hatiye standin û di zaravê Kurmancî de tê bikaranîn. Ez vê yekê rast dibînim û dipejirînim, lê gereke "wûşe" ne be hakimê "peyv" û "bêje", çawa ku naxwazin "bêje" û "peyv" bibe hakimê "wûşe". Çawa serdestî û bîndestîya candaran karekî ne xweş e, ya peyvan jî wisa ye ... Ew peyva bi zimanê Erebi jê re "îşxal" dibêjin, bi zaravê Kurmancî "vegirtin" û bi zaravê Soranî "dagîr" jê re tê gotin. Nexwe ev peyva han jî, me ji zaravê Soranî anîye. Ev jî wekî wan peyvên jorîn karekî pir qenc e. Lê bi wê mercê û peyva "vegirtin"ê ne yê winda kirin. Peyva "vegirtin" di eynî demê de, rader e û di hemî celeb û demên lêkeran de jî tê kişandin.

Wekok: Vegirtin, vegirt, vegirtiye, vedigire, vedigirt. Dê vegire, vegire, bila vegire, ku vegire û hwd...

Bi vî awaye jorin, bê alîkar hemî kêşanan diqedînin. (Çawa bi kirdenavî, peyva "dagîr" dibe "dagîrker" û tê bikaranîn. Wisa peyva "vegirtin" jî dibe "vegirt, vegirtox" û di her kar û cihan de tê bikaranîn...

Ew peyva bi Erebi "şûbe" jê re tê gotin, Kurmanciya wê ez nizanim, bi Soranî "liq" dibêjin. Ew peyva bi Tirkî jê re "dondurma" dibêjin bi Erebi û Kurmanciya wê nizanim, bi zaravê Soranî "besten" jê re tê gotin. Ev celeb peyv, bê merc gereke di zaravê Kurmancî de bînin bikaranîn...

Ev û manendê van dan û standinan li navber zaravên Kurdî bînin kirin, dê gelek nêzikî hevdu bibin. Ev yeka han peywira her Kurdekî ye. Xwezayî dijmin mijokerên Kurd û Kurdistanê dixwazin zaravên Kurdan ji hev dûr xînin û zimanê wan biherifînin ku bi kanibin serdestiyê bikin. Gereke Kurd vajiyê wan, van karan bidomînin. Em ji van karan re, gelek derengmayî ne. Di mercên îro de, êdî hêza Kurdistanê jî derengtir xistinê re hîç ne maye. Nexwe divê hema dest pê bikin û karên êvarê ji sibe re ne hêlin. Li ser vê hemana jorîn, ji alê me ve dest bi xebatê hatiye kirin. Peywendiya vî karî Enstîtuya Kurdî salnameke derxist. Di derxistina vê salnamê de sê mebest hebûn:

1- Piraniya damezirînekan bi naveroka zanînên xwe, her sal salnaman diweşînin. Diviyabû Enstîtuya Kurdî ji vî karî paş ve ne mîne.

2- Diviyabû Enstîtuya Kurdî salnama Kurdî ji, bi salnam zayînî re pêşkêşî cîhanê bike û bi vî awayî hêjaneke Kurdî ji tarîtiyê rizgar ke.

3- Ew salnamên me yên ku ji alê damezirînekên Kurdan ve hatine derxistin, navên hinek mehan bi Kurdî ne, yên din, beşekî çewt bûn û beşek jî ne bi Kurdî bûn. Diviyabû Enstîtuya Kurdî navên hemî mehan bi Kurdî ji civatê re bibexşîne.

Gava Enstîtuya Kurdî gunehê vî karî hilda destê xwe, di zaravê Kurmancî de navên hemî mehan peyda ne kir. Di vir de, rêzika zaravan nêzîk kirina hevdû derket himatê. Ji navber zaravên Kurmancî û Soranî, navê her diwanzdeh mehan bi Kurdî salnama Enstîtuyê hat weşandin. Hêvidar im, ji îro paş Kurd hemî, bi Kurdî navên mehan bi cihkirina salnama Kurdî, salnamên xwe biweşînin. Bi vî awayî jî navên mehan, ên çewt û ên ne bi Kurdî rizgar bikin û salnama xwe jî binasin.

Piştî derketina salnama Enstîtuya Kurdî, mixabin, hinek deng hatin guhê min ku neqayilbûna xwe ji navên hinek mehan re dane diyarkirin. Ji xwediyê wan dangan re û ji yên wekî wan dihizirin re gotin ev e: Kanê gotina wan ji wê rewşa nêzîkî hevdû kirina zaravan re çî ye? Heke gotina wan "herê" be, ji xwe Enstîtuyê ev kar pêk anîye. Heke "na" bibêjin gereke sedempewistiya xwe şirove bikin û di weşanan de jî biweşînin.

Piştî vî şirovekirina jorîn, êdî kanin li ser navên wan mehan heya niha di salnamên Kurdî de cih girtine yên çewt û ne bi Kurdî rawestin:

Newroz nabe navê tu mehî ... Nîsan Erebi ji Suryanî ... Hezîran Erebi ji Suryanî ... Temmûz Erebi ji Suryanî ... Tebax Erebi ... Êlon, Îlon Erebi ... Çirî 1 ji Suryanî ... Çirî 2 ji Suryanî

teşrîn 1. Erebi ... teşrîn 2. Erebi ... kanûn 1. Erebi ... kanûn 2. Erebi ... Çile 1. nabe navê tu mehî ... Çile 2. nabe navê tu mehî ... sibat Erebi ji Suryanî

Çawa li tabloya jorîn hate berçav kirin, ew mehên ji alê damezirînekan ve hatine bikaranîn, navê şeşan jê Erebi, navên çaran jî Suryanî bûne Erebi û navên didowan Suryanî ne. Navên sê mehan tenê bi Kurdî ne. Ew jî, di zanîna min de bi tu awayî nikanin bibin navên tu mehî. Çawa bihar, zivistan, xaç, xidîrînebi, vartivar, rojveger, avêtik û hwd. nabin navên mehan. Lewra navên werz û bûyerên salê ne. Wisa ew jî, navên bûyeran in û gereke navên mehan jî, li wan ne yên barkirin. Dixwazim qasekê li ser van bûyeran rawestim:

Newroz (li başûrê Kurdistan ji meha Adarê re Newroz dibêjin) rojê kifşe û di salnama Kurdî de bi "Sersalî" hatiye edilandin. Kurdan bi vî rewşê bi cîranên xwe daye nasîn jî. Ji xwe navê wê her karî ronahî dike û bi Kurdî ye:

new= nû, roz= roj, newroz= nû roj yanê roja nû, ne ku meha nû ye. Ew nav taybetiya wê rojê ye û bûyereka dîrokî ye. Mafê kesî tune vî roja pîroz bixwe qefesa mehekê.

Çile, navê wî li ser e; "çil" ji çil rojan tê. (çile çil roj e. Di çanda Kurdî de du çile hene: çilê Zivistanê û çilê Havînê. (çilê Zivistanê, roja yekê Berfanbar a Kurdî (22 yê Berfanbara zayînî) dest pê dike û roja dehê Rêbendana Kurdî diqede ku Tirk jê re "karakiş", Erebi jê re "erbeîn" û "zemherîr" dibêjin. Di vî mijarê de bi vî rewşê rîstokek heye. "çile çil roj, mehek û deh roj, Dewra berê çara berfavêtin û vekirina riyan tune bû Ji ber vî yekê, gava qasek berf dibariya, pêşî li riyan dihat girtin. Ango dibû mîna bendan û bi hesanî riya derketinê ne dida. Ji xwe di mehên zivistanê de, li Kurdistanê zêde barîna berfê, tundiya bager û bapêçê û ketina şapan (aşîd) tê zanîn. Ev bûyer hemî ji sedemên bendkirina riyan bûn.

te nizar yan beroj". Çilê havînê, roja yekê Pûşpera Kurdî (22 yê Pûşpera zayînî) dest pê dike û roja nehê Tîrmeha Kurdî diqede. (çilê havînê di nav gelên cîhanê de nikanim hîni hebûn û tunebûna wî bibim, lê di nav gelê me de bê kemasî cih girtiye. Bi kurtasî çile, ji çil rojên serma serê zivistanê û çil rojên germa serê havînê re tê gotin; ji ber vî yekê ev bûyer nabe navê mehan.

Navên mehên Kurdî yên ji alê Enstîtuya Kurdî ve hatine pejirandandin û di salnama Enstîtuyê de hatine weşandin ev in:

Adar, Avrêl, Gulan, Pûşper, Tîrmeh, Gelawêj, Rezber, Kewçêr, Sermawez, Berfanbar, Rêbendan û Rêşemî. Ev nav hemî Kurdî ne, kevn in, û têgihdar in jî. Xweza di her mehê de li gor werza xwe têgih distîne. Bi kurtî têgih navên wan ev in:

1- Adar: Kutirkirina "Avdar"ê ye. Ji xwe hinek herêm Avdarê bikartînin. Têgih bi av, xwedî av, têrav dide. Him jî têgih "av dikeve daran" dide... Di vî mijarê de rîstokek:

Serê Adare

Sê melek tene xwarê

Yek deng dike li biharê

Yek av dibe serê darê

Yek jî kêfek dide hesabdarê

2- Avrêl: Ji peyvên av û rêl (daristana çîyan) hatiye himatê. Di vî mehê de av dikeve rêlan jî. Ango rêl jî şiyar dibin.

3- Gulan: Meha gulan. Li Kurdistanê di vî mehê de gul tîn çînîn.

4- Pûşper: Hevedudaniya ji peyva "pûş" û "per" e. Ji giyayê ne diriyê hişkolek re "pûş" tê gotin. Di vî demê de giyayê çîyan wisa hişk dibe her wekî bi per in, ba lê dixê û difirîne. Lewra bi navê "Pûşper" hatiye bi nav kirin.

5- Tîrmeh: Hevedudan î û ji wûşên "tîr" û "meh" pêk hatiye. Di vî mehê de tîrêjên rojê rast tîn cîhanê. Ji ber vî yekê jê re "Tîrmeh" gotine.

6- Gelawêj: Di vî mehê de, stêrka Gelawêj xwiyadibe û cîhan hêdî hêdî ber bi sermayê ve diçe.

7- Rezber: Li Kurdistanê bi piranî tîriyên rezan di vî mehê de tîn çînîn. Ji bo çî peyva birîn tê bikaranîn û çînîn nayê xebitandin. Lewra weşiyên (gûşiyên) tirî tîn birîn. Ji ber vî yekê "Rezçin" ne rast e. Rezber bê xweşûş rast e.

8- Kewçêr: Ji çêrîna kewan hatiye hevedudanî kirin. Di vî mehê de kewên koçber ber bi zivistanwarên xwe ve difirin û bi şev diçêrin. Li gor wê, ev meh weha hatiye bi nav kirin.

9- Sermawez: Têgih navê wê li ser e; sermayê tîne.

10- Berfanbar: Ji barîna berfê ev nav lê hatiye kirin. Di vî mehê de gelek berf dibare, hişkî dikeve, serma zêde dibe û di serê mehê de çile zivistanê dest pê dike.

11- Rêbendan: Ev nav ji bendkirina riyan hatiye girtin..

12- Reşemî: Ev nav ji meha reş hatiye himatê. Her çiqas peyva "reş" bi têgih peyvî ya ferhengî, rengdêra rengê reş e, lê bi biwêjkî bi têgih xwerû, saf, sade tê bikaranîn. Wekî, mêrê reş, jina reş, leşkerê reş, zivistana reş û hwd...

Ji van mehan Pûşper, Gelawêj, Rezber, Sermawez, Berfanbar, Rêbendan, Reşemî ji salnama Hewser a sala 1958 an hatine girtin. Ev salname digel navên van mehan, ji alê dewleta Kurdistana başûr ve jî hatiye pejirandin.

Bi peywendiya salnamê dixwazim piçek jî, dabasa hefte û rojên wî bikim: Hefte bi Kurdî ye û ji hejmara heft hatiye girtin.

Ev hesab ji demên kevnare ve heya roja me li nav

Kurdan hatiye bikaranîn û hîna jî didomîne. Cînarên Kurdan jî, bi eynî navî ev hesab xebitandine. Dema ez gihîştimê, li Kurdistanê ji hesabê mehan zêdetir "Hefte" dihate xebitandin. Bê wekî, ez dê heftekî du hefte, pênc hefte, deh hefte û hwd. şûnda bêm digotin. Şem bi Kurdî ye, ji şev û rojekê re "şem" tê gotin. Li herêmên Kurdistanê carna "şemb" jî hatiye xebitandin. Lê ev yek gereke ne keve nivîsandinê...

Rojên Hefte

Di Ferhenga Di Ferhenga DiFerhenga Torî de Izolîde Malmîsanijde

şemî şemî şeme ... yekşem yekşem bazar ... duşem duşemb duşembe ... sêşemb sêşemb ... sêşeme, sêşime ... çarşemb çarşemb ... pêncşemb pêncşemb panzşembe ... înan cim'e

Di Salnama Enstîtuya Kurdî de Di Salnama Başûrê Kurdistanê de şemî şeme ... yekşem yekşeme ... duşem duşeme ... sêşem sêşeme ... çarşem çarşeme ... pêncşem pêncşeme ... înan heynî

Qenc dêna xwe bidinê di van her du salnaman de jî ahengî heye. Heya hejmarek din bimînin xweş.

Têbînî: Ji bo roja Zimanê dayikê, em vî nivîsa han dubare ji xwendevanên xwe re diweşînin. Nivîs ji kovara Enstîtuya kurdî ZEND. Havîn 1994, hejmar 2 hatiye girtin. (Pênûsa Nû).

pirtûkên nû

Çûka Keko Peko

Bav û kalanên me axîn, êş, evîn, hêvî, hest û heyelên xwe yê veşartî bi zindî ji zarokên xwe re gotine û hatine gihîştine me, û bûne çîrokên jiyane.

Çîrok çand e, çîrok dîrok e, çîrok kevneşopiya gel e... çîrokên me malê netewa me ye.

Ku zarok çîrokên bapîrên xwe guhdar bike an bixwîne wê xwe di nav çanda xwe de xwe bibîne, yê bi hestên dapîr û bapîrên xwe bijîn, wê di navbera wan de tu qutbûn çê nebe, herwiha zarokên me wê li ser koka xwe şî bibin û xwe nas bikin.

Paşa Amedî, çûye gund, çîrokên gundê xwe berhev kiriye, pirtûka xwe bi navê "Çûka Keko Peko/Pepûk" pêşkêşê xwendevanan kiriye.

Pirtûk ji 11 çîrokan pêk tê, ji alê weşana Nûbiharê ve hatiye weşandin.



Ebdulbaqî Huseynî

zanin88@hotmail.com

Ferhad û Şêrîn An Şêrîn û Xisro?!



«Rastiya vê dastanê di navbera Kurd û Farisan de»

Bê guman ev dastan an jî (efsane) di nav miletên Rojhilata Navîn de pir bi nav û denge, û bi taybetî di navbera gelê Kurd û cînarên wî de, wek; Faris, Ermen û Turkan. Ji ber vê hindê ev efsane bi gelek hawan hatiye gotin û bihîstin, lê a giring di vê babetê de eve:

- Gelo dastana rast a çi miletî ye?

- Gelo bingeha vê dastanê çiyê?

- Gelo lehengên wê, nejata wan çine?

Gelek pirs li ser dastana (Ferhad û Şêrîn) tene bala mirov,...

Em Kurd, pirê caran û bi taybet dema çêla evîne linik me dibe, van navan dibêjin; Mem û Zîn, Ferhad û Şêrîn, Siyamend û Xeçê.

Û eve di zargotin û gencîna gelê kurd de belûye!. Lê tê bîra herkesî, dema berê, ku malbat di şevên zivistanê ên dirêj de dicivyan û suhbet digirtin û ev çîrokana digotin. Gelek caran (Mem û Zîn) û (Ziyamend û Xeçê) digotin, û kêr - kêr caran çîroka (Ferhad û Şêrîn) dihate gotin.

Mixabin ev çîroka dawî, ne tenê kêr dihate gotin, lê ta bi rewşenbîrên me jî tu guhdan nedan vê çîroka gelêrî. Li himber vê pirtûk li ser çîrokên di hatine nivîsandin.

Wekû em dizanin, pirtûk li ser dastana Ehmedê Xanî a bi navê (Mem û Zîn) hatine nivîsandin wek nimûne;

1) Pirtûka Mihemed Emîn Bozarselan

2) Pirtûka Mihmed Seîd Remedan AlBotî

3) Pirtûka Mihemed Emîn Osman, ku li Kurdistana Başûr hatiye çapkirin û belavkirin (550 rûpele).

4) Pirtûka vê dawiyê a ku li Kurdistana Rojava belav bibû, bi pênûsa Jandost bû.

Eve ji bilî çend vekolînên ku li ser vê efsanê hatine nivîsîn, mîna pirtûka Hayder Omer, ku li Kurdistana Rojava bi zimanê Erebi belavbibû, ligel pirtûka Dr. Îzedîn Mustefa Resûl.

Herwekî di jî çîroka din (Siyamend û Xeçê), ewê parek baş ji nivîsandinê standiye, wek van pirtûkan; (Siyabend û Xeçê) a Zeynelabidîn Zinar, û (Siyamend û Xeçê) a Koyo Berz:

Herwekî di vê dawiyê de li Sûriyê pirtûkek bi zimanê Erebi di bin navê (Siyamend Ibnîl Edxal) ango; Siyamend kurê baxan, ji nivîsandinê M. seîd Remedan AlBotî hatibû weşandin.

Lê carekê di mixabin ku tu nivîsandin li ser dastana (Ferhad û Şêrîn) nehatiye dîtin, jî bilî pirtûkek biçûk bi awayekî helbestî û bi zimanê kurdî (zaravê Soranî) û bi tîpên erebî, hatibû wergerandin ji zimanê farisî, bi destê Elî Kemal Bapîr Axa, ku di sala 1957an de li Kerkûkê hatibû çapkirin.

Lê cînarên me (sînordaşên me) û bi taybetî faris, gelek guhdan dane vê efsanê û bi gelek hawan nivîsandine.

Ji pirtûka (Şêrîn û Xisro) a Mîr xisro Dehloy, tê zanîn bê ev efsane çend kesan nivîsandiye, û tev mirovin farisin.

1. Çîroka Şêrîn di pirtûka (Sea'libî) de, a bi navê (Qencîrîn nûçeyên Şahîn Şahên Farisan û jînegariya wan), di nav rûpelên (691-694) de.

2. Çîroka (Xisro û Şêrîn) li bal (Ferdewî) a ku di

(Şehnama) de, çildê çaran, rûpelê 100 hatibû belavkirin.

3. Çîroka (Xisro û Şêrîn) li bal (Nîzamî) a ku di sala 1913z de belavkiribû.

4. Çîroka (Şêrîn û Xisro) li bal Mîr Xisro Dehloy (xudanê pirtûkê).

Eger me çudabûn xiste nava her çar têkistan (deqan) de, emê bibînin, ku bingeha wan yeke, lê çend tistên biçûk têvil hene.

Û eger me çudabûn xiste navbera van têkistan ji alîkî ve û çîroka kurdî ji alîkî din ve, emê xalin pir giring bibînin.

Li vir emê herdu deqan (a kurdî û a farisî) ji xwendevanan re bi kurtî berbiçav bikin, da ku wekhevîyê û çudabûnê bibînin.



Kurtebêjiya (Xisro û Şêrîn) li bal Farisan:

Ferdewî di destpêka çîrokê de dibêje; « Ez ne kesê yekemînim ku vê çîrokê dibêje, lê min xwestiye ez wê xwestir bikim». Çîrok wiha destpêdike..

Carekê ji caran Perwîz (Xisro) ligel hin siwarên xwe derdikeve nêçîrê, Şêrîn vê yekê dibêje, radibe derdikeve ser bane xaniyê xwe, piştî ku cilên (kuncîlên)pir spehî lixwe dibe.

Xisro çav lêdike, hêstir ji çavên Şêrînê dibarin û bêhiş dibe. Xisro çend xulaman rêdike da ku Şêrîn saxlembikin û bibin qesra wî.

Piştî ku Xisro ji nêçîrê vedgere male, dibîne ku riya wî hemî hatiye xemlandin. Dema dikeve dîwana xwe, Şêrîn derdikeve pêşiya wî, dest û sere wî maç dibe. Xisro radibe di derhal de dişîne pey (Muabed) ango Mele, bo ku mehra wî û Şêrînê bibire.

Piştî şikirinê (zewacê), deng bi bajêr dikeve. Milet vê yekê dibêje, hemî dîrî Mîr Xisro dikevin. Xisro piştî roja caran dişîne pey mezin û maqûlên bajêr, û ji wan dipirse; Ka çi heye ku ti kesî pîrozbahîya min nekiriye?!

Jê re dibêjin; dest ji Şêrînê berde, ji ber ku wê kurdûndê te li tuxmê diya xwe derkevin, û wekû tu dizanî tuxmê Şêrînê nîne.

Koka Şêrîn di çîrokê de vedgerînin Ermena û carna Turkan.

Di wê rojê de Xisro ti bersivê nade, ji civatê re dibêje; başe, sibe werin dîwanxanê ezê bersiva we bidim. A di rojê Mîr Xisro leganekê (teşte) ji zêr tîne û tijî xwîna gemar dike, û şanî hemî kesên rûniştî dike, paş re ji xulamê xwe re dibêje, ku vê teşte bi av û axê bişon û paqijkin û tijî xweşavê bikin, û avgula bi ser dakin. Paşre Xisro dibêje; "We dît çawa ev teşte kete çi rengî de! Şêrîn jî mîna vê teşte bû, tijî belengazî bû, lê ana piştî ku giha min û kete qesrê, bû weke teştî nû tijî şerbet û behnên xweş.

Piştî guhdarkirina van gotinan, kesên li dîwanê rûniştî pîrozbahîya Mîr Xisro kirin û ji wê rojê ve şahî kete mîrneşînê.

Bi vî hawayî çîroka (Xisro û Şêrîn) a li bal farisan diqede bê ku navê Ferhad an jî kolana çiyar tede derbas bibe.

Kurtebêjiya (Ferhad û Şêrîn) li bal Kurdan:

Wekû me kurdan ev dastan bihîstiye, û wekû sînema Rûsî eynî dastan kiribû filim û dida xuyanî ku bingeha wê kurdiye. Ezê ji we re birêsim;

Dibêjin; keçek pir spehî li welatê kurdan hebû navê wê Şêrîn bû, Xuşka vê keçê Şaha welêt bû, pîrekeke bi hêz û tund bû, nivê rûwê wê bi xurî bû, lewma herdem çarîkek li ber devê wê bû.

Rojekê Şêrîn û çend cêriyên xwe dadikevin nav bajêr bo hin tiştan b xwe bikirin, li bazarê çav li xortekî çeleng dikeve, bedewbûna wî Şêrînê dîksîne evîne, Şêrîn nêzik wî dibe, jê dipirse: "Tu kîyî û li vir çi dikî?"

Xort bi nazî lê vedgerîne, dibêje: "Xatûna min, ez Ferhadê hunermendim, wêneyan saz dikim û paşre wan difroşim".

Şêrîn û cêriyên xwe li tabloyên wî bi hûranî temaşe dikin û yekê cara Şêrîn di bin çavan de li Ferhad dinere. Bi vê dîtinê dil dikevin hev..

Xuşka Şêrîn bi hezkirina wan dibêje, radibe dişîne pey ferhad. Piştî dan û standinê..., Xatûn şertekî davê ber Ferhad; Jê re dibêje; " Ferhad wekû tu dizanî, gel hewcedarî avê ye û em ber bi zuhabûnê diçin, eger te karîbe di vî çiyayê Bîston de bikole belkû kaniyeke avê hebe, û eger te ev kir, ezê dê Şêrîn bidme te, bo tu wê şîbike (bizewicîne)". Ferhad bersivê dide; Min şertê te pijirand (qebûl kir), a yekê ji bo gelê min, a didwan ji bo evîna min û hezkirina Şêrînê.

Ferhad bi ser çiyayê Bîston dikeve û tefşoyê xwe ligel xwe dibe û dest bi kolana çiyê dike. (Dibêjin ku Xatûnê ev şertê dijwar daye ber Ferhad, da ku wî dîrî Şêrîn bike ji alîkî ve, û ji alîkî din ve dizanî ku kolana çiyê karekî bê dawiyê).

Roj û meh derbas dibin, Ferhadê reben di kolana çiyar de mijûle, dîrî evîna xweye, dîrî berdilka xwe Şêrîn e.

Rojekê millet diçe seyra Ferhad dike, piştî ku dibînin av ji çiya diherike. Ferhadê reben jî ji kêfa bang dike gel, lê pêl û şîpên avê kêfa Ferhad nabin serî, bi xurtî diherke û wî bi xwe re dibe, ta ku cendekê wî dighê dawîya newalê.

Dema Şêrîna evîndar dighê cem Ferhad, dibîne ku bûye laşekî bê lebat, di derhal de xincera xwe derdike û li cerga xwe dide û bi ser cendekê Ferhad dikeve.

Bi vî hawî tracîdya (Ferhad û Şêrîn) tewaw dibe.

Piştî nasîna herdu têkistan a farisî û a kurdî, wekû diyare pir cudabûn di navbera herdu têkistan de heye.

Nîşanên kurdî di pirtûka Mîr Xisroyê Dehlewî de:

- Di rûpelê (17)an de ji pirtûkê, navê Bahramê Çopîn

û xuşka wî (Kurdiye) tê diyarkirin: “Dema kurdiye û mêrê xwe derbasî xaniyê Bahramê Çopîn bûn.” Wekû em dizanin Bahramê Çopîn û xuşka wî Kurdiye ji kokê ve kurdin, û eve di zargotina kurdî a devkî û nivîsandî de pir belûye.

- Di rûpelê (23)an de, xwediyê (Tarîxa Gizîde) Hemdela Mistewî AlQezwînî li ser pêmayên Kesra dibêje;” Ji tiştên ku Kesra li dûv xwe hiştiye çîroka Şêrîn û Ferhad e”. ji vê gotinê belûye ku navê çîrokê a kurdî ye, ne wek a farisî ye.

- Di rûpelê (25)an de, dema Perwîz qesrek mezin ji Şêrîn re avadîke û navê Şêrîn lêdike (Qesir Şêrîn). Ev qesir dikeve navbera Hamadan û Hilwan nêzîkî Senendacê ango di sînorê Kurdîstana Rojhilat de ye.

- Di rûpelê (57)an de, dema çavên Şêrîn li kevirêkî neqîşandî ket, xwest ku zanibe kî ev neqîş çêkiriye...., wilo çavên wê li xortekî şepal, bejin zirav ket, jê pirsî navê te çi ye û tu çi karî dike. Xort lê vedgerîne; ez Ferhad im û karê min kolandina keviraye. Ji vê xalê tê diyarkirin ku mîna çîroka kurdî ye, lê karê ferhad ne kolandina keviraye, belkî neqşandina li ser kevirê (pûtevan be).

- Di rûpelê (144)an de, dema roj çû ava, Xisro jî xwest ku razê, dema rabû ser xwe, te digot mîna Dehak “zehak” û Cemşîd e. Ev herdû navên dawî (Zehak û Cemşîd) di dîroka kurdî de navdarin,.. Zehak navê şahê Pêşdadiyaye ku di efsana Newroz ê de belûye, herwiha Cemşîd navê şahê çarane ji Pêşdadiyan.

- Di rûpelê (175)an de, navên deh dengbêjên jin dirêsin“Nesîm, Lalê, Aza, Gulreng, Şimşad, Gulav, Enwer, Meymûn, Nûşad û Taûs”. Û li himber wan navê deh bûkên nazik, ên ku rok nedîtine dijmêrin;” Bihar, Susin, Gulnar, Zilal, Kewser, Perwîn, Mîno, Neşat û Seyare”. Ji van her bîst navan xuyaye ku

piraniya wan navin kurdî ne, û ta niha jî bikartên.

- Di rûpelê (221)an de, kolana çiyayê Bîston ji layê Ferhad ve, daxwazek ji daxwazên Şêrîn bûn, ku rûbarekî di çiyayê de veke. Lê linik kurdan, Ferhad çiyayê Bîston dikole da ku avê bo gelê xwe derîne, eve jî li ser daxwaza Xatûnê xuşka Şêrîn. Herwekî din jî çiyayê Bîston ta îro li Kurdistanê lûtîkeya wê berze!

- Di rûpelê (276)an de, dema Şêrîn şîna dûrbûna Xisro dike, zevî tev dibe, wek tarîbûna bîra Bîjen û zindana Zehak. Wekû tê nasîn ku (Bîjen) navê lehengekî kurde, û ew kurê keça lehengê qehreman Rustemê Zal e. Û çîroka Bîjen hez keça Şahê Toraniyan Menîce xatûnê dikir. Toraniyan ew girtin û xistin bîrekê bê qerar de, tu ronahî nedidît, ta ku Restemê Zal ew riha kir.

- Di rûpelê (292)an de, Şêrîn ji qehra nava xwe re dibêje Xisro here û bi (Şekir) re xwe mijûl bike, û eger ew Şekir e, ez jî Şêrîn im, wek hingivim, û eger Şekir şekirê rastî be, ez Şêrîn im, ava jî nê me. Ji vê diyalokê tê nasîn ku navê (Şekir û Şêrîn) û şirovekirina wan jî tev ji rihê (canê) kurdî hatine deranîn..

- Di rûpelê (336)an de, Barbad stranek evînî ser zimanê Xisro ji Şêrîn re tê sazîkirin, ev stran li ser awazên (Rast) hatiye saz kirin. Herwekî em dizanin ku awaza Rast di mûzîka kurdî de pir belave, û bi kokê sazîk kurdî ye.

Piştî van hemî şanikên (xalên) ku di pirtûka Dehloyî de hatine destnîşankirin, em dikarin bêjin; ku parek mezin ji vê çîrokê ve a kurda ye, li vir gerek em jibîr nekin ku mîletên Rojhilata Navîn di dema berê de bi hev re xwedî dibûn, û gelek dîrokên wan bi hev re hebûn, û em jibîr nekin jî ku zimanê Kurdî û Farisî ji eynî darê ne.

Lê a giring li vir dimîne ku rewşênberên me û dîrokanên me kurdan li vê efsanê vekolin (vepexêrin)

da ku koka wêyî kurdî piştrast bikin.

Şerefname û lehengên dastana (Ferhad û Şêrîn):

Di dawiya vê lêkolînê de dixwazim kurdiyeta dastana (Ferhad û Şêrîn) ji xwendevanan re biçespinim, bi piştbestina pirtûka dîrokî (Şerefname a Şeref Xanê Bedlîsî)..

Di xwendinekê bilez li indeksa (naveroka) vê pirtûkê de, çavên min li navên gelek lehengên ku di efsana (Ferhad û Şêrîn) de derbasdibin, hene, mîna: Behramê Çopîn, Bîjen, Cemşîd begê kurê Rustem beg, Dîroka Gûzîde, Ferhad, Şêrîn, ...td.

- Di rûpelê (65)an de, di Şerefnamê de, çapa kurdî (Weşana Apecê, werger; Zîya Avcî, sala 1998) Vê efsanê berçav dike, dema dibêje; “ Ca niha jî em bîna behsa wan evîndarên dilbîrîn ên bi nav û deng ku di riya evînî û bendewariyê de dilê singa asê û sext a çiyê li ber hev derxist û bi hêviya ramûsana lêva Şêrîn a şîrîn dev ji giyanê xwe yê şîrîn berda û bi yada evîniya Şêrîn dawî li jîna xwe ya tehl amî”. Gelo ew kî bû?

Mesnewî:

“Binêre li Bêstûnê serkeş

Cerg û dilê pir ji birîn niha jî

Kîjan hêze dibê ku jê biriyê?

Kîjan çenge ku çiya dirandiye?

Nivîsand bi devê kuling li ser berd

Her Kurde ne berd û merdê bê gerd

Sertopê kurên Kurdê Kelhûr

Ferhad e rahên dil ve ji çîya dûr”.

Şanik; Ev lêkolîn min ji mêj ve nivîsandibû, lê eve cara yekê ye, ku wê belavbibe.

Heyder Omer

Cegerxwîn, kelepûr û helbesta hevber



Dergeh:

Gava metirsî û belayên mezin gef û guran didin mîletan û hebûna wan dixin ber dava dagîrkirin û pişaftinê, û gava zordariya polîtîkî û civakî hêzdar dibe, û hemî awayên azadiya gel dorpêç dike, û xwediyên peyva azad, çi helbestvan bin, û çi jî nivîsevan û ramanbîr bin, bi kotekî neçareyî bédengiyê dike, wê hingê ew mîletan ji xwe berê û yekser vedigerin rehên xwe yên netewî, bi her du destan û bi hestên germ pê digirin, da hebûna xwe li hember wan metirsiyan biparêzin û giyanê berxwedana xwe gur bikin.

Kelepûr jî yekek ji hêzdartirînên wan rehan e, ku mîlet li hember bahozan xwe bi ser de pal didin, ji ber ku dikare hestên netewî hêzdar bike, û baweriya wan bi regeziya wan biçespine, çimkê kelepûr gencîneya şahî û şînan, serkeftin û têkçûnan e, nimûneyên paybilind ji zargotin û dîrok û wêje di xwe de dicivîne, mîlet dikare waneyên kêrhatî jê werbigire.

Helbestvanê Misirê Mehmûd Samî El-Barodî; serkêşê raperîna wêjeya erebî di serdema sedsala nozdemîn de, bala xwe dide rewşa wêje û helbesta erebî, ku di serdema Ebebozan û Osmanîyan de gelek lawaz bûne, weha hizir dike, ku eger helbesta erebî venegere rehên xwe û li gel kelepûra xwe têkildar nebe, dê nikaribe, regeziya xwe biçespine, pêre jî dê her lawaz bimîne. Vê lomê ewî da ser şopa helbestvanên serdema Ebbasiyan yên bi nav û deng, û helbesta xwe li gor şêwe û awayên helbesta wan rist.

Evê xebata El-Barodî rê li pêş helbestvanên Erebbekir, ku di dema dagîrkirina welatên wan ji hêla îngilîzan û firansiyan de, vegehin kelepûra xwe û wê vejînin, da giyanê berxwedanê di derûnan de gur bikin. Rexnevan û dîroknivîsên wêje û helbesta erebî cefayên helbestvanên wek Ehmed Şewqî, Hafiz Îbrahîm, Ehmed Miherran, Ezîz Ebaze û hinên din di vê meydanê de zor biha dinexînin, ji ber ku ewana nav û bûyerên ronak ji nav kelepûra xwe vebjartin, û xebata wan di nav helbestên xwe re careke din anîn bîra civakên xwe, da ew civakan riyên wan lehengan bişopînin, ji hêlekê de li hember dagîrkeran ber xwe bidin, û ji hêla din de wêje û helbesta xwe vejînin.

Helbestvan û rexnegirê îngilîz T. S. Îlyot jî hevtêkiliya helbestvan û kelepûrê gelek bilind nixandiye, ewî sala 1917ê gotara xwe (Kelepûr û behreya xweyî) weşand, tê de weha çûye, ku nixrdartirîn beşê xebat û karê helbestvanan ew e, yê ku tê de bavpîrên xwe yên mirine vedijînin, û helbestvan û hunermendên hemî awayên huneran nikarin bi tenha nixrê xwe bistînin, belê nixrên wan di navbera hevtêkiliya wan li gel helbestvan û hunermendên pêşîn re tê xuyairin, û wek çawa buhêrek rêbertiya serdema niho dike, divê serdema niho jî buhêrekê biguhêre.

Mebesta Îlyot ji vê boçûnê ne ew e, ku kesayetiya helbestvan di kelepûrê de wenda bibe, û helbestvan jî bibe awêneya ku rêz û bawikên civakê tê re werin xuyakirin, pêre jî her du rengdêrên (sîfet) rasteqîniya wî; ango regezi û hemdemiya wî werin pişaftin. Mebesta Îlyot ew

bû, ku giyanê wan rêz û bawikan were naskirin, ew giyanê ku yekîtiya hemî beşên kelepûrê pêk tîne, û tev li ramana serdema hemdem dike.

Ramana serdema hemdem xelekeke tev li xelekên kelepûrê dibe, ji ber ku berdewamiya wan e, vê lomê jî hevtêkiliya li gel kelepûrê ti caran rê li pêş hevbestiya helbestvan li gel realiteyê nagire.

Ez nizanim gelo haya entilcênsiya çand û wêjeya kurdî, Cegerxwîn jî di nav de, ji bizava El-Barodî yê misrî û ji bang û boçûna Îlyotê îngilîzî hebû, yan na, lê tiştê ku em dikarin bê dudilî bibêjin ew e, ku gava entilcênsiya kurdî bala xwe da rewşa welatê xwe yê parvekirî, û gelê xwe yê bi şûnda mayî, berê xwe da kelepûrê, û gelek awa û cûreyên wê kom ser hev kirin, ji ser lêvan wergirtin û xistin ser rûpelan da ji ber lepên wendabûnê biparêzin, û deynin ber destên her kurdekî. Her weha gelek helbestvanan jî hilgêrên raman û hizrên xwe di wan cûreyên kelpûrê de dîtin, û ew hizran di navbera wan hilgêran re pêşkêş kirin, wek çawa Xaniyê nemir hizrên xwe yên netewî û civakî û polîtîkî di navbera vejandina çîroka Mem û Zînê re diyar kirin.

Cegerxwîn jî, piştî ku derdora 25 salan ji temenê xwe di hicrikên olewerî de têper kirin, pê hay dibe ku ne ji bo wê yekê hatiyê dinyayê, vê lomê riha xwe kur kir, şaşîk û çupe avêtin, û xwe berda nav civaka Kurd, evê civaka ku nîrên ayîni, aborî, civakî û dagîrkirin û parvekirina welatê dê û bavan, têkiliya wê li gel ziman û wêjeya wê lawaz kiribû.



Gava Cegerxwîn, wek helbestvan, bala xwe da rewşa ziman û wêjeya serdema xwe, û dît ku ji du hêlan de şerê wan tê kirin, çî ji hêla civaka kurdî de, ku ziman û wejeya xwe bi paş piştî xwe de avêjtiye, guh nade wan, û çî ji hêla dagîrkerên welatê wî de, ku bi her awayên fêlbaziyên hewl didin, da gelê kurd di nav xwe de bipişefîn û wenda bikin. Wê hîngê Cegerxwîn jî wek helbestvanên miletên din berê xwe da gencîneya kelepûrê, gelek çîrok, çîvanok, pend û metelok ji ser lêvan girtin, kom ser hev kirin, dan çapkirin û xistin ber destên civaka xwe, lê bi vê yekê tenha nekîr, belê bi ser de jî berê xwe da Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî, û jînenîgariya gelek leheng û kesayetiyan kurd ji nû ve vejand, û di dîwanekê de bi sernavê (Şerefnameya Menzûm) weşand, da civaka Kurd, di xebata li hember kotekiya zordaran û dagîrkeran de riyên wan kesayetiyan bişopîne.

Cegerxwîn di meydana helbestê de jî wê riyê digire, û nimûneyên geş ji wêjeya kevin vedibjêre, û helbesta xwe li gor şêwe, awaz û kêşa wan nimûneyan dirêse. Helbesta wî (Dil ji min bir), ku li gor ya Melayê Cizîrî (Şox û Sengê) nivisandîye, di vê meydanê de nimûneya payebilind e.

Mela yê Cizîrî; helbestvanê, ku di penava wêjeya kurdî de, bi nav û deng e, serkêş û pêşengê kilasîkên Kurd e, dîwaneke gewre, ku bi xebata Şêx Ehmedê Zivingî şirovebûye, bi şûn xwe de hêştîye. Di helbestên xwe de şeyda xuya ye, û dil û cergên wî bi germa evînê sotî xuyan in. Cegerxwîn jî ala kilasîkan ta sedsala bîstem bilind hildaye, û ketiye ber dava evînê.

-2-

Têrm:

Me li jor gotibû, ku helbestvanê Misirê Mehmûd Samî El-Barodî berê xwe dabû helbesta erebî ya serdema Ebbasiyan, ku rexnegir û dîroknivîsên wêjeya erebî pêşiya wê serdemê bi (serdema zêrîn ya wêjeya erebî) nav dikin, û helbestên helbestvanên navdar, wek Ebû Temmam, El-Buhtirî, El-Mutenbbî, û hinekên din vebjartibûn, û helbesta xwe li gor awa, şêwe û awaza wan ristibû.

El-Barodî helbesteke wan pêşiyên vidibjart, û helbesta xwe li gor şêwe, kêş, awaz û rêzbenda wê helbestê dirist, û tê de bi awayê ne yekser ew helbesta pêşî nîşan dikir. Rexnegir û dîroknivîsên wêjeya erebî ew helbestên El-Barodî bi (Muarede / معارضة) nav kirin.

Wateya ferhengî ya vê peyva erebî, bi zimanê kurdî, (rikberî) ye, pêre jî weha xuya dibe, ku helbesta El-Barodî wek dijbera helbestên wan pêşiyên e, lê mebesta wan berevajî vê wateya ferhengî ye. Mebest ew e, ku helbesta El-Barodî ji her warên xwe ve, çî avakirin, û çî şêwe, kêş, awaz, û rêzbend li gor ya wan pêşiyên e.

Abdulkadir Bingol, helbestvan û nivîsevanê Bakurê Kurdistanê vî awayê helbestê bi (Nerzîre / نظيرة) nav dike, û weha diçe, ku ev peyv „ji zimanê erebî têt. Wateya wê ya ferhengî hinkûf, deng, wekok e. Di îstîlahê de, dema helbestvanek helbesteka helbestvanekî di ko jê hez dike deyne li ber xwe û bi heman awa, beşavend, pîvan û redîfê helbesteka di çêbike, ji bo wê helbestê „Nezîre“ tê gotin“, û weha diçe ku ev awayê helbestê ji farîsî derbasî wêjeyên dî bûye.

Mebesta rexnegirên wêjeya erebî, wek ku me li jor dabû xuyakirin, û boçûna Abdulkadir Bingol û ya me li hevdu dibanin; ango boçûnên me hersiyên yek e, lê behaneya, ku Abdulkadir Bingol pê vî cûreyê helbestê şirove dike, nikare şûna xwe di qada rexneyê de bistîne, ji ber ku eger hezkirina helbestvanekî ji yê din sedema vê yekê be, ma çima

ev helbestvanê duwem hemî helbestên yê jê hezdike ji bo helbestên xwe neke nimûne û mînaka bilind? Her weha navê, ku rexnegirên wêjeya erebî li vê helbestê kirine jî bi hewceyî şirovekirinê ye; ango bê şirovekirin mirov di mebesta wan nagihîne.

Ji ber ku peyva „nezîre“ erebî ye, nizanim Farisan çî nav li vî cûreyê helbestê kirine, lê li ba me, bi baweriya min, ya rast ew e, ku em têrmekî (musteleh) din bipelînin, û zimanê xwe ji dîndariya zimanên din derxînin.

Mebesta helbestvanê vî cûreyê helbestê ne ew e, ku şiyânên xwe di tanga huneriya avakirina helbestê re bide xuyakirin, her weha mebest ne ew e jî, wek rêzdar Abdulkadir Bingol diçe, ku *helbesvanek ji helbesvanekî di hez dike*, vê lomê helbesta xwe li gor ya wî dirêse. Mebesta vê yekê ew e, ev helbestvan, bi vî karê xwe, dide xuyakirin, ku ew bi helbesta hevnişê xwe qayîl nabe, ji ber ku ji her du warên avakirinê û zimên de helbesteke lawaz e. Bi ser de jî ji hemî helbestvanên hevnişê xwe dixwaze li kelepûr û pêşiyên veşerîn, helbesta xwe mîna ya wan birêsin, da rê li ber lawazbûna wêjeya xwe bigirin.

Eger em boçûna rêzdar Abdulkadir Bingol bipejirînin, û bi wê nerînê vî cûreyê helbestê vekolin, em dê gunehkariya mezin li helbestvanên vî awayê helbestê bikin, ji ber ku dê were xuyakirin, ku ewana tiştêk bi ser bermayên pêşiyên de nekirin, û her tim di bin paşila wan de mane.

Bi vî awayê peyva (Nezîre) jî nikare barê vê helbestê hilgire, ji ber ku ev peyv dide xuyakirin, ku her du helbest; ya pêşiyên û ya din ji her warî de wek hev in, lê rastî tiştêkî dine; rastî ew e, ku heye (belkî) ev helbesta nû ji ya kevin xurtir be, û heye jî nikaribe hilkişe asta huneriya helbesta kevin. Vê lomê ez vî cûreyê helbestê bi (helbesta hevber) dinavînim, ji ber ku gava mirov xwe dide hember yekekî din, mebesta wî ew e, ku xwe wek yê din, an jî xwe ji wî çêtir an xurtir bike. Her weha gava du tiştan dide ber hev, wê hîngê dixwaze warên hevbeş û yê ji hev cuda yê wan her du tiştan ji hev du veqetîne.

Heye ev boçûna min cihê xwe di meydana rexnegiriya kurdî de bigire, û heye jî negire, lê di vî warî de heya îro ji (nezîre)ya rêzdar Abdulkadir Bingol derbas be, min di dîrok û rexnegiriya wêjeyî kurdî de tiştêk nedîtî, ev nav jî, wek ku min li jor diyar kir, ku ji hêla zimanewanî de ne peyveke kurdî ye, û ji hêla tîrmînolojî de jî nikare mebesta vî cûreyê helbestê hilgire. Vê lomê ez dê li gor vî tîrmî; ango **helbesta hevber**, helbesta Cegerxwîn vekolin. Bila ev yeka jî para xelesa, ku wê bê be.

-3-

Nimûneyên Helbesta hevber ya Cegerxwîn

1. Dil ji min bir:

Du helbestên Cegerxwîn di nav destên me de ne, dikarim herduwan li gor tîrmê **helbesta hevber** vekolin, hêmanên hevbeş di navbera wan û yê pêşiyên de bipelînim, ka ew û vî tîrmî li hevdu dibanin, yan na. Lê berî pêşî dixawzim balê bikîşînim ser wê yekê, ku Cegerxwîn helbestek di dîwana xwe ya yekem de heye, sernûsa wê (Şox û şengê) ye(2), wek sernûsa helbesta Melayê Cezerî ye, û mijara wê jî evîn e, lê ji vê pê ve, ji hemî waran de ji ya Mela cuda ye. Vê lomê em dê wê ji vê babeta xwe veqetînin.

Helbesta Melayê Cezerî (Şox û şengê)(3) û ya Cegerxwîn (Dil ji min bir) (4). Her kesê, ku wan herduwan

herduwan bixûne, dê bibîne, ku her du helbestvan **dilber û bandora evîna wê** dane ber xwe. Lê heya wê bandorê (akam) biderbirînin, pesnê (west) hin beşên gewdên dilberên xwe didin.

Bejna wê, li ba Mela serwe, û tox e, û li ba Cegerxwîn jî serwe û şaxê nû şivîn e. **Gerdenê** wê, li nik her duwan şemal e. **Dême** wê, li ba Mela, dur e, nedîr e, heyv e, û roj e, û li ba Cegerxwîn jî roj e, ji şana hingivîn e, sipî ye, dur e, û ji rengê tavê ye. **Ebrîwên** wê, li cem Mela, nûn in (tîpa nûn a erebî), Qews in (kevan), û hilal in (heyva yekrojî), û li cem Cegerxwîn jî nûn in, xar in, zirav in, heyv in, û das in. **Biskên** wê, li ba Mela dal in (tîpa dal a erebî), sema nin, herîr in, tab in, û wek goyê nin (gog), û li ba Cegerxwîn jî dal in, li dor dême çember in, li ser dême belav in, û şêreng in. Dilbera Mela **xemrîpor** e, û ya Cegerxwîn **reşpor** e. ya Mele **awirpiling** e, û ya Cegerxwîn **awirşûr** û şêr e, ya her duwan **peyvşêrîn** e, û ya Cegerxwîn **newqzirav** û **lêvşêrîn** e jî.

Dilbera Mela, bi gelemperî, şox e, şeng e, nazik e, şêrîn e, xeram e, ciwan e, şêr e, eywan meqam e, û serfiraz e. Ya Cegerxwîn jî şox e, şeng e, nazik e, şêrîn e, ciwan e, gewr e, kaniya ava heyatê ye, û borcewaz e.

Ev in, rengdêrên her du yaran, li nik her du helbestvanan; ew bi xwe jî nîşanên **evîneke pêjindar** e (hissî), ku bêpariya (hirman) evîndaran diyar dike.

Evîn, wek ku ezmûneke (tecrûbe) mirovane ye, bê hebûn û hevevîna her du aliyên wê (jin û mêr) naçe serî, û gava her du helbestvanên me, di evînê de, bê par xuya dibin, bê guman em dikarin bibêjin, tevî ku her yekî ji wan dilberek heye jî, lê ezmûna wan ji ber kêmasiyê dinale, ji ber ku ev rengdêrên pêjindar (hissî) tîbûneke evînî diyar dikin, û nebûna hevevîne teqez dikin. Lewre em bawer in, ku ewana û yarên xwe negîhane hevdu. Ji ber vê yekê em dibêjin, ku ezmûna wan, ya evînî, neçûye serî, û ewana bê par mane, çimkê evîn tîkiliyeke, ku di bingeha xwe ya biyolojîk de, li ser xwaziyê peyatî (cinsî) vedine, û pêk tê, tîrkirina wê xwaziyê ji bo dûzana kesayetiye ji warê derûnî de pêwîst e.

Lê gava evîndarên şeyda (muteyyem), ji ber hin sedemên civakî, û ayînî, nikarin wê xwaziyê, bi awayê biyolojîk, tîr bikin, ewana di navbera pesna beşên gewdên yaran re, wek dême, çav, lêv, gerden, û sîngan, wê xwaziyê tîr dikin, û kesayetiya xwe bi dûzan û lihevhatî diparêzin. Lê ev tîrkirina manewî, ku dûzana kesayetiye diparêze, derbirîna hunerî ku asta wê bilind e, jê re divê. Ma gelo derbirîna her du helbestvanên me gîhabû vî astayê bilind, an na?!

Helbesta Mela kilasîk e, ji 30î malikên, ku li pêlewaza remel a(urûda erebî) siwar bûne, pêkhatiye. Pêlikên wê jî ev in (فاعلاتن فاعلاتن - faîlatun, faîlatun, faîlatun), di her birekî malikê de sê caran dubare dibe, ango bi tevayî şeş caran di her malikekê de dubare dibe, lê helbestvan dikare ji dêvla şeş caran, çar caran dubare bike. Mela jî weha çûye, û ya çarê jî di birê duwem de bi kurtahî haniye, û (فاعِلُنْ) hêştîye. Ev yeka ne şermeke hunerî ye, lê lerzîna hêrsê helbestvan, di vê penavê de, dide xuyakirin, û bêtebatîya, ku ji dest germa evînê tê de dijî, eşkere dike. Lê bêtebatîyeke nerm e, ti caran derbas astayê xewrevînê nabe, ji ber ku wêneyên helbestî li nik wî bi dûzan û lihevhatî in, û tebatî wî teqez dikin:

Şox û şengê, zuhre rengê.

Dil ji min bir, dil ji min



*Wê şepalê, miskî xalê,
dêm durê, gerden şemalê,
cebheta biskan sema lê.
Dil ji min bir, dil ji min.*

Bi rastî jî, derûna mirov ji komek hestan peyda dibe, û qeşengî û ciwanî jî wan hestan dikşêne û dilerizîne. Lewre em li hember lerizîna ku, wê keçika şepal, dilrevîn û bisksema berdaye hestên Mela, bi carekê mat nabin, çimkê tiştê, ku dilan dihejîne, hêjaye, ku ciwan be. Bi vî awayî girêdanên, ku di navbera destpêkan û encaman de hene, zelal û rava li ba Mela xuya dibin.

Çarînen helbesta Mela, tev bi vî awayî rêz dibin, û serkeftina wî di penava şeweyê kilasîk de berçav dikin. Di afirînen hunerî de, divê durvên wan berdestiya naverokan bikin, eger ne wusa bin, ew afirînan birîndar dibin, û bandora wan li xwendevanan sivik dibe, ji ber ku hîngê nerastiya hunerî, ya hunermend, berz xuya dibe. Lewre gava helbesta Mela bi kêş, rêzband, wêne, û peyvên xwe ve lihevhatî û bi dûzan tê, rastiya hestên wî yê evîni, tevî ku belkî yarê lê ne guhdar bû jî, berbiçav û teqez dike.

Cegerxwîn jî ev babet daye ber xwe, lê şewe û ramanên Mela tev li nik wî diyar in. Reh (kok) û damarên wateyên wî ji yê Mela dipişkivin. Xwendevan dikarin li her du helbestan vegezin, da bi xwe bibînin. Tenê em dixwazin li nik hin rengdêrên, ku Cegerxwîn xwastibû wan biguhêre, rawestî, da bibînin ka helbesta wî hevber e, an lase ye (teqlîd).

Dilbera Mela **dêm nedîr e**, ango bi ronahî ye. Cegerxwîn ev wate birî û gotiye “ **Dêmen ji rengê tavê** “. tenê peyv guhertine û wate jî wek ya Mela hêştiye, ji ber ku her du peyvên **nedîr û rengê tavê** wateyekê didin. Dîsan gotiye “ **Dêm ji şana hingivînê** “. Ev wêne ji her du aliyên wateyê û zimên ve ne lihev e, ji ber ku ciwaniya hingiv çêjtî ye (zewqî) û ya dêm çavkî ye (nerîni, dîtîni). Ango rewşeke hevbeş di navbera her du aliyên wekhevîyê (teşbîh) de nîne. Ev yeka rewanbêjiya vê wekhevîyê lawaz dike. Ji warê zimên de jî, ya rast ew bû, ku bigota (Dêm ji şana hingiv e) an (Dêm şana hingivîn e) an jî (Dêm şana hingivînê). Ji ber ku (ê) di hevoka Cegerxwîn ne kirar e, belê wê (ê) yê rengdêra dilberê xistiye şûna navê wê, û bang wê dike, (wek çawa mirov dibêje: Bejinbilindê, û mebesta wî :” lêê bejinbilindê” ye), pêre jî divyabû, ku hevoka Cegerxwîn bê daçek (ji) ba, û bigota: (Dêm şana hingivînê), ne (Dên ji şana hingivînê).

Em bawer in, ku kêşê û rêzbandê (qafiye) Cegerxwîn neçareyî vê çewtiyê kirine, lewre ev wêne li ba wî qels û sist bûye, ji ber vê yekê jî ev wêne negîhaye rewaniya, ku bi perê Mela saz bûye.

Ebriwên dilberên her du helbestvanan **heyv** û **kevan** in, ango xwar û zirav in, lê yê ya Cegerxwîn wek (**das**) e ne jî “ **Ebriwên wek heyv û dasê** “. Hebûna (Das)ê di vê hevokê de nazikiya vî wêneyê hunerî birîni dike, ji ber ku xweristiya wê ya hesinî sitemeke dijwar li ebriwan dibarîne, û Cegerxwîn der heqê wê keçika (ciwan û newq zirav) de tawanbar dike.

Biskên wan dilberan mîna tîpa (**dal**) in, ango lihevgerî in. Li ba Mela heya dawîya helbestê lihevgerî dimînin, lê biskên yara Cegerxwîn wusa namînin; hin caran (**dal**) in, û “ bûne **çember bisk** li dor “ dêm, û hin caran jî “ **bisk** li ser dêm **bela** “ nin.

Tiştê aşkere ew e, ku biskên wek (**dal** û **çember**) lihevgerî in, lê yê (**bela**) bi ber jêr de dadigerî û

diherikin, ango yê lihevgerî û yê belabûne ne wek hevdu ne. Bi ser de jî Cegerxwîn me li hember rengê wan biskan mat dihêle, gava dibêje: “ **Şê gulî berdani bi mestî** “, û di dû re jî yekser dibêje: “ **Por şevê, rû rengê tavê** “. Em nizanin çawa biskên **şê** (çil/ber bi zer) û porê **reş** dê li ser yek serî bêne xuyakirin?! Lê tevî vê jî, ev wêneyê hunerî, ku şevê (tariyê) û tavê (ronahiyê) li gel hevdu girêdide, hem lertzîneke ciwan berdide dil û hestên xwendevanan, û hem jî berztirîng rengdêrên wêneyê nûjen; ango matmayî û havîbûnê, diyar dike, û hemdemiya Cegerxwîn dide xuyakirin.

Cegerxwîn, di pehnava rengan de, careke dîtir dikeve vê çewtiyê, ji ber ku hin caran yara xwe **sipî** bêşkêş dike “ **Dêm sipî, xal gewr û sorê** “, “ **Rengê berfê sîng û zendê** “, û hin caran wê bi rengê **gewr** li me dimîne “ **Borcewazê, gewr û nazê** “.

Tevî ku em dizanin her du rengên (sipî û gewr) ji hevdu ve nêzîk in, lê ji hevdu cudan in jî, bi carekê çênabe, ku tiştê bi her duwan bête pesinandin. Weha mirov pê hay dibe, ku Cegerxwîn pesna du jinan, an du keçan dide.

Cegerxwîn, di vê helbestê de, pirçar xwe bi ser Mela de pal dide, û wateyên wî bi kar tîne û dubare dike. Gava pesna gotûbêja yara xwe dide, dibêje: „ **Peyve qendê** „, Lê Mela berê gotibû „ **Şêrîn kelamê** „, û gava qala pergala wê ya civakî dike, dibêje: „ **Ketme tora borcewazê** „, û „ **Ez birim birca serayê** „, lê ev wate jî ji ba Mela biriyê, çimkê Mela berê gotibû: „ **Totiya eywan meqamê** „.

Ev têbînên, ku me li jor diyar kirine, didine xuyakirin, ku Cegerxwîn di bin bandora Mela de milxwar e, û di gelek wêne û wateyên xwe de deyndarê wî ye, bi ser de jî hin caran wate, wêne û zîmbolên hunerî yê Mela di destên wî de lerizîne. Gelo çî yê nehênî di paş vê yekê de heye?!

Gava em bibêjin, ku raman zimanekî bê deng e, û ziman jî ramaneke bi deng e, em hîngê ti tiştê nehênî aşkere nakin, ji ber ku civaknasan ji zû de tiliyên xwe dane ser vê rastiya, ku lihevhatina ramanê û zimên pêwîst û diva dibîne. Lewre gava raman di hişan de ne sayî û ne zelal be, an di bin mij û dûmên de mexelî be, hîngê ziman û şeweyê, ku wê ramanê diderbirîne, lerezandî û bê dûzan tî. Ji ber vê jî em dikarin bibêjin, ku wêneyê dilberê di hişê Cegerxwîn de ne numa ye, çimkê hin caran pesna wê bi rengdêrên, ku berevajî hev in, dide, wek (**sipî**, **gewr**, **porşev**, **şêgulî**). Ev yeka dide xuyakirin, ku ne evîni û derbirîna ciwanî, belê bîranîna şeweyê avakirina helbestê û reseniya zimên xem û qisaweta Cegerxwîn bû.

Belê... Me gotibû, ku Mela jî ji hevevîyê bê par e, lê bê guman wî dilberê daye ber xwe, û jê hez dike, û kela evîni û ya bêpariyê di vê helbestê de dirêje. Gîhaye dilberê yan na, ev nabe mijara pirsê. Lihevhatina naverok û durvê helbestê û awayê derbirîne nîşanên vê baweriya me ne. Lê mixabin ne tenê wêne û zîmbolên hunerî li ba Cegerxwîn cih negirtine, belê peyv û wateyên wî jî pirçar bê hevgirêdan hatine. Li vê çarîna jêrî binêr, û bide ber a ku di dû re tê:

Ketme tora keyxwedayê.

Min dema awir vedayê.

Dane dil lertzîni û tayê.

Dil ji min bir, ahî dil.

Wate û peyvên vê çarîne mîna cûbareke biharê, hêdî û nerm li gel hevdu diherikin, xêza dawî bersiva her sêyên berê ye, û encameke xweristî ye, ku ji wan zayî ye. Lê gava em li vê çarîna ku yekser di dû ya jorî re tê, binerin, bê guman em hinekan ji hevokên

wê bê hevgirêdan û bê hevtêkilî dibînin:

Lê dema dilber vewesta.

Mesrefa qehwê di desta.

Sed xwezî min jê bixwasta.

Dil ji min bir, ahî dil.

Xêza dawî ji bo ya yekem ancameke xweristî ye, lê her duwên dîtir bê hevgirêdan, ne li gel hevdu, û ne jî li gel yê din, ketine wê navberê. Evê kêmasiyê di du – sê çarînen dîtir de jî cih girtiye.

Helbesta Cegerxwîn jî wek ya Mela li kêşa pêlewaza (remel) siwar bûye. Lê hin caran peyvên wê li kêşê nehatine, lewre jî helbestvan ji neçare peyvên welê guhertine, û wate kiriye qurbana kêşê, wek peyva (**xwînvexwar**), ku kirasê kêşê lê teng bûye, hema Cegerxwîn kiriya (**xwînxwar**) û gotiye: “ **xwînxwarê, Teymûrî – Dame ber top û tivingê** “. Li gor wateya hevokê, û di vê pehnavê de, peyva (**xwînvexwar**) rastir e, ji ber ku gava ravakirina zor û sitemê mebesta gotinê be, Kurd dibêjin (**xwînvexwar**) lê nabêjin (**xwînxwar**).

Weha diyar e, ku helbestvanê me gelek caran dibe dîlê kêşê. Ev yeka di rêzbandê de gelekî sayî xuya ye. Cegerxwîn pirçar peyvên li gor dûzana kêşê bi kar tîne, û diguhêre, wek (**hingivînê**), ku me berê nîşan kiribû, û peyva (**dasê**), ku em bawer in, eger ne ji bo dûzankirina rêzbandê ba, wê bi kar nanîba, her weha peyva (**zendê**), di vê xêzê de “ **rengê berfê, sîng û zendê** “ ku divyabû bêyî vê (ê) yê bihata, ji ber ku ew bangê li dîlberê nake, belê mebesta wî ew e, ku sîng û zendên wê wek berfê sipî ne, pêre jî divê (ê) ji dawîya peyva (**zend**) bihata avêtin.

Wek meberê jî gotibû, û dîsan dubare dikin, ku gelek miletên din, di demên rapêrînen rêzanî û çandî û wêjeyî de, berên xwe bi ber pêşiyên de dane, ew û berhemên wan rêzdarên anîn bîriya xwe, û aferînen xwe li gor yê wan pêşiyên afirandin, wek çawa helbestvanên Ereban ew gav avêjtî, û beriyan wan jî helbestvanên Girîkan û Latînan, di çerxa rapêrîna şiyarbûna Ewropa de, bûbûne qublegaha helbestvanên Ewropayê.

Weha diyar e, ku mebesta Cegerxwîn jî ew bû ku, bala rewşenbîr û helbestvanên serdema xwe bi ber awa û şeweyê pêşiyên de bikşêne, da li ziman û wêjeya xwe xwedî derkevin, ji ber ku ziman û wêjeyê yekemîn parêzerên milata ne, dikarin wan ji ber davên piştaftinê biparêzin.

Ev hewildana Cegerxwîn, tevî hebûna hin kêmasiyan, li hember ya Melayê Cezîrî, dide xuyakirin, ku wî nixê helbestvaniya pêşiyên û hukariya kelepurê baş nas kiribû, û karîbû vê riyê li pêş helbestvanên serdema xwe, wek Tîrêj, Keleş û hinên din veke, lê hewildana wî, di vê helbestê de, ji hêla ramanî de, di qunaxa (tomarkirina kelepurê) de dimîne, û negîhaye qunaxa (derbirîna bi kelepurê), û ji hêla şewe û huner û avakirina helbestê de, eger xwe ji derbirînen laseyî (teqlîdî) rizgar kiriba, dê ji bo helbesta hevber ya hemdem, mînaka peyebilind ba.

Şeva hicran:

Helbesta Cegerxwîn ya din, ku mirov dikare wê bi ya hevber binavîne, helbesta (Şeva hicran)e(5). Cegerxwîn vê helbestê dide hember helbesta (Li kurdistanê kêvî ez)(6) ya Şêx Nûredînê Birîfkanî.

Ev helbest berevajî ya (Dil ji min bir) hinekê dûrî laseykirinê (teqlîd) ye. Ş. N. Birîfkanî di helbesta xwe de li gel Xweda dipeyvê, û hinek nerînen xwe yê tesewuffî tê de diyar dike, û eşkere dide xuyakirin, ku baweriya wî, wek pirên sofînziman bi yekîtiya heyîne heye, nemaze gava dibêje:



Bi xwe feyda îlah im ez, bi text û şah kulah im ez.

Ş. N. Birîfkanî helbest xwe li gor awaza pêlewaza (Wafêr) ya urûda erebî dirêse, û rêzbenda (qafîye) wê bi gotina (Ya Reb) girêdide; ev gotin her tim di dawîya birê çarem de dubare dibe, û weha jî heya dawîya helbestê dom dibe.

Awaza pêlewaza Wafêr li ser pêlika مفاعلتن (mifaeletun -/-) têtê ristîn; kîteke dengkurt, kîteke dengdirêj, du kîten dengkurt, û yekeke dengdirêj li pey hevdu rêz dibin, û hin caran ev pêlik bi awayê مفاعلتن (mifaeletun -///) têtê, ku herdu kurtekîten (berg) sêyem û çarem tev lihev dibin, û bi yekeke dengdirêj têne guhertin (/) û di here malîkekê de sê caran dubare dibe, lê pirê caran li ba helbestvanên Erebbî, pêlika sêyem bi awayê kurt têtê ristîn, û dibe فاعولن (feolun -//). kilasîkên Kurd, yên ku helbesta xwe li gor awaza vê pêlewaza urûda erebî ristine, hin caran pêlikeke din bi ser wan sisiyan ve dikin, û her birekî malîkê bi du pêlikan dirêsin. Ş. N. Birîfkanî jî li ser şopa wan çûye, û pêlika (mifaeletun) çar caran di her malîkekê de dubare kirîye.

Her weha, eger em birên helbesta Ş. N. Birîfkanî bi forma çarînan li pey hevdu rêz bikin, em dê bibînin, ku her sê birên pêşî yên her çarînekê rêzbendeke hevpar hene, lê birê çarem yê hemî çarînan rêzbendeke hevpar heye, jî ya sêyem din cida ye, wek nimûne:

Eger mîr im, eger begler

Bi xwe nûrê çî xweş rehber

Li ber çawê tenê dilber

Nîmaye her hew im ya Reb.

Tenê çarîna yekem jî vê sîstemê cida ye, jî ber her du birên yekem û sêyem rêzbendeke hevpar, û yên duwem û çarem yekeke hevpar hene:

Muhammed hate mîracê

Yeqîn ez her ew im ya Reb

Ji sîne şîbhê wehacê

Çî nûra pertew im ya Reb.

Cegerxwîn jî helbesta xwe bi awayê ya Birîfkanî ristiye, helbesta wî jî 16 malikan peyda bûye, her du malikan, wek Birîfkanî, yekser li pey hevdu rêz dibe, û herduwên din hinekê jî wan bi dîr dixîne, ku helbesta wî, wek ya Birîfkanî, mîna çarînan xuya dibe, û peyva dawî ya birê çarem heya dawîya helbestê (Ya Reb) dimîne.

Şeweyê helbesta Birîfkanî, xwe bi ser mecazê de pal dide, û wêneyên hunerî dixebitîne, lê awayê xebitandina wêneyên hunerî li ba Birîfkanî pirê caran bi gavekê bi pêş pirên kilasîkan dikeve.

Delameta wêneyê hunerî li ba kilasîkan ew e, ku wateyê şîrove dibe, lê helbesta hemdem delameta wêneyê hunerî guhertiye; ev wêne, di helbesta hemdem de nema wateyê an jî ramanê şîrove dibe, belê bûye alava derbirînê. Hinek wêneyên Birîfkanî jî ev delamet hilgirtine, û gavekê bi pêş wêneyê kilasîk ketine, wek nimûne:

Şeva tarî ku roj im ez

Ev wêne bûye alava derbirînê, û dide xuyakirin, ku helbestvan di nav heyama nezanîn û cehaltê de dixebite, da riya rast şanî mirov bike. Ciwaniya vî wêneyê hunerî di navbera berhevdana dijberan re xuya dibe; di tariya şevê de bîriqîna tavê derdorê ronî dibe. Her weha Ş. N. Birîfkanî peyvên hêzdar, ku gulma mirov dadigirin, vedibrêje, û peveka (hevok) xwe pê dirêse, wek peyvên (ayîn, soj, pehlew, salar û, h, w).

Ji vê pêve pêjna zargotina (folklor) kurdî jî jî

helbesta Birîfkanî têtê, wek çawa birê dawî (çarem) yê çarînekê, di birê yekem yê çarîna din de dubare dibe. Ev cûresîstem di helbesta gel û ya gelêrî û kulamên kurmançî de pir dubare dibe, helbestvanê gel û dengbêjan her tim di helbest û kulamên xwe de vê yekê bi kar tînin; ev sîstema helbestê û kulamê li hin deverên Kurdistanê bi (serdor) dinavînin. Birîfkanî jî vê yekê di çarînen 4 û 5 û di yên 11 û 12 de dubare dibe. Di yên 4 û 5 de dibêje:

Disojim ez bi narê xwe

Bi nar û qehrê yarê xwe

Rûh û canê neyarê xwe

Biyar û pehlew im ya Reb

Biyar û pehlew im ez

Sipeh salarê wan im ez

Xwedawendê cîhan im ez

Ku seidê qeylew im ya Reb

Cegerxwîn helbesta xwe (Şeva hicran) dide hember ya Birîfkanî, ew jî li gel xweda dipeyve, û her tim li dawîya çarînen xwe bang xweda dibe, jî ber êş û derd û kulên, ku dilberê pêre peyda kirine, hawara xwe dibe xweda û dibêje:

Nema min sebr û aramek

Ji ber jana evîna dil

Evîn behr e, belê tenha

Di ber pêlan ketim ya Reb.

Tevî ku herdu helbestvan bang xweda dikin, û pêre dipeyvin, lê mijara herduwan jî hevdu cuda ye, Birîfkanî nerînen xwe yên tesewufî diderbirîne, lê Cegerxwîn êş û azarên, ku dilberê lê peyda kirine diderbirîne. Cudabûna naverokê çî kêmasiyê nagihîne helbesta hevber, jî ber ku merem û mebesta helbestvanê duwem, (ku li vir Cegerxwîn e) ne naverok e, belê awa û şeweyê avakirina helbestê ye. Vê lomê emê vî awayî li ba Cegerxwîn bipelînin.

Helbesta Cegerxwîn, ku jî 8 çarînan peyda dibe, li gor awaz û pêlewaza ya Birîfkanî; ango li gor pêlewaza Wafêr, hatiye ristîn, lê wî jî wek Birîfkanî herdu kurtekîten sêyem û çarem tev li hev kirine, û bi yekeke dengdirêj guhertine, ango jî dêvla (mifaeletun -/ - -/) (mifaeletun -///) xebitandîye. Xuya ye forma (mifaeletun) li awaza û fonîtîka zimanê kurdî nabane, jî ber ku hemî helbestên kurdî, ku li gor awaza vê pêlewazê hatine ristîn, (mifaeletun) xebitandine, û Cegerxwîn li pey vê şopê çûye.

Cegerxwîn rêzbenda birê çarem ya çarînen vê helbestê jî ya Birîfkanî wergirtiye, û ew jî banga (ya Reb) dixebitîne, û ev rêzben di her du birên 2 û 4 yên çarîna pêşîn (yekem) de hatine xebitandin, wek ku Ş. N. Birîfkanî jî wusa kiribû, û jî bo her sê birên pêşîn yên çarînen 2, 3, û 4 re rêzbenê cuda veqetandine, çarîna pêşîn weha ye:

Di tarîka şeva hicran

Çiraxek sîfet im ya Reb

Ji ser heta piyan ar e

Bi carek vêkeim ya Reb.

Û çarîna duwem jî wisa ye:

Nema min sebr û aramek

Ji ber jana evîna dil

Evîn behr e, belê tenha

Di ber pêlan ketim ya Reb

Û jî her sê birên pêşîn yên çarînen 5, 6, û 7ê re rêzbendeke hevpar vebjartîye, wek nimûne, çarîna pêncem wisa ye:

Şev û rojan bi kovan im

Bi bilbil re dilovan im

Hevalê xuncê baxan im

Ji gul ez dîr ketim ya Reb.

Lê rêzbenda van her sê biran di her çarînekê de têtê guhertin; ya sê birên çarîna 5ê li jor diyar e, ku (an im) e, lê ya sê birên çarîna 6ê (lim ez) û ya yên çarîna 7ê (rî me) ye, lê ya yên çarîna 8ê dîsan têtê guhertin, û di her birekî de jî cuda ye, (kurd im, Kerd im, çerd im), wisa jî diyar e, ku awaza hemî rêzbandan, jî pêş heya dawîya çarînan her tim bi du kîten dengdirêj kuta dibe.

Cegerxwîn hin caran kurtekîtan dengdirêj dibe, û dengdirêjan jî dengkurt dibe. Wek nimûne; gava dibêje (Nema min sebr û aramek) û gava dibêje (Evîn behr e, belê tenha di ber pêlan ketim ya Reb), kîta (û), ku di bîngeha xwe de dengdirêj e, lê Cegerxwîn wê kurt dibe, û kîta (e), ku di bîngeha xwe de dengkurt e, Cegerxwîn wê dengdirêj dik e.

Birîfkanî jî weha kiribû, ewî di çarîna çarem de gotibû:

Disojim ez bi narê xwe

Bi nar û qehrê yarê xwe

Rûh û canê neyarê xwe

Biyar û pehlew im ya Reb.

Eger tu bala xwe bidîyê, ewî her du kîten (ê , û), ku di bîngehên xwe de dengdirêj in, kurt kirine. Ev yeka ne kêmasiyê zimanewanî ye, û ne jî şermeke hunerî ye, belê awaza helbestê li gor lezbûn û hêdîbûn, sertî û nermiya hestên helbestvan têtê ristîn, û pêre jî kîten dengdirêj û yên dengkurt bi hevû têne guhertin.

Şahê awaza helbesta erebî; El-Xelîl Bin Ehmed El-Ferahîdî, jî zû de bala xwe dabû vê yekê, û weha çûbû, ku awayê nivîsîna helbestê jî awayê awaza wê cuda ye, lê ev cudabûn di awayê nivîsînê de xuya nabe, bilê di awayê awazê de xuya dibe, jî ber ku helbest li gor mercên rastnivîsînê û giramatîka zimên têtê nivisandin, lê li gor dengê têtê xwendin.

Ji warê peyvên de jî, peyvên çarînen Cegerxwîn li wateya wan dibanin, vê lomê nazik in, hestên melûl û şîndar diyar dikin, wek (aram, dilber, can, dil, bilbil, kovan, bax, nalîn û. h. w). Çima na? Ma em nabînin, helbestvan çiqas jî ber kul û derdên evîne dinal e, nemaze gava dibêje:

Meger ez Ristemê kurd im

Fîraqê ez nexweş kerdim

Cegerxwîn im siyahçerd im

Di kunca xelwet im ya Reb.

Tevî ku xwe wek Ristemê, ku di cengan de navdar bû, hêzdar û leheng bû, dide xuyakirin, lê jî ber êş û kulên evîne jar û melûl ketiye, û ceger bi xwîn bûye. Pêre jî hevoka Cegerxwîn nerm û hêdî diherike, û dîsan rewşa azariyê werdigerîne, lê jî mecazê jî ne bê par e, wek (ji ser heta piyan ar e, zirav im, wek hîlal im, Şikesî wek rengê dal im), ango lawaz û jar û piştixar im.

Cegerxwîn dide xuyakirin, ku hemî zaravên zimanê kurdî mal û milkên her Kurdekî ne, vê lomê bê dudilî, peyvên zarava kurmançiya başûr (Sorani), wek peyva (kerdim) jî dêvla peyva kurmançiya bakur Rûpel (23)



Can Kurd

Tîravêia



Pêşdatirîn pêdiviyên

tevgera me çi ne?

Dibêjin ku hezretî Isa bi şagirdên xwe re, ber bi bajêrê Qudsê an Bêtlehim ve diçû. Di rê de şagird birçî bûn. Hezretî Isa tiştêkî wilo gote wan: "Bila her yek ji we rahêje kevirekî." Ji Pêtrus pê ve, ku kevirekî piçûk ji ber xwe rakir, hemiyar kevirin mezin rakirin. Hezretî Isa bo wan keviran got: "Bibin nan." Ewana di cîh de bûn nan û her kesekî ji nanê xwe têr xwar, tenha Pêtrus birçî ma. Li Rêya vegeerê dîsa wilo bû, Pêtrus kevirekî ji yê gişan mestir û girantir rakir. Hezretî Isa gotineke wilo kir: "Ez ê li ser kevirê Pêtrus dêra pêşîn avabikim." Pêtrus gote hezretî Isa: "Heyran, tu niha kevirê min bike nan, da ez têr nan bixum, bila dêr niha bimîne."

Ya rast ewe, ku gelê me niha ji tevgera xwe ya siyasî avakirina dewleteke kurdî nexwestiye û naxwaze, ew tenha dixwaze, di Rojavayê Kurdistanê de, îro neye qirkirin, di aştiyê de bijî, mafên xwe yê çarenivîsê bistîne û hebûna wî ji aliyê xelkê Sûrî ve bite pejiwandin. Avakirina dewleta kurdî, berî li ser milên vê tevgerê be, dikeve ser milên parçeyên mestirên tevgera kurdistanî, ku xudan hêzin, û gelek pareyên wan hene û gelê li pey wan jî pir û pir e. bê guman histobariya wê jî di vê yekê de heye.

Tevgera me pêwîst e, berî her tiştêkî "nan" ji gelê xwe re bistîne, wekî hezretî Isa jî kiriye, ku berî her tiştêkî nan ji şagirdên xwe re pêda kir. Pêtrus jî bo cenabê wî got: "Di serî de, kevirê min bike nan!" Di vir de, nan nişana pêdiviyên girîngtir e ji jiyana komika bawermendan re.

Divê tevgera me, di serî de, jiyana endamên xwe biparize, da ewana kanibin jiyana gelê xwe biparizin, pişt re jî mafên wî bistînin.

Hinek pêdiviyên girîng ên tevgera me hene, gava ew çareyekê ji wan re nebîne, wê jartir û tabelavtir bibe. Ji wan jî evana:

- Te roja îro rêberekî pêşeng ji tevgera kurdî ya sûrî re tune ye, serokên partiyên gelek in, hema kesek ji wan hîn ne bûye serokê gel. Hêja Öcalan jî ne serokê gelê me ye, li Rojava Kurdistanê, ji ber ku ew ji bakur e, û niha her parçeyekî Kurdistanê bi derd û kulên xwe ve gêro û mijûl bûye, bi ser ve jî, pêwîst e serok ne girtî be û kanibe bo kar û barê bi azadî bilive. Pişt re "Serok" bi darê zorê ji aliyê partiyekî ve, li ser eniya neteweyekê naye şeqlekirin. Diyare ta niha hinek dixwazin serokê xwe li ser gelê me bi zorê bidin pejiwandin.

- Pêdiviya tevgerê bi şewirdariyeke ji zanayan, diplomatan, siyasatmendên û gelnasan heye, ku li dora wî serokî bin, nehêlin ku ew her roj di şaşiyekê keve û kanibin şîretên baş ji wî re bidin û li ber wî zanî û kanînen xwe bi camêrî bikin berdest.

- Divê ji tevgerê re jêdereke diravî ya herdemî hebe, û ji gelê me têxe xwestin, bi taybet Kurdên li derveyê welêt, ku di dema niha de, piştvanîya tevgera xwe bi terzekî diravî bikin, hema ev piştvanî bê bingeheke rast û dirist dibe talankirina gel û dibe egera pevçûnên siyasî yê nebaş di nêv gel û nêv partiyên de.

- Bê hebûna hêzeke çekdar, ku jiyana siyasatmendên Kurd biparize, siyasatmend nikanin di rewşeke wekî ya niha de li Sûriyê bilivin û nêçîrvan bê dehan "sîlah" naçin nêçîrê. Lê hebûna hêzeke çekdar di bin destê partiyekê de, ne çareya rast e. Ev karê girîng divê bi hevparî, hevkarî û hevpejiwandin biçê serî.

- Tevgera Kurdî ta niha ji aliyê part û rêxirawên sûrî ve, bi şeweyekî fermî, wekî siyaseteke naskirî, ne hatiye pejiwandin. Di van du salên dawî de, delîve û bergeh hate vekirin bo vê pejiwandinê, hema tevgera me her dudilî ma, baş tev li karê hembervaniya sûrî nebû, xwe ji serhildêr û şorişvanan ve nêzîktir nekir, û ev bergeha zêrîn ji dest da. Divê tevger niha bigihe biryarekê û baş bide diyarkirin, ka ew li gel kê ye, di vê qeyrana sûrî ya mezin de, bi sîstema malbata Esed re ye an bi serhildana gelê sûrî re ye. Ji ber ku ta niha hinek basikên tevgera me hîn di cîh de mane û nameyin ne zelal didin derdora xwe.

Hoşeng Broka
hoshengbroka@hotmail.com

KURT û KURMANCÎ



Gelo Islam bi Kurdî nabe,
yan Kurdiyati di Islamê de nabe?

Tê zanîn, ku dîne Islamê, ji destpêka xwe de, wekî dînekî xurû bi „Erebî“ û ji bo Ereban, bi bîr û baweriyên wan, û di cih û dema wan de, rû daye.

Jixwe ev yek (Islama xurû bi Erebi), hem li gorî Qur'anê hem jî li gorî çavkaniyên din yê Islamê (bi taybetî Hedîs û Sunne), ne tiştêkî anormal û xerîb e.

Islam ne bi Tirkan re, û ne jî bi pankartên mizgeftên Stenbolê re, yekemîn car çûye „nasyonalîzekirinê“, belê ew bi Ereben Islama herî destpêkê re, dema ku Xwedê pesnê Qur'ana xwe bi wan da, û ew wek „çaktirîn miletên dinyayê“ li qelem dan (110) (كنتم خير أمة أخرجت للناس: آل عمران، 110); ji wê Qur'ana xurû bi Erebi ve, Islam nijad û nijad, bi Erebi û di Erebitiyê de, tê perestîn û dîrokkirinê.

Xwedê di Qur'ana xwe de, ne carekê û ne dehan, eşkere pesnê zimanê Erebi, wek zimanê „rastiyê“, „baweriyê“, „tekûziyê“, û „heqiyê“, li qelem dide.

Wişeya „Ereb/ Erebi“, 21 caran di Qur'anê de, derbas dibe: Ji wan 10 caran wek wişeya „Ereb“, ku qewmê Qur'anê ne; û 6 caran wek „Erebî“, ku şên û taybetmendîya Qur'anê ye (Qur'aneke Erebî: 12:2; 20:113; 39:28; 41:3; 42:7; 43:3); û 3 caran wek „Erebî“, ku zimanê Qur'anê ye (16:3; 26:195; 46:2), û carekê jî, wek „Erebî“, ku hukûm û biryara Qur'anê ye (13:89).

Erebî, li gorî xîtaba Qur'anê, ne zimanekî normal e, belê ew zimanekî serasayî û sermirovane ye. Ew li gorî xîtaba Xwedê Allah, ku wek „çaktirîn ziman bo xwe û asmanên xwe hilbijartîye, „zimanekî bilind û pîroz e“.

Ne tenê wisa belê Xwedê di Qur'ana xwe de, zimanan eşkere li ser du beşan/ cebeban parve dike: zimanê Erebi, ku li gorî Xwedê, zimanê bawermendiyê ye, û „zimanên ahcemî“ (hemî zimanên li derveyê Erebi), ku „zimanên dînsiz û kafîstaniyê“ ne

(ولقد نعلم أنهم يقولون إنما يعلمه بشر لسان الذي يلحدون إليه أعجمي وهذا لسان عربي مبين: النحل، 103).

Pêxemberê Islamê jî, hestên xwe yê bi Erebi, qet venaşere. Wî di dîroka hedîsên xwe yê „pîroz“ de, hertim hewl daye, ku „pîroziya Erebitiyê“ (îdeolojiya neteweyî) di „pîroziya Islamê“ (îdeolojiya dînî) de, bixwîne û bide xwendinê.

Ew di hedîseke xwe de, weha eşkere pesnê Erebitiyê di Islamê de dide: „Ji ber van hersê tiştan, ji Ereban hez bikin: ji ber ku ez Erebi im, Quran bi Erebi ye, û zimanê buheştê jî bi Erebi ye“

(أحبوا العرب ثلاث : لأني عربي ، والقرآن عربي ، ولسان أهل الجنة عربي/ أخرجه السيوطي في "اللآلئ" ج2، ص422 & الحاكم في "المستدرک"، ج4، ص97).

Herweha di hedîseke din de, dîsa pêxemberê bi Erebi, di pesindana „dîne tenha“ de, weha pesnê „Erebitiya tenha“ dide: „Xelkno: Xwedê yek Xwedê ye, bav yek bav e, dîn yek dîn e, Erebi jî ji bo we ne bav e ne jî dê ye; belê ew ziman e, kî bi Erebi biaxife, ew Erebi e“

أيها الناس: إن الرب رب واحد ، والأب أب واحد ، والدين دين واحد ، وإن العربية ليست لأحدكم بأب ولا أم ، وإنما هي لسان ، فمن تكلم العربية فهو عربي: رواه ابن عساكر عن أبي سلمة بن عبد الرحمن (مرسلاً).

Ligel ku hindêk zanyarên Islamê vê hedîsê wek

„hedîseke zehîf/lawaz“ li qelem didin (Muhemed Nasir El-Dîn El-Elbanî/1914-1999 z), lê hindêkê din jî heman hedîsê, wek hedîseke „wate-nêzîk, beraqil û ji hindêk aliyan ve, durist, şirove dikin (Ibin Teymiyah/1263-1328 z).

Di şerrê „Zîqarê“ de jî (609 z), ku berî dora 1400 salî, di navbera Erebi û Eceman (Farisan) de, rû dabû, pêxemberê Islamê kêfxweşiya xwe ya xurû bi Erebi, bi serkeftina Ereben xwe, eşkere fîne ziman, û wê rojê di hedîseke xwe de, wek „yekemîn roja serkeftina bi Erebi“, li qelem dide: „ev yekemîn roj e, ku Erebi bi min li dijî eceman çûn serkeftinê“

(هذا أول يوم انتصف فيه العرب من العجم، وبني نصرُوا)

Nasyonalîstên Erebi jî, ji bo ku têtên xwe yê „Erebperest“, bihtir bidin çespendin û qebûlkirinê, û daku xîtaba xwe, ya nasyonalîst, li erdê piştrasttir û teqeztir bikin, ew pîrccaran xwe davêjin tor û bextê vê „xîtaba asmanan“ (xîtaba Xwedê/ Allah) û belgeyên wê yê „xwedawenadane“ wek bingeha xîtaba xwe ya „bê şik û guman“, li qelem didin.

Lewre xîtaba Islamî, heta roja îro (paş 1434 salên bi Erebi), wek yek ji bingeha û çavkaniyên herî sereke û „xwedawendane“, yê xîtaba nasyonalîzma Erebi, tê qebûlkirinê.

Dibe ji hindêkan re xerîb be, ku çawa Tirk (wek nimûne) wisa pesnê Tirkiyatîya xwe bi Islama xwe dikin, lê ev yek ji bo min, bi qasî ku dîroka xîlafeta Islamî (632-1924), dibêje, qet ne xerîb e.

Rast e, Islam yek e, lê îdeolojiyên wê pîr in.

Islam yek e, lê misilmanên wê pîr in.

Lewr e, li ser bingeha vê „Islama nakokane“, basa gelek Islaman tê kirinê: Islama Erebi, Islama Farisî, Islama Tirkî, Islama Ewropî... htd.

Wek ku ji binavkirina van Islaman diyar e, Islam ji dînekî bêteref bihtir, „îdeolojiyeke dînî“ ye. Lewma, Islama li Saûdiyê ne wekî Islama Îranê ye, û Islama van herduyan jî, ne wekî Islama indonesya û Tirkiyeyê ne.

Li ser binaxeya vê bawerîya bi „îdeolojiya millî“, „nijadperestî“, hindêk neteweyên misilman (lê çalak), hewl dane (û hîn jî hewl didin), ku Islamê di filtera îdeolojiya navê xwe re, derbas bikin, û muhra neteweyatiya xwe li Qur'ana wê bixin.

Pîrsa ku li vir dikare xwe çengî rûyê vê xwendinê û herweha xwenedevanan bike, ev e: Aya ji bo çi heta aneha „Islameke bi Kurdî“ rû nedaye?

Çima Kurd heta bi vê Islamê (ya rasttir heta bi van Islaman), ji xwe bihtir wekî „yên din“ misilman in; û ji adetên ax û ava Kurdistana xwe jî wêdetir, wekî adetên ax û av, ceyografî û dîrokên „yên din“, misilman in?

Gelo Islam nikare bibe ya Kurdan, yan Kurd bixwe nikarin bi Islamê bibin Kurdên xwe?

Gelo Kurd nikarin di Islamê de bibin dewleta xwe, yan Islam di Kurdiyatiyê de nikare bibe dewleta wan?

Gelo Kurd ji Islamê re nabin dewlet, yan Islam ji wan re nabe dewlet?

Gelo Islam bi Kurdî nabe, yan Kurdiyati di Islamê de nabe?

Ji folklore kurdî

Biratiya Rovî û Şojî

Çîrokên Zarokan Xalis Misewr


Dibêjin: Carekê, rovîk û şojîyek, ji xwe re derketibûn niçîrê, li çolê li hev rast hatin, xêrhatin di hevdan, û li halê hev di van çol û çiyân de pirsîn, û kul û derdên xwe ji hevdûre gotin. Paşî destê bratiyê dane hev, û sînd ji hev re xwarin, û soz û peyman bi hev re girêdan, soza wan jî ew bû, ku bi hevaltî û rast û ruhnî jiyana xwe bi hev re berdewam bikin, û wê ji îro pêve jî, ji hevdû ne qetin û cuda nebin, û bêyî hev dernekevin çol û niçîrê û ji xwêre dizîya tîrîhê van rez û werzên li ser pesar û çiyayên li nêzî xwe bikin . Şojî, ji hevalê xwe rovî pirsî û got : Birakê rovî, ka bêje... lo! çend fenê te hene..? Gelo, raste weke ku min bihîstîye, tu di fen û fûtande mirovekî gelekî zîrek û jîr û jêhatîyî ?. Rovî bi nermayî lê vegerand û got: Belê, sê fenê min hene birakê delal !. (Wiha got, û li şojî zîvirî û jê pirsî): Ka vêca tu ji min re bêje, fenê te çend hene birakê şojî ?.

Şojî lê zîvirî û got: Sih û sê fen min hene, ne kêr û ne zêde. Rovî kenî û got: E...e... ew?, tu çiqasî fenekî birakê şojî ? . Piştra ji hevdûre soz dan, û gotin : yê ji me têkeve tenkasiyê, wê yê din feneke xwe lê xerc bike, û wî ji tengasiya wî derêxe . Herdiwan bi vî hawî razîbûna xwe dan nasîn . Belê! piştî şev kete (erdê)de, herdû birak rabûn derketin dizîya xwe, û li nav darên zevî, û werz û rezan pelindar bûn. tîrîh û mewîjên xweş û şêrîn, bê hawe dixun. Lê berya ku derkevin dizîyê, rovî ji birakê xwe şojîre got: Binêre birakê şojî, ez bi koka xwe, û ji bav û kalan de, ji Axa û mal mezina me. Ji ber wilo jî, îro ez axayê teme, û tu jî kolayê min î, ezê herdem li pêşîya te bim û tê li dûv min bî . Û divê tucaran jî, tu bê emîrya min nekî. Ji ber ku xwediyên rezan, dahfik û xefikan li ber çeteyên weke min û te. Dizên tîrîh û rezan vedidin .

Wekî dinjî, ez ji te bêhtir rêçikên van çol û çiyân, û werz û rezan nasdikim . Ji ber wilo, ezê te biparêzim û tucaran nahêlim, tû di dafik û xefikan werbi, û bera Tû xweş zanibe jî, ku gera li nav rez û werzan ji mere xeternakeke bê hawe mezine. Ji ber vî hawî dîsanê dibêjim, gereke em pir hay ji xwe hebin, ku em nekevin lîsk û vîlikên van xwediyên zevî û werz û rezande . Şojî naçar ma û got: Emrê min ji xwedêre birakê hêja û bi rûmet, ji îro pêde, ez kolê te me, û tû jî Axayê mine . Bi vî hawî, şojî xwe sipartî bû bextê birakê xwenî, rovî û lê ewle bibû. Piştî şev kete erdê, herdû çeteyan dane xwe û bi lez derketin. Xwe berdane nav rezekî pir mezin, û vêketi bûn, tîrîh û mewîj, bê sînor û bê hawe dixwarin, xwe Ji bin mêwekê di kişandin bin mêwekê, ta zik li xwe kirin kelek...têr xwarin! . Bi şahî û zikekî têr vegehanê lûs û warên xwe . Şeva din dîsanê bi dû hevde daketin nav rezan, têr xwarin û hatin mala xwe. Karê wan jî mabû ev, û bi vî hawî, şevên xwe bi xweşî û bi şahî derbas dikirin . Şevêkê, didiwan, sisiyan, çaran, xwediyê rez bi wan hay bû, û li ber guhê wî ket, ku ji şojî û rovî- herdû bê bextan pêve- tîrîhê wî na xwin, û mêrik, ew ji xwêre weke dû dijminên bê ewle û dijwar dîtin .

Rabû, Bi xeber û siqêf û lanetan bi wan ket û soz li ber xwedayê jorî da û got: Bi wî xwedayê ku ez afirandime û anîme ser rûwê dunyê, ez bi xêr û xweşî dev ji van çetan naberdim . Wilo got û berê xwe da malê û çû xefikên mezin û bi hêz li ber wan vedan û gef li wan xwarin û zirt û fort li wan kirin û got: de... lolo... xwedêyo, ku ez rojekê we bigirim û hûn di nav lepên min kevin, bê ezê çî toreyên nemayî bênim serê we. ji ber ku xwediyê rez dizanî bû ku dizên wî, ji bilî şojî û rovî kesin din nîne . Xwedê wilo kir, di şevêkê ji wan şevên reşî tarîde, herdû dest birak, weke hemû caran, derketibûn dizîya rezan . Bi dûv hevde bi lezin û di sîrikin, rovî li pêş axayî û şojî jî bi dûvde kolayî .

Weke her caran, ji darekê dikevin bin darekê û ji mêwekê di pengîzin bin yadin . Xwedê Wilo kir ji nişkave lingê



rovî kete xefka bê îzbat de. Waqînî ji rovî hat, û di xefikêde veigizgizî, û li vîyalî û wiyalî xwe dikişand û dev li xwe dikir, lê vegizandina wî bê encambû xefika malik wêran xwe li ligê wî dabû hev, ta ji dest hilanîn xistibû . Nema karîbû tev bilebiti , bê qdûm û qiram mabû . Li vira, rovî li birakê xwenî şojî zîvirî û got : Birakê şojî, îro feneke xwe li min xerc bike, bê tû min ji vî halî na derîne, bi xwedayê min û te, ku xwediyê rez bê, wê serê min jêke, û guştê min ji xwe û zarokên xwêre bike şîv û firavîn . Şojî lê zîvirî û gotê : Xema nexwe birako ev pir hesanî .Lê binêre guhê xwe bide min . Çaxê xwediyê rez bê, tê xwe di cihde bimirîne û dinanê xwe qîc bike, ezê jî hineke axa hûr bi ser wan dakim. Çaxê xwediyê rez bê, Wê bibîne ku tû mirîye wê bêje : way...lê...mîratî...ha...ha! mirîye...law !. Wê demê wê te ji xefikê derêxe û te bavêje dera ha, dûvra tê rabe bêje çerp û bazd, wisa jî tê bi hesanî ji nav lepên wî derkeve . Rovî şîreta birakê xwe xiste serê xwede, xwe mirand û dinanê xwe jî qîc kirin, şojî jî hineke ax bi ser dinanên wî dakir û xwe di bin darekê de veşart, û dibêje : Gelo ka bê, wê çî bi birakê minre çêbibe . Sibehê zû xwediyê rez hate nêv rezê xwe, dît ku vaye ew rovîyê ku li ezmana lê digeriha, li erda bi dest ketîye . Xefikê dest û ling lê kirîne teht. Mêrik ber bi rovî ve çû û qîrek lê da û got : Ey...rovîyê çepel û bê bext...ez li ezmana li te di geriham, tû li erda bi dest min ketiye, mane îro berdane te ji destê min nîne. Min îro tû di cihekî teng de zemt kirîye, ma tê bi kûde (xilasbe) !. Lê çaxa rahişt rovî û bilind kir, lê nêrî dît ku vaye mirîye, destê xwe li hev xistin û got: Way...lê...mîratî...ha...ha! . Çî fêdeyi tû mirîye...law! . xwezka min tû bi saxî kirtiba, minê kela dilê xwe qenc li te hênik kiriba, lê ax ez çî bikim – tû mirîyi - tû îro hovekî bextewar derketi bû, ji destê min tû (filitî) !. wilo got û rahişt cendekê rovî û got vir û avête dera han . Piştî ew avêt, rovî nemerdi nekir, ku çerp û bazda û li piş xwe, ne zîvirî. Wiha jî vê carê filltî filltî xwe ji nav destê xwediyê rez (xilaskir) .

Çaxê rovî bazda, mêrik wiha lînêrî û got: Ey...rovîyê fenek, te vê carê jî xwe ji destê min berda, lê ta careke din xwedê ji min û tere kirîmi . Û mêrik polî poşman vegehanê malê, lê demke dirêj di wê navêre neçû . Rovî û şojî dîsanê li çolê gihane hev. Rovî spasîya birakê xwe kir, Lê, şojî vê carê li birakê xwe yê xapanok zîvirî û got: Vêca rola(dora) min e birakê delal! . Ezê jî îro pêde axa bim û tê jî li dûv min kolabî. Rovî got: nexeme birakê hêja, min axatî da te, û tû çawa here ezê li pey te bim, û bi sozê mîrên berê, ta ez sax bim, min axatî ma ji tere, û min nema da pêşîya te. Rovî bi vî hawî dev ji axetiyê berda, piştî bi çavê serê xwe dît ku barê berpirsiyaryê û axatîyê barekî çiras girane, ne herkes kare rahêje vî barî, û li xwe wergire .

Hah...roj çûn, şev hatin . Şojî û rovî, herdû dest birak, dîsanê derketin dizîya xwe. Şojî jî li pêşe û rovî li dawîye, weke du çetên bê ewle xwe berdane nêv werz û rezên çiyê . Vêketine tîrîh dixwin, û ji bin darekê di pengîzin bin ya din. Rezê mêrik li telafê xistin, û torên nemayî anîne serê wî. Xwedê wilokir ne bi tûwî, lingê şojî got: Terp û kete xefkê de û bûye care cara wî, û qîr û hewara xwe bire rovî û jêre got : birakê rovî ez di bextê mîrê çê de, vîcarê tê feneke xwe li min xerc bike,

bê tû min ji vê tengasiyê ne êne der...gidî. Ez di virade mirim !. Bi wî xwedayê jorîkim ewê ku em afirandine, ku xwediyê rez were, wê serê min jêke, û bavêje dera ha, wê mla min û zarokê min li mîratê bigerîne . Lê rovîyê xapanok, ji pêşîde ya xirab xistibû dilê xwe de, li şojî zîvirî û got: Şojî, min ji tere neguti bû, axatî bi kêrî te nayê ? lê te digotî na, bi ya min nedikir û şîretên min ne di ketin serê te de !. De lixwe binêre vêca bibîne bê çî felaketên nemayî bi serê te de hatine !. De hema di wir debe, incex wira ji tere başbe . Ez tu fenê xwe li te xerc nakim, tu birakitî di nav min û tede çênebûne, ne min tu dîtîyi û ne bînayî. Wilo got û pişta xwe daye birakê xwe, Şojî û bi rêket û çû . Lê Şojî lê zîvirî û got: birakê rovî, min ev hêvî rojekê ji te nedikir, vegere hişê xwe bîne serê xwe, min di vî halîde mehêle, zarokê min hûrin wê gunehê min û wan, di hustûyê te keve, ku tu feneke xwe li min xerc neke, û tu min ji vira ne derêxe, wê çêlikê min ji birçîna bimirin, û tu jî dizanî ku piştî min kes nîne wan xwedî bike û li wan bi xwedî derkeve ?.

(Çaxê qala zarokan bû, gurmînî ji nav dilê rovî hat)! Û ji xwe re got: A...hah...! . ka gelo bê zarokên vî hovî di kûdene ? niçîreke bi dohn îro xwedê bê hesab ji min re şandîye. De ka vêga ezê çilo bi ser çêlikan vebim, ku ez karibim wan buxum ? . û hema rovî ji xwe re di bêje : Çî şîveke xweş di van çêlika de heye law ! Hema di cihde li şojî di zîvirî û di got : birakê şojî, ji vî alîde pişt rasbe û xeman mexwe, zarokan bispêre apê wan. Birakê xwe rovî : Ka bêje ew sêwîyên te di kûdene, ku ez karibim bi ser wan kevim, li wan bi xwedî derkevim, Ji birakê xwe re cihê wan bêje û bi dilekî bêxem, here ser dilovanya xwe, îşê te ji çêlika nema heye, xwedê wekîlê tebî, ewna wê di çavê min de bêne xwedî kirin, û wê cihê wan di ser yê zarokê min re bî, û bila tû xweş zanibe jî, ku destê biratîyê pir şêrîne. Zarok zarokê min in ew gihane xwedê û gihane min. Şojî lê zîvirî û supasiya wî kir û got: tu saxbî birakê rovî, û malate jî hezar carî ava, û (sa'eta) te xweşbi. Lê ez nikarim ji wê dîrê ve ji tere bêjim, çimkî dîwar bi guhin, di tirsim ku deng here hinan ji van lawirên çolê, wê herin çêlikê min buxun. De ka guhê xwe bîne ber devê min, ezê cihê wan di guhê te de bêjim . Çaxê rovî guhê xwe anî ber devê wî, şojî -yek nekire dido- devli guhê wî kir, qenc bada û dinanê xwe lê dane û kirin teht, û xwe kire qêlik de. Rovî bûye waqe waqa wî, ji şojîre di bêje : Birako te guhê min birrî, çî bela teye îro ? . Guhê min berde heyra, xwediyê rez bê, bi xwedê ku bê wê serê min û te herdûwan jêke ! qey tu dîn bûyî vê şevê ? çî bi te hatîye bavo ? . Guhê min berde bes heneka bi min bike, çiqasî henekê te nexweşin... lo...o...o...h !. Lê şojî jêre got: Ey...hevalê xapanok û tep reş !.Ma hevaltî xwedê wilo gotiye law ? . Tewra tu dibêjî min berde ? jibo tu here min di virde bi hêle, û di serde jî çêlikên min buxwe newlo ? . Mane berdane te îro ji destê min nîne, ez û te emê wilo bin, ta xwediyê rez were, me ji hev (safî) bike, bila serê te jî bi yê min re jêbibe, û xwediyê bêbextiyê herdem di bêbextîya xwe ve derdikeve. Bi vî hawî, herdû çetan hevdû kirtibûn, û wiha ta (sibehê) mabûn. Sibehê çaxê xwediyê rez hatîye, matmayî maye dema dîtîye, ku vaye şojî bi guhê rovî girtiye, û devê xwe li guhê wî jidandîye kiriye teht, û care wara rovî di ezmanê xwedê ve derdikeve. Dike nake şojî wî naberde !. Xwediyê rez jî yek nekire dido. Di cihde xencera xwe kişand û got: Ey...rovîyê...çepel û fenk! îro xwedê tu bi hesanî gihandîye ber destê min . Ezê vê rojê, tola rez û tîrîhên bav û kalan ji te hilnîm . Û xencer da ser hustê rovî û serjêkir. Piştra li şojî zîvirî ew ji xefikê derêxist. lê dît ku vaye xefkê lingê wî şikandîye, lingê wî (cebirand) derman kir û paç lê gerandin û ew bi xêr û xweşî berda . Şojî çû malê, nav mirov û zarok û çêlikên xwe .

Ji folklore kurdî

Ev metelokana girêdayî giyandarên avî û dêmin, mîna "hirç, mêrî, masî, kew, mar,...".

Bi pesin û saloxetên wan di nav metelokê da, mirov dikarît nasbikit.

Mahir Berwarî Ji Pirtûka "Metelokên Zarokan 2009"

1. Sivore

- Ji vî banî, bo vî banî, bo pêziçka Şeytanî.
- Ji vêrê heta Balete, hemî Cihûyêt kurete.

2. Kêvrîşk

- Helwandira, helwandira, dihavêt lotik û qendira, şaxêt bizina, guhêt kera.
- Her li van dera, her li wan dera, tişteker derket ji nav bera, pêt gurga, guhêt kara Helo dera, helo dera, şûn pêt sa, guhêt kara.
- Sergelgele bin gelgele cav zîqa simbêl bele. Ser gelgelu, bin gelgelu, çav zîq û simbêl belu. Ser gile bin gile cav boq û simbêl bele.
- Pê puka, guh belok.
- Çî li deştê bit çî li nav bera, çî li ber qurmên dar û bara, pêngurgane, guhên ker a.

* Reşîd Sindî: çu di kunê ve ne mare, pûrtê pêve ne kare... (Kêvrîşke)

* Gelgele: Belg û qirşê pawîzê ye. Bel:Veday, xar.

3. Tebu/ nuj (qirnî)

- Mûtê bê pûte, dixot û narrîte.

4. Jûjî

- Çume rêkekê, mamê mişt ji wêve tê, piştîyê li nîva piştê, min gutê: Mamo dê kîve çî? Gut: Dê çime Biheştê. Êk dihat ji deştê, milekê sitirî ya li piştê, min gut mamê dê çî key? Gut dê çime Beheştê.

- Feqîrek têtû ji deştê, piştîyekê sitiriya li piştê.

Kalo tê ji deştê, barê stiriyan li piştê.

- Tiştekek min heye, can goşt û hestîne, kincê wî bi derzîne.
- Tişteker min heye teqteq dike ne dare, serê mişke ne mare, giya dixwe ne kare. (* Kusî ji dibe)

- Kumê gup û bi dirî.

- Hebanoka bi derzî, mar ji ber dibezî.

- Mamekê min li deştê, barekê sitirî ya li piştê, dikit nakit, destê wî na gihite piştê.

- Hulik mulik, mamê te yê difin gulik.

5. Kîsel/kusî

- Çolî/giyay dixot ne kar e, ser mişk e qon mar e, ne mişk e ne mar e.

- Hêr hêrî ye, ne mar e, çulî xûre ne kar e.

- Ji hêrve mil, ji wêrve mil, yê di navda mîr kurvil.

- Vî alî text, ji wî alî text, jê derket kalekî bêbext.

- Tişteker heye tiştanok, li ber kevir xiştanok.

- Ser textik e, bin textik e, giya dixwe ne karik e.

- Çerm û çiqal e mû nîne, çar dest û pê ne, dûv lê ne.

- Tişteker heye ser text e, bin text e, di nivê de pîrek e bêbexte.

- Ji vî alî dar, li wî alî dar, di navberê da, goştê jar.

- Kutan dikî ne dare, serî mişk e, ne mar e, di çêre ne ker e.

- Tishtëkî min heye, teq teq dike, ne dar e, serî mişk e, ne



mar e, gîha diwxê, ne kar e. (*Jûjî ji dibe)

- Ji binve dar, ji serve dar, çolî/giyay dixot ne mişk e ne mar.

- Diçerit kar nine, dizelit mar nine, hêka dikit mirîşk nine.

- Ji serve dep e ne dar e, ji bin ve dee ne dar e, giyay dixot ne kar e, diçite di kunê ve ne mar e.

6. Dûpişk

- Lawkê Deştanî, çû serê banî, qun tîjtir e ji didanî.

- Lawkê Elman a, digerit li ser bana, qun tîjtire ji didan a.

Lawkê Elman a, bi şevê digerhit li ser bana, qun tîjtire ji didan a.

- Mamkê min berekat, terkek li te da, qarrên ji te hat.

- Çeq e leq e/meqe, heçî yê destê xwe bidê ehmeq e. Çeqmaq e, çeq û leq e, yê destê xwe biketê, yê eh`maq e.

- Ez çûme ser banekî, qun kefte ser ranekî, 7 dîng bi beranekî. * bê manaye!

7. Mar

- Teyrek firî şivekê, perr pêve ne, qun li nîvekê.

- Şiva terr, li guher.

- Şiva ter e, li bin axê.

- Singê xar e, li bin dîwar e.

- Zil e wekî zîwan nexişandiyê wek tîman, ne dîne û ne îman, yarê hemî rihan.

(* corekê tîra hebû di gotinê tîman)

- Tişteker heye tiştinok, li nav kevir e xiştinok, ne ber heye ne piştok

- Tizbiya kalê, berê xwe da palê. (* meinyê nade!)

8. Mişk

- Apê sincik bazda quncik
- Helhelîko melmelîko, simbêl tîjo guh belîko.

- Gasim e, dîwar sime.

Qasimî, dîwar simî. (* mişk, mêrî, darkoke)

9. Pişik/kitik

- Fatka melê, têtû ji kelê, rih pêvene, simbê belê.

- Helhela simbêl bela, wê digerhit li ser lêvêt kutela. (* dibit giyandarekê dî bit!!)

10. Masî

- Temtème, qulintème, sîngê şêra, çavêt mara, pîr Ecem e dirinde me.

- Tiştekekî mino tiştanî, li ser textê sultanî, pêxemberî şûrê xwe di stû danî.

- Di avê de pêlewan e, li bejayiyê/dêmi bê can e.

11. Darkoke

- Himhime dîwar sime.

(* bo dumanê jî tê bikaranîn)

- Himhime, darî bisime.

- Hindî min li bîr e, Mihemed axa wezîr e, li nav teyra, êkê bi şîr e.

12. Dîkil/Dîk

- Tişteker min heye ser mişar, nîkil mikar.

- Şaşik li ser seraye, bang dide, lê ne melahe.

- Sere mişaru, pê xeparu.

(Es kam ein Mann aus Ägypten, sein Rock war aus tausend Stücken. Hat ein knöchern Angesicht, hat einen Kamm und kämmt sich nicht./Elmany)

13. Kew

- Ji vêrê heta Mûsil, hemî xatûnên çav bi kil.

- Stû rahêl bi bendala ra di bezit.

- Wit wit, şûnkê dûl qut.

- Dengbêjekî dengzelal e, ji qewmê xwe re neyar e.

- 10 mêr bi rengekî sitrana dibên bi dengekî.

- Ser mazîk e, stû derzîk e.

14. Sûsik

- Bager dezî, li palê bezî. (* Ji kewa biçûktire)

15. Eylo/Ilho

- Li erdê weke gîsk e, li esman weke nîsk e.

16. Qişqil

- Tişteke ji gezê biçûktire, ji bihostê mezintire, ji befrê sipîtire û ji qîrî reştire.

- Reş e reş e mîna qîrr, spî ye spî ye mîna şîr, diçe diçe mîna mîr.

17. Çûçik/çoleke

- Tiştekekî tiştane, li ser kevra xiştane.



(*Dibît marmêlke bin.)

18. Meqesok (* teyreke)

- Reş e wekî qetranî, sipî ye wekî kitanî, sûr e wekî mercanî, difirît diçite esmanî.

19. Mirîşk û çêlik

- Xoşka mina xoristan, çil dergoş di destan, ne ber heye ne bistan.

20. Hudhud

- Ne li Ademiye, ne li Cinniye, qasidê beyna xelkiye.

21. Sting/moz

- Hespê sorê nav çav belek.

- Çume di şikeftê ve, ya tijî tîteçî, êkê wesa mîne bibeme cutî.

- Hirda wê da di sima gê da, heft mal Ecemek tê da.

22. Mêşa hingiv

- Teyrek hat, tutkek pat, ne fitre, ne zekat.
- Bizna kal e, li ser mal e, ne didoşin, nedifiroşin.
- Sed mêr hatin bi rengekî, sitran gotin bi dengekî.

- Mirîşka min çû kepire, zirça xwe bû şekire.

23. Cobir

- Ga dakir, dûv jêkir.

24. Sîxurr

- Reşe wekî qîrr, sipî ye wekî şîr, tîje wekî tîr.

25. Kûjîk/Vîjîk

- Perê kewekî, dane bin berekî, bû xêr û şerekî.

(* Dibît tişteke dî bit)

26. Kêvjale

- Ser tenten e, bin tenten e, çar çeng û fil û fert'en e.

- Rimbêlî, dem bêlî, seqlana sufî çêlî, dest û pê çembêlî.

- Çûme êş, ecêbek hate pêş, bi çar lingan bû ji xeynî yê pêş.
(* dibe şeş rastir be!!)

- Ser deqnenûs, bin deqnenûs, çar çeng û fil û fengenûs.

27. Beq

- Ser qulufetê, îr çune, biyar heye, mû tune.

- Eyar heye mû tune, xwe digvêşe gu tune.

- Çerme û çîqale, mû pêve ne, çar dest û pê ne, dûv lê ne.

28. Mêrî

- Tişteke min heye, ji vir riz, heta Xalabe tiz.

- Ne ker e, ne hêstir e, bar ji qalibî mezintir e.

- Serê aliman e, navtenga zahidan e, gunêt bagîran e.

- Min xalek heye li ser zûrî, sere mezintire ji ûrî/zig.

- Hêstira qero, li bender/bêderê, ne gur dixwe, ne diz dibe.

29. Kulî

- Çume ji vêrê pêda, tişteke di rêda, lingê li ser pê da.

- Çume wêra jûrî, berazekê xinzirî, çukêt wî piştê helbirî.

30. Pêşî

- Çume mala mîr, pisyar dikim ji mirovê pîr, kê dîtiye teyrê bi şîr.

- Ji tiştan ne ti tişt e, nikil weke xişt e, perasû li nav pişt e.

- Tîştûne serê tiştuy xiştûne, pilek lêda kuştûne, pîre gayê zirçûne.

31. Kêz

- Reşe û sure ne bizn e, serma dipeçe ne jin e.

- Reşe wekî qîrr, difire weke tîr.

- Reşe wekî qîrr, difire wekî tîr, kutilka çêdike, wekî jina pîr.

32. Gêrik

- Li vê derê dibe rêz, li wê derê dibe fêz.

* mêriya bi darên mazi ve.

33. Şeytanok

- Sih`ir hêsk, beden nasik, 4 gûçkê bê pêçik.

- Yê keje wekî keşk, yê mite wekî mişk, biharan tere, payizan hişk.

34. kêç

- Çindik çindik, bazda quncik, bê dil û bê gurçik.

- Hûr e wekî kirzin, reş e weku bizin, hakim ji ber dilerzin.

- Sir û batê, çift vidûnatê.

- Li min filitî, li te xebitî.

- Tiştê min tiştok e, yê bi kulav û dersok e, navê wî zirçepok e. (* bo hine tiştên dî jî dibêjin)

35. Şaxên bizina

- Çume şikeftê ya tijî gupal, êkê wesa nebû bideme pal.

- Çûme rêleka bi dar bi dar, qet darekê we nebû bikime distar.

36. Mihdûşîn

- Qun li axê, ser li qunê, deh le duwa.

37. Perîna nêrî

- Çûme duleka bi xire ber, min dapîra te girt, bapîrê min xwe havête ser.

38. Simên bizina

- Çume şikeftê ya tijî pêlav, êka wesa nebû bikime pê xo.

39. Hêstir

- Rezê bê ber.

- Dê bi hîr hîr, bav bi zirr zirr, kero bê qantir.

40. Dûngê pezê sipî/Dûv

- Hêlîna leglegî, ne li berojî, ne li nizarî, hetav sipêdê didetê, ne êvarî.

- Derxûnê qunê, malê girarê.

- Distarokê bi kevlî ve.

Distarokê, li nizarokê.

41. Wênê gur/gurg

- Gur e, mirov dikare bigire.

42. Dewar (hesp, mahîn, ker)

- Çar çeçîn çeçîn diken, du belbelîn diken, hizar û yek bawêşîn diken.

43. Hirç

- Li berojî ji tirsî dimirin, li nizarî ji bîrsî dimirin.

- Hevrist e, tat e rist e, xoş fêhris e.

44. Fîl

- Serê mar e ne mar e, diçerre ne kar e, çar pê ye ne dewar e.

* Gundê Çemseyda/Berwarî-Balla/kilîla vê pirtûkê

8. Mişk

- Apê sincik bazda quncik

- Helhelîko melmelîko, simbêl tîjo guh belîko.

- Gasim e, dîwar sime.

Qasimî, dîwar simî. (* mişk, mêrî, darkoke)

9. Pişîk/kitik

- Fatka melê, têtû ji kelê, rih pêvene, simbê belê.

- Helhela simbêl bela, wê digerhit li ser lêvê kutela.
(* dibit giyandarekê dî bit!!)

10. Masî

- Temteme, qulinteme, sîngê şêra, çavêt mara, pîr Ecem e dirinde me.

- Tişteke mino tiştanî, li ser textê sultanî, pêxemberî şûrê xwe di stû danî.

- Di avê de pêlewan e, li bejayiyê/dêmfî bê can e.

11. Darkoke

- Himhime dîwar sime.

(* bo dumanê jî tê bikaranîn)

- Himhime, darî bisime.

- Hindî min li bîr e, Mihemed axa wezîr e, li nav teyra, êkê bi şîr e.

12. Dîkil/Dîk

- Tişteke min heye ser mişar, nîkil mikar.

- Şaşik li ser seraye, bang dide, lê ne melaye.

- Sere mişaru, pê xeparu.

(Es kam ein Mann aus Ägypten, sein Rock war aus tausend Stücken. Hat ein knöchern Angesicht, hat einen Kamm und kämmt sich nicht./Elmany)

13. Kew

- Ji vêrê heta Mûsil, hemî xatûnên çav bi kil.

- Stû rahêl bi bendala ra di bezit.

- Wit wit, şûnkê dûl qut.

- Dengbêjekî dengzelal e, ji qewmê xwe re neyar e.

- 10 mêr bi rengekî sitrana dibên bi dengekî.

- Ser mazîk e, stû derzîk e.

14. Sûsik

- Bager dezî, li palê bezî. (* Ji kewa biçûktire)

15. Eylo/Ilho

- Li erdê weke gîsk e, li esman weke nîsk e.

16. Qişqil

- Tişteke ji gezê biçûktire, ji bihostê mezintire, ji befrê sipîtire û ji qîrî reştire.

- Reş e reş e mîna qîrr, spî ye spî ye mîna şîr, diçe diçe mîna mîr.

17. Çûçîk/çoleke

- Tişteki tiştane, li ser kevra xiştane.





Ji folklore kurdî METELOKÊN KURDÎ



1. Aqilê Sivik barê giran.
2. Kesî qala gurî nedikir rabû di devê kaniyê de gû kir...!!!
3. Rovî ne çû qulê, hejek bi teriya xwe vekir.
4. Xwelî li wî serî ku heftê serî jê ne êşin
5. Kurmê darê ne ji darê be dar kurmî nabe
6. Xeta xwer ji gayê pîre
7. Tas hat û çengirî çî tije û çî vala
8. Serê ne êşe dismalê lê girê mede.
9. Şêr şêre çî jin çî mêre.
10. Ez zanim û tu zane!!
11. Kîr bi paçka mezin nabe
12. Va şar û va minşar
13. Tir li ku û das li ku
14. Şîreta bûk û xeswêye
15. Bira biraye bazar xuyaye
16. Hespê çê êmê xwe zêde dike
17. Bi pirs ji kalê zemana û ji xortê geryayî
18. Terpiyê min li xwe nek têde tir û fisa nek
19. Şam şekire welat şêrîntire
20. Bi pirsê mirov dighê xursê
21. Şûjna di çavê xwed nabîne derzya di çavê xelkê de dibîne
22. Ne hesil kil û kildane hesil dihêl û badane
23. Kevrê havîna bavêj pişt kulîna
24. Bilûra liber gaye çira liber kûraye
25. Mih bi nigê xwe û bizin bi nigê xwe
26. Piştî baranê ser ga cil kir
27. Bûka liser hespê kes nizane nesîbê kê
28. Mih bi nigê xwe û bizin bi nigê xwe
29. Ez dibêm çî û tembûra min dibê çî?
30. Xwedî sebrê bû melekê misrê
31. Wek nanê ser sêlêye
32. Tenya binê beroşê
33. Chi zindî xwarini, mayî dora mirîya.
34. Kurmê şîrî heta pîrî.
35. Çavê li derya xwelî li serya.
36. Wek sêwyê eba bavê xwe li xweke.
37. Ê li hespê xelkê peyaye.
38. Yekî ne go mendo kerê te bi çendo.
39. Dengê defê ji dûr xweşe.
40. Du textik û bizmarek.
41. Ecelê biznê tê nanê şivên dixwe.
42. Nikare bi kerê dire kurtên.
43. Dê bibîn dotê werîn.
44. Kero nemir heta qîvar şînbê.
45. Ne xwar, ne da hevala, genî kir avêt ne wala.
46. Ez nebûm bûk û li kerê siwar nehatim.

47. Beniştê dêhna ji ritlêye.
48. Nedî..nedî..quzê ca xwe dî.
49. Mala têr jin xerabû ji bin.
50. Rî dibe bost lê dujmin nabe dost.
51. Giya dibin kevrade namîne.
52. Çû heyfa bavê qûn liser kir.
53. Ne sar li te tê ne ger li te tê.
54. Bi xwe listî bi xwed mîstî.
55. Go koro tu çî dixwaze go çav.
56. Ku piştî min heba zikê min ne di êşiya.
57. Tu dizbe şevê reş pirin.
58. Ku tu neke bi ya mezina wê quloçê te bibin wek yê bizina.
59. Bîn ji mezna û bide mal mezna.
60. Bîra avê jê vexwe kevra navêjê.
61. Ji dêrê ma û ji mizgeftê ma.
62. Nigê xwe ligor lihêfa xwe rade.
63. Başkîro bi xwe kiro, xerab kiro bi xwe kiro.
64. Ga dikeve kêr lê pir dibin
65. Xuya male jê nayê xwestin.
66. Ê nejmalkê nizani bi hewalkê.
67. Riya dirêj ji gava biçûk destpê dike.
68. Ê deva xwedî bike deryê xwe bilind dike.
69. Ê here masiya divê qûna wî şil bibe.
70. Ne ji gelaca ba wê gur û mî bi hev re bimeşiyana.
71. Tirek û du tir licem tireka wek hevîn.
72. Ne çixara ber bê, ne kutana nav kayê.
73. Giyayê hewşe tale.
74. Her teyrek bi refê xwere difire.
75. Çirîskek di taryêde rokeke di ronde rokek di ronyêde
76. Ez mîr, tu mîr kî wê bibe wezîr.
77. Dayê belayê, xuşkê tehlâyê, jinê were kolana minê, ez te bigerînim li welatê dinê
78. Ez bê ez tu bê ez wê kî here ber pez.
79. Aqil tune kêf dike, pembo tune eşêf dike.
80. Cotkaro tu çî di çîni? herger şînbê tê bibîni.
81. Erebe û tembûr.
82. Hirç û qûn şuştin.
83. Rovî û sûk.
84. Ji dêrê ma û ji mizgeftê ma.
85. Pîrê bahwer nekîr mîrkîr dawa next û hefteka kir.
86. Gundekê û gundoreke.

87. Mîza wî tê jê werê kîrê wî rabû.
88. Danû xistin dawa wî kîrê wî rabû.
89. Mala pîrê stara pîrê.
90. Go Erebe çîma quzê te reşe, go malê min eve.
91. Şûnaşêra kundek kor.
92. Xwar rûne lê rast biaxeş.
93. Mala pîrê stara pîrê.
94. Navik mezin li gundek kavil.
95. Gotinê mezina nexshê berfê.
96. Yê pisyarkerbe dayê zanabî.
97. Neke dengî dilê dujminî peqand.
98. Befir sarîya xwo nahêlî.
99. Xudê yê gotî dê te keme mîr belê min neke ji bîr eger dê te keme êxsîr.
100. Bira biraye belê bazarê cudaye.
101. Ezmanê birîbe sera yê vesaybe.
102. Ezmanê dirêj darkûkê serê xwudanîye.
103. Çav çava dikevin belê çîya bi çîya na Kevin.
104. Her zalimekê zewalê xwû yê heyî.
105. Mîrov karwanê mîwîja diket belê karwanê befrê naket.
106. Şûlkerê xwû be xwûstivîyê xelkê be.
107. Mîrovê bê xîrê ne dunyayê û ne axrê.
108. Her serek aqileke.
109. Serê nav sera beranê li nav kera xarxayê gerdên zera.
110. Serikê hêlû mîla xarxayê gerdên kêla.
111. Kiç Dara mazîne.

Jin di metelokên Kurdî de

- 1- Jin stûna malê ye.
- 2- Mala ku jin ava bike, kes nikare xerabike.
- 3- Dar bi berê xwe ye.
- 4- Serê ku serî jê nekevin, bila bê veşartin.
- 5- Jina çê ji hezar mamote çêtire .
- 6- Law dest tavêje sure bavê, keç dest tavêje te □iya dê.
- 7- çavê reş kil naxwaze.
- 8- Jina bê fedî, weke xwarina bê xwê ye.
- 9- Axa jinê û axa mîr her yeke.
- 10- Jin û mîr du baskên teyrekî ne.





Lewend Dalînî

XANÊ



Her dema ku giyan û canê wî bi hev re biketana heyecaneke bêsedemî, kûr û bê binî, û sawîr û xalên reş li pêş çavên wî bihatana zelal kirin!.... Hingî dizanîbû ku wê tofaneke mezin, lehîyeke giran li jiyana wî rabe, ne tenê ya rojane, lê belê ya pêşerojê jî, û wê xwe bi rengê bûyereke bidê xuyanî kirin?!

Dilê wî dihate guvaştin, pêlek ava germ bi laşê wî ve dawerivî! Hawîr dora sînorên laşê wî tevdaneke bê rawestan û ne rehetîyek, dida! Damarên laşê wî wisa li wan dihat ku ne yek jîwan jî, dikarîbû karê xwe ê fîzyolojî pêk anîba!

Wê rojê bi temamî ji nêva livînê nehate der, di tevlîhevîyekê bi mij û moran de, canê wî peyala tehlî û bêhewesîyê dinoşt!

Di kete newalên kûr û bê dawî! Şeva reş baskên xwe berdida hawîr dora wî! sawîrê reşkên şevê û pîr-eboka dihatin ber çavên wî!... kêferat û berxwedanên wî tu alîkarî pêre nedikirin! ne di revê û ne jî di bazdanê de! tu rîyên xelasbûnê ji xwe re ne di dît! navtêdan dixwe didan, tu feyde nedidanê, mêrxasî, mêranî di bîra xwe de tanî, hîç tu tişt nedihate guhertin! Li hawîr dora xwe di fitilî, li bin guhê Sênc û dîwaran, kevir û latan diket! kevir di bin lingên wî de dihêvîn, di hîm û latan de, werdibû..... Carna bablisokê ew qûnaxekê li ber xwe dibir, û toz û dûmanê ritam dixiste çavên wî!..... Kelem û pîjan ling û destên wî brîndar dikirin! kincik û cilikên wî dibûne av û çirav, geh germê Lê cordikir û geh jî ta yê ew zem dikir, û dibû reqa reqa diranên wî ji serma!..... Havênê hestîyekî sax di canê wî de nedima! Lê hîn berxwedana xwe ne dirawestand!?

Destên xwe li hawîrdora xwe di peland, bihêvîya ku bighîne çuqlîyek dar yan jî tûmê giyakî, xwe pê bigrê û xelasîya xwe bibîne! tiştêk bi dest wî nediket! Geh di revî, û geh jî dikete cokan û nehêlan de! Zûre zûra gur, wawîk, û rovîyan, bîna termê Miraran, şewat û kizûrê dikete pozê wî!

Vîze vîza bayê û xwiş xwişa baranê, şinge şinga berq û beledîya, him him û gum guma tav û ewran! Teyrokê didayê, li ser û riwê wî diket, pelqênî jê dihat û bi dev ve diket nav çiravê, xwîn ji riwê wî dawerivî!?. Cilên wî di qetiyên û zîvar zîvarî dibûn, panîyên lingê wî qelişin û bûne ciwên xwînê, qeremên wî alîkarî pêre nema dikirin, hiner da xwe û rabû, hejhijî û ji qama xwe de kete xwarê! bi zik kişîne canê xwe dikişand, kabokên wî nema alîkarî pêre dikirin! bi destên xwe alîkarî bi lingan re dikir û bi hêz da xwe û dîsa rabû!

Bazdida û diket! radibû û dîsa bazdida.... Terpilî! û enîya wî li bin guhê Latekê Ket! Wek berqê li şûn vejeriya û ji paşve patika wî li tehtekê ket? Şingênî jê hat..... Qederê bîstekê bê hiş ma! dîsa rabû ser xwe ku reva xwe berdewam bike û xwe xelaskê!...Û Ji nişkê ve ji xewê hilçenîya! Li ser dengê zingilê telefûnê..... Xuhdanê laşê wî, doşek, palgeh û lihêf kiribûne av, tayekî ziwa jî nemabû!.... Dest li telefûnê di peland bêyî ku karibê çavên xwe vekê, destê wî telefûn nedît!..... Serê wî hatibû cihê lingê wî, û lingê wî jî çûbûn cihê serî!?. bîstekê bê deng ma....

Ji rexê malê ve jêre telefon anîn!.....

Li min bibûre belkî min te ji xewê şiyarkir! Lê divabû ku ez te agahdar bikim: Xanê şeva borî dane zilamekî têr pere!?!...

Eskerê BOYÎK

ŞIHÎDÊN ŞERÊ QEREBAXÊ



Mala Mistê Kalo li welatê Qazaxistanê gundekî nêzîkî bajarê Alma-Ataê da dima. Maleke girane, nandare li nav kurdên li welatê Sovêtê da kivş bû. Pîrka Huc êdî nêzkaya heştêyî bû, lê hela kevantya malê dikir. Li ber destê wê kur, bûk, nebî, nebîçirk diçûn – dihatin. Rîspî: Mistê Kalo devedevî nodî bû, maqûlekî xeberxweşî gotina we bû. Wî yaşî da jî mirov hewas dikir wî, rewşê, rabûn-rûniştandinê, xebirdanê mêzeke. Mezinayî malbetê dikir.

Wê rojê qewm-pîsmam, gundî-cînar, heval-hogir dorê civiya bûn. Oda mezin da kulav û xalîçe raxistibûn, li ser doşek û belgî danîbûn. Serê jorê Mistê Kalo bû, rex şêx, mela, kal, binatarê ahil û gênc...

Herd lawê wî yê bal : Hesen û Memo, tev neferê malê li ser pîya bûn, mêvan pêşnyaz dikirin, hazirya xwe didîtin.

Melûltîke giran ketibû li wê mala giran. Dûyê cixarê li ser serê hazira bûbû dûman. Kalê ker bû. Xebirdan lê nedibû. Derba giran li kurên wî ketibû. “ Niha lawik bîn ezê çi bêjim? Çawa ber dilê wan da bêm? Bi çi teherî çarekê êşa dilê wan ra bikim? Ez jî teyax nakim... Kalkê we korbe, lawo! Seva çî, seva kê, çima? “

Çevê teva li dêrî bûn. Herd lawê kalê: Elî û Egît, gerekê yek ji bajarê Yêrêvanê: Ermenistanê, yê din jî ji Bekûyê : paytexta Azerbêcanê bahatana...

-Elî û Egîtê malava jî, ku wextê da, mîna me teva barkirana, bahatana, xwe ev yek nedihate serê me, -kalekî hazir serê axaftinê vekir.

-Nehatin, mala me şewitandin...

-Mêrika ra li hev nehet, çi bikin...

-Hatina wan rehet nî bû, bavo...

-Herd jî him karê cawdar da dixebitîn, him jî hebûka wan pir bû...

-Merivne eyan in, mêrika, canim...

-Hevalên wan jî nehîştin...Hukumata jî nehîşt...Ew jî man...

-Lê min çawa lingê xwe her tiştî xist, hatim?

-Ya te û wan weke hev nî bû, bavo, ya wan cûrekî mayîne...

-Ya wan çi cûreye? Êl tev çevêkî, ew jî çevêkî...

-Ê, birano usa nebêjin, hatin rehet nîne. Her kes nikare hêsa ji cî bişihite...Min jî hîşt ,hatim. Niha nikarim bîrkim...Gav-sehet mala mine wur li ber çevê mine...

-Me bi miraz mal çê kir, navmal danî, bax û baxçe avît, her buhustek erd ma bi ruhê xwe bêcer kir, her zilekî ra hejyan, ricifn...û gişk xelqê ra ma...De vir nu dest pê bike, malê çêke, hebûnê topke...Çika ya vira jî jî kê ra bimîne...

-Ji wî derdî mala min şewitî, helala min e bûkîn danavî bû, çû...

-Lo Hesenê Şemo, lawê Huseynê Mişîr, eva Baryê Adil, Ezîzê şêx, Hipoyê Kakê...ezê kê bêjim, kê nebêjim, kul wan hatibû, ji wî derdî ji destê me çûn...Bîra we çûye, Fatma jina Casim, sax-solamet, nîvê rê da dilê wê teqya...Lê Şemika dîya Kemal?..

-Kulê tê bikevî mala nepaka, çawa ev dînya li hev xistin, wa anîne serê xelqê, me xwe ra qenc-xirav dijît da...

-Kul mala Garbaçov keve...Eva gişk kirina wî ye...Ewî dewlet hilşand...Dewlet hilşandin zulme, bavo!

-Eh, gunê kesî vê navê tune, gune yê meye...

-Gunê me çîye? Çima em kêfa xwe rabûn hatin? Em derxistin...Yan na kê ji çîyê xweş direve? We teva jî dîtîbû mala min, halê min, baxçê min...

-Wele kesî min ra tişt negot, hela cînar berev bûn, gotin neçe. Lawika gişka bar kir, min jî da dû wan...

-Axir em ser hev nîbûn...Çend malê me gundekî da bûn...Me jî xwe dabû ser Azerya...Zarokê me diçûne mektebê zimanê wan... Wele gundê me jî mîna gundên Êzdîyan başqe bûna kesî me nikaribû...

-Êzdî jî rojê pak da nînin...Wê berdine Êzdiya jî...

-Çawa tişt me ra negotin? Lo gurê har ji mîletçyê wan xêrtir bûn. Loda gîhayê min şewitandin, zarok nikaribûn derketana derva, lê minê cî bikira...

-Çend xortê Ermenya êvarekê hatin ketine mala me. Zarok ziravqetî bûn. Gotin, em hatine seva çeka. Çekê we hene gerekê bidin, yan zêra bidin, yan çeka, na, wê we ra xirav be. Ê, çek ji me ra ku hatibûn. Zêr ji ku ? Du roj dem dana me... Min tûyî li ser her tiştî kir, hema roja din tamê xwe arzan da, bar kir hatime vira...

-Dema ew Êzdîyatî- kurdîtî jî kirine navê tiştêkî qenc wê navê nema, canim...

-Êzdîya jî tiştêkî qenc nekirin...

-Wele ji sedî nodê Êzdîya dijî wê dutîreyê bûn...Lê destê wan tişt nedahat...Dewleta Ermenya ew êzdîtayî çê kirin...Wê êzdîtayê mala Êzdîya jî xirav kir... gişk hev bûne dijmin...Bira birê ra xeber nade, bav û kur bûne neyarê hev...Mîletê bêxweyî usane, bavo !

-Çiqas mêrê Êzdiyan am-tam kuştin... Xelkê newêribûn xebirdana...

-Çevê cînarên me li ser tamên me bûn, erdê me bûn...Hela ev besa tune bû, wele gundyê me yên ermenî tamê me li nav xwe da par kiribûn...

-Mirovên qenc, dostê baş jî hebûn.

-Tu bêjî, carke din emê dîsa vejerin wur...

-Êh, kê zane?..

-Ez dîsa dibêjim sûcê kesî li vê navê tune...felek me ra xweyîne, qedere...Meriv, ku welatê xwe da nîne, welatê xwîlqê ji mirov ra nave bingeh. Xweyê hebûna xwe nîni, ne xweyê mala xweye, lo xweyê serê xwe û ewleda jî nîne...

-Malê dinyayê li ser merya be, li nav zêr û zîv da be, dîsa her tişt beredaye...

-Dixebitî, diçerçirî, malê datîni, qesra çê dikî, kerî-sûrya rêz dikî...buhuştê jî çêkî, yeke rojekê bê tê xelqê ra bêhêlî...

-Heyran, hela ecêva dinyayê...Wê mîlet li hev ketine...Er kes ber bi mîletê xwe, welatê xwe, dewleta xwe direvin...Em vê navê mane bê xweyî, bê xwedan, bê pişt. Kes me temûl nake, bavo! Kes me nahewîne...

-Mirovê bê pişt, Êlî Şêrê Xwedê be jî, tiştêkî nikare bike...Piştê me tune, pişt!

-Mezelê bavê min li Wanê ma, Dayka xwe min li Nexîcêvanê kirne çel, gora apê min li Ermenistanê ma...Jina mine ewlin: Xwzala feqîr, belengaza xûşka mine mezin, wextê sirgûna kavla sala 37- a, rê da wefat bûn, saldatê Sovyêtê cinyazê wan hema tirênê da ji me standin, birin.

Ez jî nizamim kirne li nav axa kî welatî...Birayê minî mezin sala 1938-a am-tam girtin, bê ser û berate birin, çû, nehat, birayê wî korbe.



Birakî min, du kurap, kurmet birine şerê dijî hîtlêr, venegeryan, axa Qazaistanê da apê mine, birakî mine, jinapa mine...jinbira mine din axa Ûzbêkstanê, ya din Krasnadara Ûrisêtê, ya din Bekûyê, nebya min, bûka min Yêrêvanê, keça mine biçûk li Tilbîsê...Ezê bikevme nava axa kîderê, nizanim...Yazî û aqûbet jî wa dibe, heyran...

Hazira serê xwe kiribûn ber xwe, tizbî û cixare dikşandin. Gotinên gişka jî rast bûn, gazinê gişka jî cî bûn:

-Vê dewra nerehet da kê gazina, kul û derda dipirse?...Her kes kara xwe digere, her tişt karê da ne...Eger kara dewleteke xurt me: Kurda da jî hebûya, wê ji me jî xweyî derketana...Ya me maye alyê Xwede da, Xwedê jî em ji bîr kirine ... Heve ronayî hema li ser welatê me da vebûya, me yê jî bîna xwe bikşanda...

-Welat devê guradane, bavo...Tirko bûye gurê har li Kurda ketye...Xwedê xêr bike...

Mistê rîspî li serê jorê rûniştî bû, pişta xwe kutabû belgî, qulap ji pey qulapê cixarê dixist, pêra jî tizbî dikşand. Rû va teyê bigota kalê rehetê, lê dil da kûrma agirê gur bû, alav li dil ketibû, şewatê kezevê girtibû, lê bû he'ben tizbîya nava tilyê xwe da bipelçiqanda. Dilê wî digirya. Li ber xelqê nedixwest êşa dilê xwe eyan bike. Bi kela dilê xwe nedixwest êş û jana dilê kura û nefera gurrke. Dixwest ew derdê mezin li nav xwe da bixeniqîne, şîna nebya bi maqûlî derbaz bike. Jîyanê ew hîn kiribû, ku li ber derbên emir e giran teyaxke, wan dilê xwe da bikuje. Emir da pir rojên wa yê bi êş û birîn dîtibû, gelek dijwerî û zulm derbaz kiribû. Lê eva derbeke xeder bû. „Mala cegerê bişewite, ji êşa cegerê xirabtir tu tişt tune. Êşa kezevê zulme...Nebî jî şîrinin...“

Neh nebyê kalê yê kurîn û heft keç hebûn, nebîçirk gelek bûn... „Kes cîyê kesî nage.Kîjan tilyê jî jêkî êş yeke. Her kes cîyê wî heye. Kê diçe cîyê wî vala dimîne...“ Çevê kalkê we kor be, lawno! Hûn mirazê xwe şa nebûn...“

Salê meh-meh nîvekê pîrka Huc hildida diçûne Yêrêvanê, Bekûyê malên kura. Halê herda jî xweş bû. Heval, hogir, pismam, der cînar, kurmanç, ermenî, azerî li wan dicivyan, teglîfî malên xwe dikirin, kêf, eşq, şayî bû. Xelq şîn-şayî, tngasî - fireyê hev bûn, dost û pismam bûn, kirfî û serdewatî bûn, kê buhar dikir dinyayê wa welgere, li hevkeve, cînar, dost, bira, pismam, heval-hogerê bivine dijmin, neyar... Miletê bivine dijmin...

Salê dewyê jîyan pir xweş bûbû, xwe jî dixwest mal barkira biçûya Ermenistanê, bal lawê mezin, bigîhîşt qewm-pismaman...

Nebya dora wî digirt, eşq û şabûn dikete malên kuran. Lê ew herd nebî qet ji kalik-pîrikê nediqetyan. Havîna çûyî, dema rehetya xwe herd jî hatibûne vira...Bedew, bilind, xurt, rem... Tayê bigota bejin û bala wan bi qelemê kişandibûn...Herda jî duxwendin, zanîngehê bilind da bûn, herd jî dergîstî bûn... “Me karê şaya we dikir...We çî anî serê me...”

Kalê li Krdistana Bakûr, gundekî biçûkî nêzîkî gola Wanê hatibû dinê. Sala 1926-a malbeta wan jî tevî gelek ji çemê Erez derbaz bûn, revîne welatê Sovyêtê. Li qeza Nexîcêvanê xwe ra gundekî vala şên kirin...Wê demê êdî xort bû.

Lê çima welat hîştin? Miletê xwe hîştin,revîn? Aqilê niha bûya, çî zulm jî hebûya qet qeleta usa dikirin?..

“Birçî bî birçiyê welatê xwe be. Şivantîya welêt padşatya xerîbyê çêtire...Yê ji axa welatê xwe qetya unda bûye. Peza ji kêrî qetya zû-dereng xwure gur-dizane. Teyreda ji refa ma, rê şaş dîke û di nivê rê da dimîne...Cew, ku dicê digîhîje çêm, çêm gur û xurt dîke, lê cewa ji çêm derdkeve hêdî-hêdî tenik û zirav dibe, bere-bere dimiçiqe, diçike...Em ji welatê xwe dûr ketine...Rêyê vegeerê nayêne xwenê...Dewya meyê çawa be?...“

“Ji hewasê em ji welatê xwe derneketin. Em ji zulma Roma reş revyan, zulma Tirko! Em qir dikirin. Îro jî halê Kurda Kurdistanê da usa ne...Kurd jî welatê xwe direvin. Kurda bi zorê ji welêt derdixin...Gund- bajara dişewitînin, vala dikin, bêkurd dikin...Îro jî, îro jî, îro jî... Çekê here xieav dijî Kurda dixebitînin, qezîyê lape xirav tînine serê Kurdan...Kurdistan bûye doje, xûn dikşe...Çima, çima, çima?-di serê Mistê Kalo da zingîna wan peyva bû...Bersîv tune bû. Gişk pirs bûn...Pirs pirs bûn, caw kê... “Êvarê li nav daristaneke Afrîkayê heywanekê bê îzin dikujin, sibê temama cihan pê dihesê, dikin hewar û gazî...Lê eva çendik çend salin heçar dewletê xwûnxwer kurda qir dikin, Helebça çê dikin, tê bêjî guhê cihanê ker bûye...Kes nabihî! Kes navîne!”

„Ax, xwezi meytê min li ser milê ewleda, bibirana, bikirana paşla axa welêt...Kê zane ezê jî li serê rîya kîjan welatî bimînim,-kalê ketibû li nav mitalên kure dilêş, teyê bigota civaka li dora xwe bîr kiribû û dilê xwe da dikewgirî...“

-Xalê Mistê, te dinê dîtye, em tev tîn şewra xwe li te dikin. Te negot lawno, hun çima sekinîne, benda çî mane? Rabin, barkin werên bigîhîjne me, heyran, - nebyê xûşkê, ku ji Ûzbêkstanê, bajarê Taşkêndê hatibû, kalê ji nav xema derxist... Kalê li civaka dora xwe nêhêrî: “Xelq îro tev hatine seva sersaxya me, min jî xwe unda kirye. Lê kê yê vê ometê verêke? Kê yê bîne bide ber dilê lawika?”- kalê fikirî, demekê xwe ker kir, paşê vegerya li ser xwezîyê ji Ûzbêkstanê hatî.

-Birê min, xalo çî zanibû, ku felekê me ra xyaneteke wa bike, xweyîn derkeve... Me

got tevya zîpikê ye, wê derbaz be. Yêrêvan nêzîkî welête. Dibe rojekê dergê xêrê me ra jî ji wur ra vebe. Kê bihar dikir welatê Sovyêtê hilşê...

-Wura qet me tê dernedixist, ku em xerîbyê danin...

-Welatê ku şerr ketê gerekê meriv jê bireve...Kesî xêr ji şera nedîtye...

-Lawikê me çûn rihîna de'wa xelqê...

-Tev xeberdane,bavo! Lê ev rojê pêşya kê bûya?..

-Her kes li ber roja xwe ye. Her kesî ra tiştê dibe menî...

-Dema roja mirov hat, bikî qutya pola jî xilazbûn tune...

-Kurê Arifê Nûrî, wê rojê, xort, beng benga wî, li nav bajarê me da avtyê lê da kuşt...Xwe ew jî neçûbû şerrê Qerebaxê...Roja mêrik hatibû, canim...

-Xwedê ji me ra wa xwestîye, heyran...Heta axryê jî ha, ha...

-Mala we ava be. Hûn her tiştî Xwedê va girê didin. Rebê min dibêje: “We hreket, min bereket.” Wekî bereket hebe gotî em jî hevki hereket bikin...

-Xwe gunekar nekin, her tişt bi qirara Rebê mine...

-Ez qurbana qirara Xwedê me, Selahêdînê Eyûbî nîvê dinyayê kire destê xwe. Erebstana mezin çê kir, bira bigota xelqê min jî gune ye, eva gave erd jî wan ra...Êdî ji wî mezintir û zortir kes hebû? Salhêdîn Kurd bû tişt seva Kurda nekir... Niha em her bêbextiyê xwe kerema Xwedê va girê didin...

-Dema Selehêdîn usa dixwest... Musulmanî bû...

-Çima usa dixwest? Musulmanî bû, Kurd jî musulman bûn...Bira dewleteke Kurdên musulman jî hebya... Çiqas usyanê Kurda rabûne, tev bi destê kurda nehatine hincirandin?

-Niha jî ew çîroke. Kurdistan bûye cîyê qoriçîya, hizbûleçîya, xweyîn û neyara...Gelo ew Kurd nînin?...Ew jî qirara Xwedê ye?

-Ûsyana Dêrsimê da dijmina Kurd rakiribûn dijî hev, serê wan tije kiribûn, giva di serê Kurdê zaza da xaç heye, zaza, elewî dijminin. Kê serê wan biqelêşê xaç jê derxe wê here cinetê... Digotinê Êzdiyan bikuje wê here cinetê... Serê hev jî qelaştin, xaç jî nedîtin, çinet jî nedîtin... Lê kolety xwe qahîmtir kiin. Cenimê da man... Tirko mêr-mêrxwesê wan jî birin darda kirin...

-Çima ya Şêx Sehîd, Seyîd Riza, lo ya Qazî Mehmed...Ezê kîjanê bêjîm,kîjanê bihêlim... Xweyînê me pirin, bavo! Xwedê koka wan bîne...

-Miletê dijmin, neyarê wî pirbin, xweyînê wî jî wê pirbin. Dijmin xweyîna mêriv li nav têtê simêlê mêriv da dest dixê...

-Heçar alya va li kurda hatine hev, kurda qir dikin...Musulman Kurda qir dikin...Dinya musulmanyê bêdenge...Tê bêjî kurd muaulman nînin...

-Nahêlin Kurd hema bi zimanê xwe duaya xwe jî bike, heyran...

-Kal-bava me ra tiştêkî xêr, mîrateke qenc nehîşt...

-Wan jî we'de da, xwe ra hema cîyê lingekî e'rd hildana, dorê bibûna çeper, bigotana: „Eva jî e'rdê me ye.“ Emê jî îro rabûna, biçûna wur, qenc - xirav lê sitar bûna...

-Îro navê me yê jî li nav nava da hebîya, dngê meyê jî bigîhîştê dinyayê, pişta meyê jî qewî bûya, wê me ra jî hesav rûniştana...

-Bo kerbin, canim. Kal-bava tişt nekirine, we kirye!..Hela bikin bira xwe kal-bava çiqas xûn rêtine...

-Gêncê niha tiştêkî naşêkirînin, bavo!

-Tifaq tune...Bêtifaqyê heta îro jî mala me şewitandîye...

-Her axakî, begekî, dîndarekî xwe padşa hesav kirine. Kesî li ber kesî danexistîye...

-Zor dane kulma xwe, qafê xwe nedane xebatê...Kes seva xwendina millet nefikirye...

-Qebîla em ji hev tîş kirine. Ola ruhê miletyê li nav me da kuşîye, xûna me, fikira me herimandin...Bira hev bûne dîn dijmin...Me nanê hev heram kirye. Kuştina hev helal kirye...Ji hev nazewicin...Êdî ev milletê çawa bive yek?..

-Miletçiyê ermenya Êzdî ranekirine rûyê me...Pak bû zanê wan pir bûn...

-Heta niha jî em şûrê dîn li fêza şûrê miletyê da girê didin...

-Nezanyê, cahiltiyê mala me xirav kirine...

-Em milletê qelem-deftera nînin, em milletê axa, bega, şêx û mela ne...Xebera axa, beg yan şêxekî nezanî nexwendî, cahil li nav êlê da zêdetir qedir û qîmet didinê ne ya alimekî, zane, u'ldarekî...

-Me xelqê ra dewlet, koçk û sera, qesir çê kirin e...Lê xwe ra zilek jî ne daye li ser zilekê. Axa, beg, şêx û melê me Mistefa Kemalê kor hildan danîn li ser textê Tirkîyê...Misto jî rabû bû neyarê koka me, çiqas parlamêntar axa begên kurdaye wê demê yên piştgirya wî dikirin gişk darda kirin...

-Me xûna xwe ber gelek da rêtye lê nehatye şêkirandin...

-Nanê me da xwê tune...

-Em qencî-xiravya xwe nizanin, bavo...

Ji qunc u werê Sovyêta berê bira, pismam, nas û dost, hatibûn li dora Mistê Kalo civya bûn, diaxivîn, derd û kulê xwe ji hev ra digotin, dilê xwe li ber hev vedikirin, kêmanyê xwe didane rûyê xwe...Ji pey hilweşîna welatê Sovyêtê ra her yek revya bû derekê...Pirobilême jîyanê wan giran û pir bûbûn... Li serê wan rêyên xerîb, nenas, dijwer şîrnayî û pêwîstiya welêt nû tê derdixistin.



Kalê nedixivî, ew dilê xwe ra ketibû şêwre:

“ Erê, gişk heqin, rast dibêjin. Pêşyê me jî wa axivîne, me jî, dema xwe da, gava em sirgûnî Qazaxistanê kirin wa xeber dida. Îro, dîsa lawik bi wî derdî dinalin, dinalin, ewledê jî wa biaxivin. Lê feyda çîye? Dersê em ji jîyana xwe hîlnadin... Heta kêr nagîhîje hestî ...”

Elî û Egît egle dibûn. Hazir tev kurap, kurxal, xwerzî, birazî, kurmet, zeva, xizm, pismam, gundî, cînar bûn. Her yekî rîya rojekê-duda dabûn e ber xwe, seva nav û qedrê wan, hatibûn... Gerekê bi qedir-qîmetê eşîrê wan verê kin... Kes gerekê bê qedir ji mala me neçe... Çiqas jî derd girane, lê gotî e'rf-e'detê kurmançiyê jî neyên bîrkirin. Her tişt derbaz dibe... Mêvan çawa hatine wê usa jî herin. Qedir- qîmet dimîne. Êşa kezêbê...

Nebyê xûşkê: Ebdil Barî li rex rûniştibû. Xwerzî ji bajarê Taşkêndê hatibû, li wur dijît. Karekî bilind da dixebitî, li nav kurdên wê deverê da naskirî bû. Ûzbêka jî berî kurda dan ji cem xwe derxistin, lê xwerzî hê tenê li wur mabû... Muxdarê du sala bû hev nedîtibûn.

-Hazir tev li ser serê min, ser çevê min ra hatine, - kalê dest bi axaftna xwe kir.

-Xwedê îmanê bide te. Em xulamê te ne, bira destê mezinên wek te tim li ser serê me kêr nebin,-hazira bersîva kalê dan.

-Ez heyrana gêncê me, şikir gêncê me pirin. Bira gênc mera xweşbin, ji qezya dûr bin,-rîspî gotina xwe berdeyam kir,-me vê jîyanê da çî zolm û zordestî hebû dît, emê gazi Xwed û Pêxember bikin bira gênc nevinin. Hûn tev jî bême'ne-bêgune min ra ewledin. Xûşk şîrinin. Ji Ebdil Barî yê min, nebyê xûşka min, bîna Sosina xûşk tê. Sosin ji min ra tek xûşk nî bû, dê bû. Sala 37-an, ew sala xezev, dema em ji Naxîcêvanê sirgûnî vira kirin, payîz bû. Em çar mal, nefera, hûr-mûrê me va kirine vagonekê (beşekî tirênê) û berê me dane vira. Mîna niha nî bû. Niha xelqî zane ne, çev vekirî ne, rê-dirba, zimana zanin. Me tişt nizanbû. Me nizanbû, çima û me ku da dibin. Vagonê da mala me bû, ez kurbim, mala Sosina xûşk bû, ya Siloyê Ûsiv û Evdiyê Ayîb. Ew herd mal giran bûn. Ji wan her yek bawarkî deh-donzde nefer bûn. Payê pirê jî zarok. Birayê xalê xwe, vagonê da ji mala bavê te remetya pîrka teye Sosin bû, kalkê te: Emerê zeva ew muxdarê du sala bû çûbû rema Xwedê, Hesenê bavê te bû, herd birayê teye mezin :Sano û Etar, Şema xûşka te, tu jî destê Zibêda bûk da bûyî. Neferê min hindik bûn.Ez û Huc bûn, Egît ketibû sala çara, Elî jî dest Hucê da bû. Elî û tu berxê rojekê ne. Elî berbangê bû, tu berêvarê. Hûn herd jî bi şîrê Hucê mezin bûn.Loma hun usa pir hev hiz dikin...

-Ez korbim seva dilê Elî û Egît...

-Bira kalkê wan kor be, - kalê dîsa cixare vê xist, heta wî hebû dû kişande li nav qefesa xwe, gilyê xwe pêşda bir, - ez û Hesenê bavê te jî hevalin. Sosina xûşk pir ji min mestir bû. De ez û kurê wêyî biçûk berxê salekê ne. Em çar mal, nefera, hûr-mûrê me va kirine vagonekê (beşekî tirênê) û berê me dane vira. Mîna niha nî bû. Niha xelqî zane ne, çev vekirî ne, rê-dirba, zimana zanin. Me tişt nizanbû. Me nizanbû, çima û me ku da dibin. Vagonê da mala me bû, ez kurbim, mala Sosina xûşk bû, ya Siloyê Ûsiv û Evdiyê Ayîb. Ew herd mal giran bûn. Ji wan her yek bawarkî deh-donzde nefer bûn. Payê pirê jî zarok. Birayê xalê xwe, vagonê da ji mala bavê te remetya pîrka teye Sosin bû, kalkê te: Emerê zeva ew muxdarê du sala bû çûbû rema Xwedê, Hesenê bavê te bû, herd birayê teye mezin :Sano û Etar, Şema xûşka te, tu jî destê Zibêda bûk da bûyî. Neferê min hindik bûn.Ez û Huc bûn, Egît ketibû sala çara, Elî jî dest Hucê da bû. Elî û tu berxê rojekê ne. Elî berbangê bû, tu berêvarê. Hûn herd jî bi şîrê Hucê mezin bûn.Loma hun usa pir hev hiz dikin...

Ça min wa ra got em çar mal vagonekê da bûn...Em mîna malekê bûn. Nan-av, kirin-xwerina me gişk tev bû...Hemin vagonê din da jî gişk gundyê me, gundyê dorê...Lê saldata** nedihîşt ji vagonekê yek derbazî ya din bibe. Çek destê wan da li ber derya sekinî bûn... Her çar malê me da jî zarokê virnik hebûn. Dayka te: Zibêda xûşk, ez korbim seva wê canikê,meriv heyr-hijmekar bû Zibêdê, bejin-balê, delalyê, rûnermyê, şuxul, emel binhêrya. Nav, namûs, hurmet, qedir... Sosinê pir hij ji bûkê dikir.

Niha zarokê hecar mala jî pirin, deng didine hev digrîn, ne cîyê bêşikê heye,ne mirov dikare, wan hemêzke bigerîne. Ne ave, ku paqiyayê xweyîkin...Sar, dîwarê vagonê qeşa girtine...Me zarok li bav nivîna da pêçane, destê me dilê me da nişkêva nexweş nekevin...

Roj bi roj hal çiqas diçû xirav dibû. Rê jî dewî nedibû. Xwerina pak tune bû, paqiyayî tune bû, meriv zikêşê diketin...De îsan, nan xwer, av xwer, haşa cîyê destavê, hena cîkî telde çê nekiribûn...

Çawa ku maşîne (tirên) disekinî, xelqê xwe jê davîtin...Zulm bû bavo, zulm anî bûn li serê xelkê...

Êvar bû. Bû çîrîna maşîne li nava rastekê da sekinî. Hesen û Zibêde jî vagonê peya bûn. Ez jî peya bûm.Timê maşîne êmekî xurt disekinî. Vê carê bû zûrîna wê û nişkêva, zû rê ket. Hêwarze xelqê peyabûyî ket û ber bi vagonên xwe banz dan. Saldata jî hindava xwe da xelq dane ber quntarê tivinga, ber bi vagona defandin...Hew min nêhêrî bû zarîna Hesenê me, tepa da serê xwe...Zibêda feqîr ketibû bin maşîne...Em lê civyan. Me cinyaz hilbirî vagonê. Rojên şipûk me dîtin, bavo. Sehetek jî nekşand, saldat hatin, cinyaz ji me standin, birin. Li ku kirin çel ? Çawa kirin? Nizanim! Eh...di nava wan çend rojên rê da tek ji gundê me bawarkî bîst- bîstpênc nefer ji destê me çûn...Mal çûne li ber mîratê, jin bî man, zarok bêxweyî man... Mezelê mirya jî tune...Çîroka me dirêje, bavo...Çend meh pey ra Stalîn kulmeke din jî li serê me da, payê malxê mala girtin, bê ser û berate birin unda kirin...Ustyê neferê wan xar bû. Serê rê dirbê xerîbyê man bê xweyî-xwedan... A, zulm ev bû bavo...Lê wî xelqî yê çî bigota...

Teyê bigota kalê serê gizîka gilya girt. Êdî zanibû, çawa wî derdê giran derbazke, çawa ber dilê kurra da bê...

-Apê Mistê, Xwedê him derd dide, him jî derman, Him ewleda dide, him jî distîne. Helbet dibe Rebê jorîn ji me pirtir ji wan hiz kirye,-Mela ji ber xebera kalê da hat.

-Gelî bira - pismaman, we îro wa ji me pirsye, ez û kurên xwe ji bo şaya derê we vekin...Me derdê wa pir dîtine, me ji ber rojên xezev teyax kirye...Bermiraz bûn, kalkê wan kor be...

-Xwedê sehetê û îmanê bide te apê Mistê...Em korbin seva dilê we...

-Bira kom xweş be...Îro serxweşî ya we tevane...

-Hela ecêva dinyayê...Kurê Egît, kurê Elî, kurapê hev, birayê hev, xûn-qînêtek... Dêm-qerefat, bejin-balê va jî tê bêjî kerê sêvekê ne...Herd jî xwendevan, dergîstî, yek alyê ermenya da, yê din alyê azerya da çûne seva QEREBAXÊ dijî hev şerkin. Qerebax ku, em ku? Rojekê da jî şihîd ketine...Ê, bêje bavo, çî me vê navê...Çima?

-Me serê xwe li ber ewqasa da daye...Cîyê vala...Niha kara me tê hebya?

Ji oda din dengê lorîna jina dahat. Pîrekekê, kula dilê xwe ra digirya û distira:

Bayê Qerebaxa wêran, çiqas sare, dilîline,

Ev çî caweke nebixêre vê payîzê me ra tîne,

Dibên her du xortê tûre, her du şêrê mala Mistê Kalo,

Meydanê da birîndarin,

Gula xweyîn, çar birîne wan dêşîne..

Kesekî xwedanê xêrê tune cawê bive Mistê Kalo ra,

Bê mala te şewityo, xwe wan ra bigîhîne,

Here xwe bavêje li ber bextê

Hekîm û doxtiran, belkî birîne bermirazê te bicebirîne...

Hey lo bavo, hey lê dayê,

Hewar dikim, hewar nayê...

Axî ji dilê zilama dihat: „Îcar du mêrê çawa ji piştî me çûn...”

-Heyran çî me li vê navê...Mêrê me çima gere seva Qarabaxê bên kuştin...Gor bavê ermenya û azerya...

-Xwedê me ra usa xwestye, bavo, li kî derê gulek biteqe, wura xûna kurda ese gerekê birije...

-Lê çawa dixwezî, wextê welatê xwe da nînî, li ser erdê xelqê dijîyî...gerekê ber wan da jî serê xwe bidî...

-Tu bêjî neheq kêne? Ermenî ne ? Azerî ne ?

-Heyran erd erdê Xwedê ye... Xelqê xwe ra dijît, da...Ermenî rabûn...

-Ermenî dixwezî her welata da bijîn lê naxwezî kes nava wan da bijî...

-Ax derdê mîletçiyên wan herd mileta...Jer bûn, jer.. Xelqê wek bira ji hev kirine dijîminê qaneqanê..

-Azerya li bajarê Sûmgayîte ermenî tev qetil kirin...Lê ew tiştê kirinê bû.

-Neheqya herd terefa jî hebû...Ermenya jî kêr nanî serê aziryê Ermenistanê, heta sed gund xirav bûn...Niha jî ew dew bûye girê bê derman ketye canê herd mîletan...

-Wê navê erdê me jî heye...Dibêjin berê-berê da Kurd li wura jîyane.

-Dewleta kurdaye Xaltya hela berî bûyîna Îsa vê heremê hebûye, paşê ya Şedetya çê bûye. Her yekê sêsid-çarsed salî kişandîye...Niha kes navê me nadin...Hemin ew her çar nehyê me, ku berê-berê da cîyê kurda bûn ew jî bûne qurbana Qerebaxa ermenya û azerya...

-Sovyetê her kes kirin xweyî dewlet, çî me hebû dest me çû. Em bê par nav her tiştî derketin.

-Lo salê bîstî-siyî ew war kiribûn qeza, jêra digotin : KURDISTANA SOR.

-Paşê li nava wîjdanê “ birayê” meye azerî da Kurdîstana teye sor unda bû, çû...

-Em lê nebûne xweyî...

-Van salê dewyê me kir-nekir tişt lê derneket...

-Temamya gelê kurd Kurdîstanê da rabye nikare mafekî xwe ji Tirka bistîne... Azerî jî ji wan xiravtirin...

-Eva şêrê Qerebaxê jî hema li Kurdîstana sor da dibe...

-Ermenya Kurdîstana weye Sor şewitandin, bêkurd kirin... Ew nehî ketin destê Ermenya... Dibêjin gunda da kevirê dîwara çîye, kevir jî nehîstine, tev bar kirne, birine... Gund-şên tunene...Kê kuştine, hemin kuştine, yê xilazbûyî jî li nêzîkî derya Kaspîyê (Xezarê) li bin konê nêylon da hêsîrî, nemir-nejî dijîn...

-Çendek pêşda ez rasiyê Xelîlê Remezan hatim. Mêrik hema raste rast li nav civakê da got: „Dibê, azerya bi qestî ew nehyê Kurda dane ermenyan, ku ermenî berî kurda din li wur derxin, paşê dîsa wê paşda bidine wan ... ew ji dew û pîrsa kurda xilaz bin...”

-Niha weke mîlyonek kurd Azeyrêcanê da hene...

-Lo ji wan sedî nodpênc xwe kurd nas nakin...Ziman nizanin, şerm dikin bêjin ku kurdin, helyane, çûne. Li wan nehyê Kurdîstana sor da jî kurdîyatî ne mabû...Welgerya bûn, çûbûn...

-Dema Ermenya ew qetla xwe li nehyê kurda da kirin, gişk wêran û talan kirin, ku ji dinyayê wê zulma xwe veşêrin, gazî xwendevanê kurda kirin, gotin wan: „ Werin me Kurdîstana weye Sor aza kirye, herin lê bivin xweyî...Lawika jî çend avtobûs tije kurd krin, bi def û zurne, bi heytehol çûne Laçînê... Dora kelefê Laçînê govend girtin, reqisîn, sirûda Kurdîstanê gotin, ala Kurdîstanê bilind kirin, helbest



xwendin...Paşê bi keser pê hisyan ku ew tev xapandine, xapandine...“
 -Ermenya dixwestin kurdê li cem xwe bivin bikin wur...Gazî yê vir jî dikirin...Gelek lawkê me jî wan ra razî bûn...
 -Ku alîkî azerî lêxin, alyê din va jî ew...
 -Lê em çawa bikin? Erdê xwe bidine xelqê? Hema wa bê cî û war bimînin?..
 -Rastî li nav gotina wan da jî hebû...
 -Em gerekê salê sîyê wî erdî bibûna xweyî...Em gerekê wê demê xwe bibûna xweyî ku asîmle nebûne, nebûna azerî...Niha jî bi seda hezara Kurd dibin Azerî...Aş çûye, pey çeqçe qetine...
 -Gunê xwe em dikine ustyê xelkê...
 -Bavo, e'rdê me ji Mihabadê girtî, diçe digîhîje Qamişlo, Mûsil û Kîrkûkê...Ji Efrînê girtî tê digîhîje Qersê...Milet rabye, dewa welatê xwe dike...Em gerekê qewata xwe bigîhînin qewata wan... Xortê me dewsa li Qerebaxê, bira seva azaya Kurdistanê şihîd bikevin...
 -Gerekê em dewa welatê xwe bikin, herin welatê xwe...
 -Tirka, ereba u ecema jî hema hîştin, ku tu herî welatê xwe...
 -Em gerekê dengê xwe bigîhînin koma mileta...
 -Kes dengê me nabîhî, qurba...Mirovê pişta wî tune, kes wî nabîhî...Koma Mileta jî, NATO jî birayên Tirko ne...Hezar hev welatê Ereba hene wê bihêlin Kurd çevê xwe vekin?
 -Rûyê me gerekê rûyê wan qalimtir be. Heta zarr negrî, dê jî şîr nadê...
 -Çevê derya, xwelî serya...
 -Niha ya me hîmlî ewe, ku em zimanê xwe, e'rf-e'det, dê-bavê xwe, kurmancîya xwe bîr nekin,-rîspîkî xwest serê gilya bigre,-Ji pey mirna Stalîne zulm ra, êla meye rengîn Kavkazê da civya bû, gişke li ser hev bûn, hewasa mirov wan ra dihat...Xortinen pêş derketibûn, gişke xendî, serwext, xweyî nav...Felekê dîsa bobelûsk li me rakirye...Em ji hev bela bûne...Her malek avîtiye li qunceki dinyayê. Gerekê niha miqatî millet bin, heta ev bager derbaz dibe...
 -Kurapê min rast dibêje, - Mistê Kalo xebera rîspî berdewam kir, - dibêjin: “Mirin emrê Xwedê ye, lê mirina kal-pîrê mîna me li ser kulekê ye.” Bira Xwedê min heyrana ciwana ke.Temya min weye qatî tifaqa xwe û nav-namûsa kurmancîyê bin...Silametî welat jî çê bû herin bigîhîjne refê xwe...
 -Mekteba me tune, kitêba me tune, radyo û tîlêvîzyona me tune, de werên kurmancîyê xweyîkin...
 -Xeletyê me jî pirin...Mirov eyba xwe nede rûyê xwe xelqê bide rûyê mirov...A, binhêrin piranya me malê xwe da kurmancî na axivin...Em şîn-şayê xwe jî kurmancî nakin...Ê, êdî em gunê xwe dikine ustyê kê?
 -Lê zewac? Hela dora xwe binhêrin. Kê ji milletê din dizewice, sedî nod unda dibin diçin...
 -Kurdê Azeyrbêcanê usa unda bûn...
 -Zewac dihelîne. Erê bira, ez dema carna diçime Bekûyê mala birê xwe, zarokê wî , jina wî, mala wîye rengîn dinhêrim agir dilê min dikeve...Tiştêkî kurmancî mala wî da nemaye ...Ez nikarim dirêj li cem bimînim, ji mala wî direvim...Dixeyîde...
 -Mehmedê Ebdûl, giva serokê meye, pênc bûkin, gişk jî Azerîne, nava Bekûyê da dijî. Neferê wî yek kurmancî zane? Ji kurê wî kîjan dibê ez Kurdim? Keçeke xwe da Kurda? Niha jî tê nav me gewrya xwe diqelêşe: Ha Kurd! Ha Kurdistan! Ez gazin û gotinê usan bawar nakim, na!
 -Kurdê meye Êzîdî, eger ji miletekî din bizewicyana niha kitek ji wan nemabû...
 -Hişê Kurdên êzîdî hebya, zewaca xwe teng nekirana, niha ew jî pir bûn...Kê ji dînekî din zewicî, dibên Êzîdî nîne. Ji nav xwe derdixin...Kanî bin jî wê biçikin...Dewya wan jî hatye...
 -Tê xwe ra dibêjî...Eva dusud sale Êzîdî li Ermenistanê, nava Ermenya da nehelyan,unda nebûn...Kurdê Azerbêcanê payê pirê unda bûn, çûn...
 -Qewl-qanûnê xweyîkirina miletyê li cem Êzîdîya berkin...
 - Xerîbyê da, zewaca usa mecala xwe xweyîkirnê ye, bavo!

Li devra bû hêwarze. Gotin, ku Elî neferê xwe va hatin. Mistê kal, şêx, mela, çend rîspya va rabûn, drketin devra, pêşya Elî, nefera. Hazira dane pey wan. Li ber dêrî, bi edete eşîrê, hevra “ bira” kirin, bi desta serê xwe xistin, pêşya Elî û nefê wî da çun. Hewşa malê da çûne rûyê hev. Bavê û kur, demeke xurt, hev hemêz kiribûn, xwe da dikelyan. Teyê bigota derdê giran dilê xwe da cî dikirin, ku nava xelqê da wê êşa şewat zef dîhar nekin...
 -Bavê te kor be, lawo!
 -Bira kurê te korbe, bavo!
 Paşê dê û kur hev hemêz kirin. Hêsir ji çevê Hucê dibaryan: „ Ez qurbana dilê te me, lawo! Bira ez qurbana berxê mala xwe bûma, min ev roj nedîta...“
 Hazir û hatî yek-yek çûne rûyê hev. Mêr çûne oda mêra, jin jî ya jina...
 Sûretekî xorta yê bedew, li nav gevezeke nû da pêçayî anîn. Kalê hilda, hemêz kir, ramûsa, sîngê xwe va guvaşt. Hêsir li ser sûret da barîn. „ Kalkê te korbe Têmur, birê min! „, Hazir jî bi sirê rabûn sûret ramûsan.

Paşê sûret danîne cîkî bilind, ku teva va bê xanê. Li bin sûret da bi zimanê ermenî nivîsr bû: „,TEMÛRÊ ELÎ MAMÊDOV 1970-1994 „,
 -Têmurê min zanîngeha Yêrêvanê ya doxtiryê da duxwend,-Elî qulapeke xurt cixarê xist û gilî kir,-hevalê wî gelek çûbûne şêrr. Muxdarê mehekê ye ew jî birine Qerebaxê. Gotibûn doxtir kêmin. Çend roj pêjda me cawa nebxêr stand. Cinyaz anîn...Çiqas serokê ermenya hebûn gişk li hev civyan hatin mala me, serxweşî dan. Temamya kovar û rojnemê komarê da sûretê Têmur derket, derhqa wî da nivîsin. Rojnema RÎYA TEZE, ya wê rojê, gişk şikilê Têmur û derheqa wî da bû...Tank anîn, tabût dane ser, hezara meriv tov bûbûn, birin û li goristana ŞIHÎDÊ ŞERÊ QEREBAXÊ da veşartin...Hevtêkê da tirb jî bi kevirê mermer çê kirin.
 Pirîzîdêntê welêt xebera xwe ya serxweşyê da got: “ Gelê Ermenî tucar bîr nake efatî û mêranya ewledê cimeta kurda: Têmurê Elî Mamêdov. Ewî e'mrê xwe da ji boy azaya Qerebaxa me.”
 -Ax lawo! Bav û birayê kalkê xwe lawo!
 -Cawa nebxêr me ji Bekûyê jî stnd. Niha Egî ji Bekûyê tîlêfon dike, digrî dixweze bê Yêrêvanê cem min, ez dixwezim herim cem wî...Bavo ji vir tîlêfon dike, lawik, bira, pismam, heval her yek ji qunceki Sovêta berê tîlêfon dikin...Min û Egî qirar kir, bèn vira, li cem Bavo. Şîna nebyê wî bira li mala wî da bive...
 Ji devra caw anîn, ku Egî neferê xwe va ji Bekûyê hatin.
 Kalkê Mistê, Elî, şêx, mela, çend mêrê din va rabûn derketin devra, li pêşya Egî û nefera...
 Hazira jî da pey wan. Li ber dêrî, bû “bira” , “ bira” ya hazira, li serê xwe xistin, xwe avîtne pêşya hev. Êmekî xurt bavê û herd kura hev hemêz kiribûn, ker ji derdê giran xwe da dikeyan. Teyê bigota wê giranyê ji hev pare vedikirin:
 -Bavê we kor be, lawo!
 -Birê te kor be, Elî!
 -Birê te kor be, Egî!
 Paşê dê û kura hev hemêz kirin. Daykê kur bernedidan, dixwest şewat û agirê dilê herda gişk topkîra, bikira nav dilê xwe...Hêsir mîna barana gur ji çevê wê dibaryan...
 Hazir tev çûne rûyê Egî û nefera, li ser hev da giryan...Jin çûne oda jina, mêr jî oda mêra...
 Sûretekî xorta yê bedew anîn. Kalikê sûret ramûsa: „Kalkê te kor be, Xelîlê min, birê min...“ Paşê apê û hazira sûret ramûsam. Sûret birin danîne li rex sûretê kurê apê. Gevezeke bedew avîtine dorê...Li bin sûret da bi azerî nivîsar bû: XELÎLÊ ELÎ MAMÊDOV 1970-1994.
 -Xelîlê min,- Egî cixara xwe vê xist û gilî kir,- wê îsal Ünîvêrsîtêta Bekûyê tam kira. Me nîşan jî kiribû...Karê dewata wî va mijûl bûm. Ew sê meh bû birine Qerbaxê. Çendek pêşda cinyaz anîn. Birîn li ser sîng bû. Serokatya Azerya tev hatin serxweşya me. Kovar û rojnemê rêspûblîkayê temama dereqa Xelîl da nivîsin. Rojnema meye kurdî DENGÊ KURD tamam pêşkêşî Xelîlê min bû... Bi hezara heval-hoger tov bûn û tabûta bermirazê min li goristana ŞIHÎDÊN ŞERÊ QEREBAXÊ da tesmîlî axê kirin.
 Li ser mexber serokê Azeyrbêcanê got: „, Azerî tu cara te ji bîr nakin: Xelîlê Egî Mûradov. Te bi mêrxweşî şer kir û serê xwe danî ji bo azaya Qerebaxa me.“
 -Em kor bin seva herd bermiraza...
 -Em korbin, ji pişta me çûn...
 -Cimeta hazir,- şêx ji cî rabû pîya,- Qirara Xwedê û Pêxember li ser çêvê me. Niha bi kerema xwe kerbin, bira mela Qurana pîroz bixwîne...Bi qanûnê şeryetê em şîna xwe bikin, derecê xwe derbazkin...
 Hazira teva destê xwe li ber xwe girtin, ker rûniştin, mele dest bi xwendina erebî kir. Xwendina kitêba pîroz dirêj kişand...Mela dixwend hazira fem nedikir, westya bûn nizanbûn çawa bikirana ku mele xilaz kira...
 Şêx mirovekî zane bû.Tê derxist, ku melayî xişîme, ji cî rabû, Quran ji destê mela girt û xwest xwe bixwîne, hinkî jî kurmancî şiroveke:
 -Naha jî bi edetê şerîetê, musulmanyê...
 -Lo mala we ava be, - zilamekî axaftina wî birî,- carekê ji bêjin bi edetê kurmancîyê. Du xebera jî kurmancî bêjin da, xwe dinya xirav nabe...
 -Mala me şewitîye, bavo! Hela lê binhêrin, li bin sûretekî bêmirazê me da Ermenî hatye nivîsar, li bin yê din da: Azeyrî, dua û ebûbeta me jî Erebye...
 -Miletek, ku bi dewr - zemana, dua xwe, şîna û şaya xwe bi zimanê xwe neke, bi zimnê xwe gazî Xwedê xwe jî neke...Êdî Xwedêyê çawa bi çevê qec wî miletî binhêre?..
 Ji oda jina pîrka Huc û pîrekeke din digryan, dilûbandin: Zilam ker bûn li alyê oda jina nêhêrîn:
 Huc.-Qerebaxa wêran dinhêrim, ax şerre, şerrî kîne,
 Mîsto, mal xiravo, rabe, destê min porkurê bigre,
 xwe wura ra bigîhîne,
 Xwe bavêje ber bextê apîsêr- qumandarn,
 bê nebyê min nevine ber şêrr,
 herd jî bermirazin, dergîstîne....



Celal Muhemed Emîn(Hozanê Dilzar)

Helbest in bijartî



ji canê bavê Felek re

Bibilo dane nebû
dayende her wek me xeme
em bi xwe êzing û ar in
û yên pişftî bilbilo
dîsa em in
bilbilo şînê te kulkir
rê bibû gopal û dar
rê û deng termek divêtin
deng û laşê xwe te xwar
bilbilê xwey nîv buhar
bilbilo
her derê can û tenê te
kirine xar
xwey nîv buhar
mafer ku dayende
em in
zingara xwîna me
veşo
dengê birîna xwe
te hişt
temê peyvê kesî
neşo
canê Qamişlo wa
xwe kuşt
ji ber tu yî bi xwe
bê buhar
û payîza xemgîn her em in
1997

JI bilûra Mîr Celadet re

erê mîrê min dilê min dibê
pişftî nîv çerxî dilê min dibê
dengê bilûra li ber ga
pişftî ku wendabûn keziyên binefşê
pezê kovî
keriyê mihan
yên dev û zik tijene xwê
di navrasta çemê tede
rawetiyar
guhdidêrin li bilûrê
zimanê xwe navêjin avê
erê mîrê min
erê begê min dilê min dibê
xwezî bilûr bişkesta
lê tu bighaşt çavên
Binefşê
tenê ji cama qirikê
û ji lûla çîmên wê
bilûra xwe veğerandina jîne
erê mîrê min
bela dilê min bilûr be
lê mixabin ewê deng jê neyê
erê seyda(Haware)
lê kanî dengê bilûrê?
(hevala bê hevalan zoazan û çîyan)
û şikeftên binefşê
dengê te ji kû ve tê
erê mîrê min bilû ra te dibê
ezim kaniya jîna binefşê
1997

HEMNIŞÎN

hemnişîna şîniya min vê demê
wêneya te wek dikşîne xemê
qet ji zencîra evîna Zîn Memê
ew nexwest azadiyê da Zîn vekir
wer digel fîrêja heyva min veğer
ma çîye dara evîne bê tu ber
hêsir û dûrbûne êdî jê biger
dilruba homa bi min wek te nekir

tim divêm zencîr û dergeh girtibe
min nexwest dava evîna min vebe
ger peyala mestiyê min kuştibe
kuştina min şahîye gul ger te kir
nû jiyam ez dê bi derdan re bijîm
wek çemên xwe ez bi hêsrên re rijîm
wek xunavan çaxa girîyê te hejîm
nale nal û xama derdan rê vekir
1993

F Yakoub

Ez im



Bejna min bilinde mîna çiya
Sînga min firehe weke derya
Dihatin xwe lê digirtin
Gemiyên nebiya !
Îro hejar mame li ber piya
Lê bila zanibin
Ez im mîna giya
Şîn dibim li ser çiya
Li deşt û newalan
Û li her ciya
Qet namînim li bin bera
Ez im yê şevên tarî
Di kir çira
Li himber zilma dagîrkera
Ez im yê xwe lê girtî
Nebî Nûh
Ez im yê hilweşandî
Kelha zilma Ejdehak
Ez im yê xudanê erd û xak
Ez im mîrê û merdê û pak
Ez im yê mayî
Bê biramak

Ez im yê di qare
Ji dil û mêlak
Ez im yê hezar salî mak
Ez im yê di xwe torak
Bi nanê rikak
Lê qet nabe helak
Ez im dicle û ferat
Hertim bi kar û xebat
Ez im zagros û toros
Kurê Rustem û Behroz
Ez im Amed û Hewlêr
Merdê û mîrê û dilêr
Ez im yê duh û pêr
Îro dîsa dikim xêr
Ez im yê herdem çalak
Li çol û li civak
Ez im yê dimîne
Mîna xak
Qet nabe helak
Gava li ser dinyê
Dibe tofan
Herkes lê dibe mêvan

Azad Ramadan

Ax li min û vê qîzikê



Ax û li min û vê qîzikê
Li wê bejna rind û delal
Ji wan çavê reş û belek
Por di herikê li nav mila
Memik du sêv û pirteqanin
Ez ketme behra evîna wê
Nema dizanim herim malê
Jiyan gelek bi min şêrîn bû
24/1/2013 aind2011@gmail.com

ax û li min û vê keçikê
fîstan li bejnê di edilê
ji wan di weşin dîrên gelek
wek ava çiya di xulxula
lêv sorbûne lê tev dermanin
nema dixwazim jê derkevîm
li ber şîbaka wê dikevîm
bi hevaltiya vê keçikê



Xebat Şakir

Were Dîlber



Were Dîlber ku ez û tu,
Ji bo katdana hêvîyan,
Dirûtina birînan,
Û beşerîna zarokên welatê rojê
li ser destiyê tîfinga azadiyê
hêlanê bikin.

Were ji bo em
Tenahiyê,

Bêtiyaqiyê,
Perçebûnê,
û

Serjêriyê,
di himbêza azadiyê de bifetîşîn.

ji bo em bibin awaza azadiyê

Pênûsa aşîtiyê li ser bedena xaka
pêxemberan, Xaka ku,

bi beşerîna me re dikene li ber stranên me
dîlanê dike

bi evîna me xweşik dibe

û bi vîna me bejna xwe bi azadiyê re dipîve.

Were Dîlber ku ez û tu
Navê xwe li ser bedena

Munzir
Bagok,
û
Sîpanê
binvîsin

hevokên azadiyê li ser eniya

Gare, Qendîl û zagrosan bi xemilînin,

Stranên bi vîna berxwedanê hatine
avdan,

di himbêza welatê rojê de tomar bikin

û ramûsaneke bi helbestên Fexrê Adiyân

û Feqhê Teyran pêçayî, Ji hinarkên

Hesenkêf, Nemrûd û Lalişê bistînin.

Were ku em navê xwe

Hebûn,

Jiyan

û

Berxwedan binvîsin

Were ma tu nizanê Dîlber ku

Em neviyên destananên

Şêxê Pîran, Pîrê Dêrismê û

Bermayên qirkirina Serhed, Botan

û welatê Xaltane.

were ku em bibin qîrîn di guhê tunekirinê
de û singo di sînga bêbextiyê de
de were Dîlber were.

Were ku em çem û rûbarên ji hêstiran
diherikin,

Birûsk û belediyên ji axînan diqîrin

Hêlînên bûk û zeriyan tînan xerakirin

R A W E S T Î N I N.

Were ji bo em nebin teyrikên muhacir

û di hisreta dîtina vî welatî de netengijîn

were ku ez bibim Memê evîna vê xakê

û tu bibê Zîna welatê rojê.

Ez bibim Siyamendê birik ji bo azadiyê

û tu bibê Xeca berxwedanê.

Were ku em Bindestî, Koletî û serjêriyê

ji ferhenga xwe bavêjin û di şûna wan de

Berxwedan, azadî û serfiraziyê binvîsin.

De Were Dîlber were.

09.08.2010 Oldenburg/Elmanya

Ehmed Mustefa

roj.ava2011@gmail.com



Buhara Welat Şêrîne

Ji bo şehîdê kurd bavê Şiyar kemal Henen Efrînî

Buhara Welat Şêrîne

Giyakê sêva çandî bihna xweş jê tê

Dema li welat buhar tê

Û Pirpirîkên şêrîn li ser Gangulokên sor difrin

Dema li welat buhar tê

Û rengê Kevzênsîn li derûdora bîra avê şîn tê

Dema li welat buhar tê

Û dengê çûkên deng xweş, xweş Awaz dibhîsim

Dema li welat buhar tê

Û rengê keskesorê hil tê dema baran bi dawî dibê şêrîn dibê

Dema li welat buhar tê

Û li ser gîyayê şîn min pal dide li wek xeyala tê ber çavê min .

Tuçarî ji bîra min naçe

Dema li welat buhar tê

2013.2.9

*Diyarî ji giyanê nemir Bavê Şiyar re pêşkêş dikim û bejna xwe li
ber gora wî ya pîroz ditewînim*

Bavê Şiyar:Kemal Henen

Ey dilê kurda

Ey Welatparêzê me

Me navê te hilda

Li asimana bajarê me

Serbilindin bi navê te

Û bi hevarekî mîna te

Tê di dilê me de tê bimîne

Mîna wlatekî tê bimîne

Ey bavê Şiyar

Ey Şehîdê Şoreşa Gelê me

Hevalekî kurdperwer zana

Buha bûna te wek axa kurdistan

Bavê Şiyar

Silavê me bighêne Nemir Ismahîl Umer

Ji Cigerxwîn re bêje

Kurd ji xewa giran Şiyar bûn

Dest bûn yek dest

Û birîna kurda bûn yek birîn

Û Leşgerên kurda bûn yek leşger

Ey bavê Şiyar ey leheng û mîrxasê kurda

Tu piştîvanê şehîdê Şoreşê bû

Tu pêşmerge bû tu cengevanek bû

Tu mirovekî zana û zanavan bû

Ey mirina reş te zû ew ji nav me barkir

Her wiha te dilê me birîndar kir

3.2.2013

pirtûkên nû

Hamid Omerî
hamidomeri21@hotmail.com



Hela baş li van çîrokên binêrin



Qesta Kuştinê û Şîr û Şewat bi ya min bi *Sikratên Işqê* re çîrokên herî baş yên Dildarî ne. Lewra pêdiviya honandinê bi vegotinê heye. Di van çîrokên de bi riya vegotinê ji hênêk jiyaneke ava bûye. Çîroka Miho, Kewê û Siltanê xwedî sê deng e. Pêşî Miho vedibêje, pişt re Siltanê ku xwe wek qasideke bêguneh dide nasîn. Di dawiyê de Kewê derdikeve ser dikê. Ev çîrok bi hemû xalên xwe li pey dengê hewes û xwestinê ye. Di vê çîrokê de jî Kewê zewicandî ye. Bi rastî temeziya sor a ku dixwaze demê ji kitana spî paş ve bistîne nûwaze ye.

Lewra bi israra qasidê, Kewê debar nake û tê ji bo dîtina Mihoyî. Di hewşê de beriya ku bikeve hundirê malê weka ku bixwaze bes bi semboleke xwe bigihîne xamatiya xwe; kitana spî ku sembola jinbûnê/zewicandinê ye ji serê xwe dike û temeziya sor ku sembola qîzantiyê ye diavêje serê xwe. Bi vê re Siltanê wiha deng dide Kewê; *"Bi Xwedê tu ji Miho jî dîntir î."*(rp.46)

Di çîroka *Qereçiyek niqutî Dilê Min De* ku navê nivîsara min bi xwe jî ji wê çîrokê xwe dîtîye de tişta balkêş bo min ne tesaduf an jî tewafûqek îlahî ye. Di vê çîrokê de du xal hene ku bibe nebe divê li ser bê sekinandinê. Mamoste di pola xwe de darsa zarokan dide. Helbet li welatê me mixabin rastî ev e ku ders bi tirkî ye.

Li Dû Xezalekê ya Receb Dildarî, ne li pey dengê huzûrê lê li pey dengê hewes û xwestinê ye. Lewma hemû evînen ku di çîrokên Dildarî de rû didin bi talûke nin. Di çîrokên Dildarî yên bi vî rengi de karakter, weka ku naxwazin bibin ji yen rêzê; her û her li pey macerayê nin. Huzûr têra wan nake an jî jê aciz(!) in. Ji ber vê ye ku di çîrokên Dildarî de her çiqas evîn an jî xezalok xuya bibin jî huzûrê di xwe de nahundirînin.

Wek mekan çîrokên Dildar bi bajar, tax, kolan û kuçeyên xwe Diyarbekirî ne. Seyrantepe, Kuruçeşme, Xaçepêk, Kuçeya Hunerê, Cadeya Gewran, Gulistan, Cadeya Ekincîler, Mizgefta Ofîsê...Ji kaniyekê dizên û bi du cihokan diherikin. Herdu cihok bi temamî ne hevpar in; di nav hemû çîrokên de wek mijar hevgirtinek tune ye. Dengê muzîka çîrokên Dildarî sisê nin. Yek jê Şiyar û Şîrîna Min e. Dengê din Lê Dînê ya Ciwan Hacoyî ye û dengê sêyem jî Ayşe Şan e.

Yek ji wan cihokên Kaniya Diyarbekirê ev e ku; kêmasî û hewesa bêyom û bêçare ye. Ew xwe di çend çîrokên de dibîne û em dikarin vê cihokê wek evîna bi talûke jî bi nav bikin. Bireserên hewesê yên karakterên çîrokên Dildar, baş nayên zanîn û xweziya bo wan lewma heta mirinê didome. Di vê cihokê de ji ber ku malumat/zanîn bi temamî ne dest de ye; ne di dest karakteran de ye xweziya wan a bo talûkeyê xwe diparêze. Yanî xezal ne di dest de ne; xapînokên, revokên an jî ji ber ka dê *'xelkê bibêje çi, sîcdarkirina bêtrorebûnê, ji bo ku bav di nav xelkê de neşkê...'* zanîn bi dest nakeve.

»Li Dû Xezalekê

Her wekî Nazdara ku di *Zengilê Evînê* de jî gelek jinên dilgirtî zewicandî ne; yarên wan hene. Zilamê zewicandî jî li ser eqd û beta xwe nasekine. Ev dide xuya kirin ku di edebiyatê de dibe ku her tişt biqewime. Lê ya girîng ev e ka di vegotina xwe de xwe meşrû dike an na. Lewma nêrînen tûj û tund yên li ser 'Dîanayê' divê bi riya xwendina van çîrokên dîsa bîn raçavkirin.

Çîrokên di cihoka duyem de diherikin hin jê dişibin nûçeyên rojane yên ji rûpelên sêyem ê rojnameyan. *Bejna Heyatê* çîrokeke wiha ye. Xapîn, devjêberdan, dizî. Xapîna Apê Sefer melodramatik e.

Li Diyarbekirê ye. Zarokek sê roj berê qeyda xwe aniye dibistanê. Piştî nasandin û teswîrkirina Koçerî, *"Koçer zarokekî esmer bû, zarokekî ku di polê de herî esmer...ji jêr de pora wî bi meqesê hatibû kurkirin,...Tirkiya wî gelek qels bû, berevaciya wê bi kurmanciyê pir zelal dipeyivî."*(rp.18) Vebêjer /mamoste kurd e lewra dizane ku kurmanciya Koçer, 'pirr zelal e' li gor rastiya mamostetiyê tespîtek dike û li gor sazûmanên pişeya xwe ji serî heta binî mafdar e û maqûl e. Heman mamoste/vebêjer di teswîra qotên li der û dora Çemê Dîjleyê de îdeolojiya xwe bi awayek nerm destnîşan dike. Heman mamoste ye. Hela em baş lê binêrin çi dibêje; *"Ew girên ku amediyên (a yê amediyê di vir de piçûk hatiye nivîsîn)lê seyranê dikirin aniha bûne wargehên ekseriya Tirkan. Jixwe êdî kes kelekvanîyê jî nake. Dêrdorên têlên bidirîk ên eskeriyê jî bûne warên xizanên me."*(rp.19) Mamoste/vebêjer dibêje *'...ên me'* Amedê weka ê xwe dihesibîne lê darsa tirkî dide û hessasiyeta ku di hestên xwe de dihundirîne di heşmendiya pişeya xwe de bes li gor şert û mercên mamostetiyê dide der. Kurmanciya Koçerî pirr zelal e bila diya wî an jî bavê wî bîn ku em Tirkiya wî zelaltir bikin! Ne ku qotên seyrê yên ku bûne wargehên eskeriyê dîsa bikin qotên seyranê. Bo xwendinê û bo rexneyê sosyopolîtîka di çi radeyê de ye di vir de diyar dibe. Di van du xalên destnîşankirî de tê dîtî ku çîrok, roman; zimanê me di bin ewrek/zimaneke diyarkirî de ye. Jiyana ku em mecbûr manne tê de bijîn jiyaneke wiha ye. Dor bi dirîtêlan girêdayî ye, darsa tirkî tê dayîn, kelekvanî nayê kirin, qotên seyranê jî ji dest çûne û ji bo ku tirkiya Koçerî qe nebe bi qasî kurmanciya wî zelaltir bibe mamosteyê kurd gazî weliyên wî dike. Belkî bi xwendineke din; ya ku di bin barê zimanê ku ji bal desthilatdaran ve xal bi xal tê diyar kirin de, li vir, bi awayeke din; li gor edebiyata xwe em bi xwe jî di nav metnên xwe de jî bi awayeke zindî 'ê din' in. Bi riya vê çîrokê Receb Dildar rastiyeke me ya xwe di bin ziman û siyasetê de vedîşere şilfîtazi daniyê ber me. Ez wiha bawer im ku çîrokên Receb Dildarî bi riya xwendinên nû dê xwe bidomînin.

Têbînî: me rojnama "Pênûsa Nû" ji nivîskar Receb Dildar xwest ku danasînekê li ser pirtûka wî biweşînin, wî her du nivîs radeştî me kirin. (gelek spas hêja Receb Dildar).

Dumamdin Cegerxwîn, kelepûr û helbesta hevber

(kirim) dixebitîne.

Hemî helbestvanên Kurd, nemaze jî kilasîkan, çi sînôr nexistine navbera zaravên zimanê kurdî, Ehmedê Xanî di şehbanowa berhemên kilasîkan (Mem û Zîn) de, ne tenê peyvên zaravan, belê yên liqên wan zaravan jî xebitandibûn, û her weha Birîfkanî jî di vê helbesta xwe de şeweyê zarava kurmanciya başûr bi kar haniye, û di çarîna dawî de ji dêvla (çavê min) gotiyê (çawêm).

Weha diyar e, ku Cegerxwîn ev helbest bi mebest li gor ya Birîfkanî ristiye, ji ber ku ew helbestên kilasîkên pêşîn berzîrîn û ciwantirînên nimûneya helbesta kilasîk dibîne, û xweziya wî ew e, ku berê hemdemên xwe bi ber wan nimûneyan de bide, ji ber ku awaz bi tenha nikare helbestê bafirîne, belê şewe jî, bi hemî heman û alavên xwe ve, divê, da nivîs bibe helbest, û ji melbestê were cidakirin.

(1) <http://www.nefel.com/articles/articlede tail.asp?RubricNr=2&ArticleNr=5287>

(2) Şox û Şengê. Cegerxwîn: Dîwana yekem; Agir û pirûsk, çapa çarem, weşanxana Avesta,

Istanbul 2003, rûpel 229.

(3) Şox û Şengê. Melayê Cizîrî: El-Eqdilcewherî fî Şerhî dîwanî Eşşeyx El-Cezerî. E. Zivingî. Çapa duwem. Sala 1987. Çapxana Essebah, Qamişlo. Rûpel 481- 486.

(4) Dil ji min bir: Cegerxwîn: Dîwana sêyem; Kîme ez. Çapa yekem,sala 1973, Libnan. Rûpel 229- 234.

(5) Şeva hicran: Cegerxwîn: Dîwana yekem; Agir û pirûsk, çapa çarem, weşanxana Avesta, Istanbul 2003, rûpel 247.

(6) Li kurdistanê kêvî ez: Ş. N. Birîfkanî: Dîwana Ş. N Birîfkanî, amadekirina Zahîd Birîfkanî, çapa yekem, Hewlêr 2002, rûpel 79, 80.

Têbînî: me wek rojnama "Pênûsa Nû" û nivîskarê lêkolînê rêzdar Heyder Omer li hev kir ku em ne li ser du xelean, belê tevaya lêkolînê di jimara 10an de biweşînin. Lêkolîn berê hatiye weşandin, lê bi helkeftina roja Zimanê Dayikê û ji ber girîngiya wê em dubare û li ser yek xelekê diweşînin, daku lêkolîn di arşîva rojnamê de bê parastin û dubare xwendevan sîdê jê wergirin.(Pênûsa Nû).

Dumamdin ŞIHÎDÊN ŞERÊ QEREBAXÊ

Jinka din.- Elî deng da Egît, go: " Birao, hey birao, Bextê min û tera şerrê Qerebaxa şewitî girane, ax girane,

Herdu şêrê me berdane meydana şerr, berî pêsîra hev du dane,

Tu were mala me xiravkin, hev bikujin,

Yek nîşana yê din nizane...

Huc. - Egît lawo, Elî birao Qerebaxa şewitî barane, ha barane,

Bira Xwedê xirav bike mala qumandar, hekîm-doxtirê herd alyane,

Herd bermirazê me birîndarin, bêxweyî, bêxwedan meydana şerr da

Zarîna wan gulme ava çîya ne,ava çîya ne...

Jinka din. - Egît bira, Elî bira bûka bînin xemlê lêkin,

Sazbenda bînin şayikê wan ra çêkin,

Bira herd bermirazê me nexeyîdin,

Wan bi dilê wan verêkin...

Mistê Kalo êdî teyax nekir, bû îskeîska wî, ji cî rabû desmal da ber çevê xwe û ber bi oda jina çû:

-Bêje, Hucê bêje! Çevê min û xwe birêje...

Hazir tev ber bi oda jina çûn.

Şêx û mela tenê man



pirtûkên nû

ÇANDA KURDÊN SOVÊTÊ derket

Ji aliyê weşanxana weşanên DENG da pirtûka Eskerê Boyîk ya nu ÇANDA KURDÊN SOVÊTÊ derket.

Pêşgotinê da nivîskar dinivîse: ...Di nav wan netewên kêmjimar da usa jî kurd hebûn. Kurda ra jî mecalên pêşdacûyîna çand, kûltûra û zaniyariyê çê bûn. Salên qeydê Sovêtê gelek bûyarên, mezin çawa yên ronayî wusan jî yên tarî di jiyana gelên wî welaîfî da qewimîn. Ew para kurda jî, di wan 70 salê desthilatdariya Sovêtê da, di nava dijwerî û destanîna, hilketin û daketina ra derbas bû. Giraniya veguhestinên civakî, aborî, perwerdeyî, kûltûrî, dijweriyên stalinizmê yên sala 1937 an, nefîya (sîrgûnî), zulma herba dijî almanîya hitlêriyê (1941-1945), giraniya salên hildana wêrankirin û birînên şêrr, bi gilîkî ew hemû zor û zemetiyên gelê Sovêtê kişandin, kurd jî jê bêpar neman. Di warê çand, kûltûra û zaniyariyê da jî kurd rêke ne rehet derbas bûn. Civaka qirr- bîr û gênosîda salên 1915-1920 dîtî, ji wê karesetê bi cûrekî filitî, tazî-birçî, bê cî û war, nivkoçer, nexwendî hê di qewlên eşîretiyê û fêodalîyê da, carekêva hemû gelên Sovêtêra tevayî li ber dezgê veçêkirin û jiyana sosiyalîzmê sekinî. Gund û şênên kurda da dibistanên netewî vebûn, dersdar hatin hazirkirin, civak bû xwediyê rojneme, radiyo, beşa nivîskaran, kurdzaniyê, xwendinxana dersdarhazirkirî, tîatroya dewletê, komên kilam-reqasê...Bi tîraja hezaran pirtûkên wejîyî, zargotinê, zaniyarî, siyasî, werger, yê dersan hatine weşandin. Sê elfeba hatin guhestin. Elfeba li ser girafîka latînî ya ewlin kurden Sovêtê demezirandin, pirtûka kurdiye ewlin bi wan tîpan cara ewlin li paytextê Ermenistanê Yêrêvanê hate weşandin, romana kurdiye ewlin dîsa para kurdên Sovêtê dikeve. Bi heqî gerekê bê xumukurhatin, ku cîyê vala civakeke rewşenbîrî pêşda hat, bi nivîskar, zimanzan, zaniyar, hunermend, rojnamevan, dersdar, pêşekzanên warên cûrbicûr... Şexsiyetine usan di her warên çand, zaniyariyê, hunermendî û derecên dinda pêşda hatin ku ne ku goveka kurdên Sovêtê lê di nava temamiya kurdan û cihanê da eyanin.

Bi gilîkî, vê para kurdan, salên xweye dema Sovêtê vala derbas nekirin, mecalên ji bo wan çê bûbûn bi temamî û serfirazî kêr anîn, dema weletê wan Kurdistana perçekirî da kurd û kurdeyatî qedexa bûn, wek çirake ronayê, hîviya jiyane ew dûrva li gelê xwe dihatin xanê, dengê wan digihîşte welêt, her kurdekî ra dibû hêvî û gumana pêşîrojê.

Nenihêrî kurd hersê komarên Kavkaza sovêtê: Azerbaycanê, Ermenistanê, Gurcistanê û komara Tûrkmênistanê ya Asiya Navîn da dijîtin lê bawarkî ji sedî nodipêncê wî karî li komara Ermenistanê, ji aliyê kurdên Ermenistanê da hatiye kirin.

Li komarên Azerbaycanê, Tûrkmênistanê, xêncî wergera çend pirtûkên dersan ji bo dibistanan, ew jî salên 1930-1937 a, bawarkî tu karekî kurdewerî nehate kirin. Gurcistanê, xazma bajarê Tilbîsê da, dibistana da dersên zimanê kurdî hatin dayîn, radiyoya wê komarê da axaftinê zimanê kurdî (heftê 10 deqîqe), tîatroya gelêrî, komên kilam-reqasê hebûn. Gelek tişt ne ku hukumatê dikir lê bi însiatîva şexsa, rewşenbîrên kurd dihat kirin. Raste dewletê alîkarî nedida, lê wek komarên jorgotiye din xazma Azerbaycanê astengî jî çê nedikir.

Ji pey hilweşîna deshiletatiya sovêtê ra derbeke mezin li vê navenda kurdewarî ket. Rewşenbîr mecbûrî ji hev bela bûn, mecalên ku ji hêla dewletê da dihatin dayîn hatine birîn, navendên kûltûrî, çandî, zaniyarî pîrr zeyîf bûn.

Wî karî carekêva derbeke usa xwar ku peyhafî, berdebankar û xweyîkirê vî karê kûltûrî, wejîyî, zaniyarî nehatin hazirkirin. Niha, ji wê malbetê teka-tûka şexs mane.

Di nava van salên derbasbûyî da (ji sala 1990) gelek tişt hatin jibîrkirin, hinek tişt yekalî hatin lînêandin, lêkolînkirin, qimetkîrin, ked û emekê hineka bê binge hatye mezinkirin yê hineka jî nayê şêkirandin. Rûyê elfeba kirîlî da berhem û navê hineka qet nayê meydana xwendevana.

Ev pirtûk cêribandineke ewlin e ku ew karê kirî, bi gişkî bê tomerîkirin, analîzkirin û raberî goveka xwedevanên kurd e fire bê kirin, xazma di warê edebiyet, çand û kurdzaniyê da.

Naveroka pirtûkê eve:

Pêşgotin...

Wêje

Nêhêrîn kurt li ser edebîyeta kurdên Sovêtê

Çanda Kurdî li komara Gurcistanê

Helbesta kurdî di edebîyeta kurdên Sovêtê da...



Ji dîroka elfebên kurdî li Ermenistanê

Rojnema RIYA TEZE

Para axavtinên kurdî di radiyoya Yêrêvanê

Şeroyê Biro- sahe dengbêjîya radiyoya kurdî ya Yêrêvanê

Karapêtê Xaço, Têatroya Kurdî ya dewletê, Erebe Şemo, Hecîyê Cindî, Emînê Eydal, Cerdoyê Gêncî, Ahmedê Mîrazî, Casimê Celîl, Wezîrê Nadîrî, Ûsivê Beko, Qaçaxê Mirad, Şikoyê Hesên, Mikayêlê Reşîd, Fêrikê Ûsiv, Elîyê Evdilrehman, Sîhîdê Îbo, Smiyê Şemo, Karlênê Çaçanî, Knyazê Îbrahîm, Çerkezê Reş, Mîroyê Esed, Nado Maxmûdov, Semend Syabendov, Xelîl Mûradov, Sîma Semend, Egîtê Xudo, Emerîkê Serdar, Wezîrê Eşo, Rizalîyê Reşît, Tosinê Reşîd, Şamîl Ezgerov, Ahmedê Gogê, Keremê Anqosî, Cerdoyê Esed, Ahmedê Hepo, Egîtê Şemsî, Elîxanê Memê, Barîyê Bala, Babayê Keleş, Ezîzê Îsko, Têmarê Xelîl, Ezîzê Cewo, Ezîzê Gerdenzerî, Titalê Efo, Keremê Seyad, Hesênê Hecîsilêman.

Kurdzanî

Kurtayîk dor kurdzaniyê û kurdên sovêtê

Qanatê Kurdo

Zargotina Kurdî û berevoka "Folklor Kurmanca"

Çerkez Bakayêv, Xalit Çetoyêv, Şekroyê Xudo Mhoyî, Ordîxanê Celîl, Dr. Celîlê Celîl, Maksîmê Xemo, Şerefê Eşîr, Zera Ûsiv, Keremê Elîxan Amoyêv, Memoyê Xalit, Lamara Barîsovna

Nûra Cewarî, Cemîla Celîl, Wezîrê Eşo- Eskerê Boyîk

Weşanên DENG-2012

Çapa pêşin

ISBN 978-975-7011-79-8

Pirtûk 560 rûpel

Biha 15 Eur.

e.boyik@web.de



Sernivîser
Qado Şêrîn
Rêvebirê Nivîsînê
Arşek Paravî
Desteya birêvebir
Abdilbaqî Huseynî
Ezîz Xemcivîn
Lawîn Şêxo
Pîr Rustem
Silêman Azer
Derhener
Xorşîd Şûzî

Ji bo hinartina berhemên kurdî:
kurdi.penusanu@gmail.com

Dumamdin Turkbûna Kurdên Almaniyayê, Ne Gunehê Turkan e.

nezan derxistin pêş. Lewra ez bawer dikim, ku di vî warî de jî, gavine pir lewaz hatin avêtin.

Gelek malbat hene, li vê Almaniyayê, ku dê û bav Kurd zarokên Kurdan in, ji ser axa Kurdistanê hatine û baş bi zimanê turkî nezanin, bi wan zarokên xwe re, ku li vir hatine dunyayê, bi turkî diaxivin, ev ji bilî ku partizanên me li komele û civînên xwe, qet bîra zimanê kurdî nabin. Ma li vir çi gunehê dewleta turk e?. Ma li vir jî, zordarî û sitema Turkan heye?. heger ku em doza mafê xwe bikin jî, bila hinekî bextê me hebe, me tenê dersa xwe jiberkiriye, ku em bibêjin Ereb U Turk U Farisan zimanê me li me qedexa kiriye. Li Almaniya, em vî tiştî bibêjin em xwe dixapînin, û ti gunehê wan kesan tune ye, guneh yê me bi tenê ye û bila em li xwe vegerin, nemûneya herî balkêş heyanî niha

min dîtîye, ya hevalê min Husên Dozen e, ku kurê wî çarsalî ye û ji zimanê kurdî pêve, bi ti zimanan nezanê, lê nikare bi zarokên kurdên bakur re bilîze, ji ber ku zimanê wan ne yek e.


Li vir, ez ji wan kurdan bi guman û şikim, ji kû dibin, ji kîjan perçî be, ji kîjan partî û êlê be, bila bibê. Ew dixwazin bi zimanê dijminê xwe bipeyivin û naxwazin bi kurdiya xwe biaxivin, naxwe zimanê neyarê wan, li wan pîroz be. Lê tiştê herî giring ew e, ku bila gelê xwe nexapînin û ne bêjin: em doza mafê we yî netewî dikin.

Têbînî: bi helkeftina roja Zimanê Dayikê em nivîsa nemir Arşevê Oskan dubare belav dikin.

Her wiha ji ana û bi şûn ve emê hewl bidin di her jimara "Pênûsê" de nivîsek nemir biweşînin daku wî zindî bihêlin.(Pênûsa Nû).

**F
R
E
E
D
O
M**

**F
R
E
E
D
O
M**



**A
Z
A
D
Î**

**A
Z
A
D
Î**